# DÎPLOMASIYA NETEWA DEMOKRATÎK

Akademiyên Zanistên Civakî ya Abdullah Ocalan

NAVEROK


***BEŞA 1*** 5

DÎPLOMASÎ ÇIYE Û NE ÇIYE? 10

GUHERTINÊN KU DÎPLOMASÎ DE HATINE JIYAN KIRIN 17

GUHERTINÊN DI PÊVAJOYA DÎPLOMASÎ DE 19

GUHERTINÊN DI ALIYÊ RÊBAZ DE 19

CÛR BI CÛR BÛYÎNA AKTORÊN DÎPLOMATÎK Û MEKANAN 21

GUHERTINA TÊGEHA SERDESTIYÊ 22

LÊNÊRÎNEKE KURT LI DÎPLOMASIYA RAYAGIŞTÎ A KU DI SERDEMA ME DE DERKETIYE PÊŞ

***BEŞA 2*** 26

RASTIYA TÊKILIYA DI NAVBERA CIVATÊN SERETAYÎ DE 34

DI DÎROKA KURDISTANÊ DE DÎROKA KURT YA DÎPLOMASÎ 40

DI PKK DE RASTIYA HEVBENDÎ 46

REHENDA DÎPLOMASIYA NETEWA DEMOKRATÎK 49

PÊNASE KIRINA DÎPLOMASIYA NETEWA DEMOKRATÎK 52

REHEND Û PALPIŞTÊN BINGEHÎN A DÎPLOMASIYA NETEWA DEMOKRATÎK 55

TAYBETMENDIYÊN KU PÊWÎSTE DÎPLOMATÊN NETEWA DEMOKRATÎK TEMSÎL BIKIN 65

PIRSGIRÊKÊN KU DÎPLOMASIYA ME JIYAN DIKE Û jinûve ÎNŞAYA DÎPLOMASIYA NETEWA DEMOKRATÎK 69

***BEŞA 3*** 72

PIRSGIRÊKA CIVAKÎ Û ÇARESERIYA WÊ YA SIYASÎ 76

ESASÊN DÎPLOMASIYA KU BI DEWLETA RE WERE KIRIN 78

BERFIREHIYA DÎPLOMASIYA KU BI DEWLETAN RE WERE MEŞANDIN 79

erk Û TAYBETMENDIYÊN GIŞTÎ YÊN NÛNERÊN DÎPLOMATÎK 86

***BÊŞA 4*** 89

BERIYA MÛZAKEREYAN 93

DIYARKIRINA ROJEVAN 96

DI MÛZAKEREYAN DE MIJARA CIH 97

ŞÊWAZÊ MÛZAKEREYAN 98

DEM EYAR KIRIN 99

ASTA MÛZAKEREYAN, PÊKHATE Û MEZINBÛNA ŞANDEYAN 101

BI ŞÊWAZEKE FERMÎ DESTPÊKIRINA MÛZAKEREYAN 102

DÎPLOMATEK BAŞ PÊWÎSTE ÇAWA BE? 104

GIRÎNGIYA ZIMANÊ KU DI DÎPLOMASIYÊ DE WERE BIKARANÎN Û ZIMANÊ DÎPLOMATÎK 111

DI DÎPLOMASIYÊ DE GIRÎNGIYA RÊZÎKÊN ŞÊWAZ AN JÎ PROTOKOL 119

***- ENCAM*** 122

## PÊŞGOTIN

Ger em bêjin di dîroka me de dîplomasiya herî serkeftî û xebatên têkiliyên derve Medan meşandiye wê ne şaş be. Li hember împaratoriya Asûr ku yek ji dewletên herî zordar a di dîrokê de bû, Medan bi îtîfaqa gelên herêmê re B.Z. di sala 612'an de desthilatdariya Asûr têk birin. Ev serkeftin li hember împaratoriya Asûr bi saya van têkiliyên serkeftî û hevbendiyan de hatiye bidest xistin.

Dîrok, ji rastiya Medan û vir ve, bi qasî di roja me ya îro, ji bo ku rolên xwe ye dîrokî bileyizin Kurdan dawetî ser dika dîrokê nekiriye.

Bi qasî îro, Kurd ti demî ewqasî zêde ji banga dîrokê re guncaw û amade nebûne. Dîsa bi qasî îro nehatine wê rewşê ku awantajên wan li ser dezavantajên wan serwer bin.

Bi qasî îro Kurd ti demî di hûndirê xwe de û bi gelên herêmê re hevdîtinê, ji aktûel re bi zanabûn, rêxistinî mûdaxele kirin û ji siberoja wan ji îro cûdatir; di bingeha wekhevî, azadî û demokrasî de zirûfê afirandinê ewqas dest nedaye.

Paradîgma netewa demokratîk, bi hişmendiya netewa demokratîk û avaniya wê ve ji modernîteya kapîtalîst ku çavkaniya pirsgirêkên herêmê ya dîrokî-civakî kom dibe û girantir dibe, çareseriya pirsgirêkên dîrokî-civakî ya herêmê û pêxirtengiya ku îro tê jiyan kirin re alternatîfa herî guncaw, paradîgmaya wekhev, azadîxwaz û demokratîk e.

Rastiya modernîteya demokratîk a netewa demokratîk ne tenê ji bo Kurdan, di serî de tevahî gel û etnîsîteyên herêmê avaniyên olî, mezhep, çand, cemaat, eşîr, qebîle, saziyên civaka sîvîl (scs) hwd. beşên ku ji pergalê êş kişandine projeya çareseriyê ku ji bo wan pêş tê dîtin. Rehendeke ku ve projeyê derbasî jiyanê bike bêguman xebatên dîplomasî ne.

Têkiliyên Dîplomatîk ên di dîrokê de, di milê pêşxistin û domandina pêvajoyên ku di navbera civakan de ji hevdû re feydeyan tîne risteke girîng leystiye. Têkiliya li gorî berjewendiyên kar û desthilatdariya modernîteya sermayedar bi sazî kirin, ji cewherê wê vala kirin û di ber armancên qirêj de kirina amûr re rê vekiriye. Di roja me de têkiliyên Dîplomatîk veguheriye berî şerên bi armanca kar û desthilatdariyê ku di navbera dewletan de tîr dibe, lê veguherandina şêwazê faaliyeteke ku ji hemû pêvajoyan re belav dibe. Îcar dîplomasiya netewa demokratîk di navbera civakan de jinûve hîn zêde aşitî û piştgiriyê, bi amûrê danûstandinên afrîner re çareseriya pirsgirêkan re mijûl dibe. Ji bo yekitiyan çêkirin û jinûve aşitî, biratî avakirinê de risteke binirx wê bileyize.

Me jî bi vê xebata ku di destê we de ye dîplomasiya netewa demokratîk bi giranî bi rehendên cûda dest girtinê re dayîna fêm kirinê armanc girt. Bi baweriya bi feyde be...

***BEŞA 1***

## WATEYA TÊGEHA DÎPLOMASÎ, PÊNASEYÊN WÊ Û ÇIMA DÎPLOMASIYA NETEWA DEMOKRATÎK

Hişmendiya netewa demokratîk, taybetmendî, xalên wê yên sipartine, rehendên wê heta ku neyê fêm kirin, xebatên dîplomatîk meşandin pir zehmet e. Hişmendiya netewa demokratîk û avaniya wê ya mantiq bêyî ku were fêm kirin xebatên dîplomatîk yê ku pratîk bûye jî rewşeke teng, ji esasê qut, yê heyî derbas nake, piranî dişibe, ji berhem dayînê dûr, ji encam girtinê dûr derxistiye holê. Ger di vê de were israr kirin pêwîste baş were zanîn ku di pêkanîna înşaya netewa demokratîk de lawaziyên pir cidî wê ava bike. Di vê wateyê de xebatên înşaya netewa demokratîk ya nû de xebatên dîplomasî rehendeke girîng a xebata me ye. Bi vê re şêwazê dîplomasiya nûmisoger di şêwazê dîplomasiya dewletê ya klasîk a heyî an jî dîplomasiya di navbera dewletan de nîne. Di her milî de qasî cûdabûnên xwe, bi çawaniyên xwe ku jê re alternatîfe jî bi xetên misoger cihê dibe. Cûdabûn û cihêbûn qasî ku teşeyî ye cewherî ye, yanî hişmendiye jî. Cihêbûna xwe ne ku ji ber ji heman çavkaniyê xwe xwedî nake, ji ber çavkaniya têkiliyan bizat ew bi xwe ye. Alternatîfbûna xwe jî têkiliya di navbera civakên seretayî de nûneriya heqîqeta heyî îfade kirinê de digre. dîplomasiya me qasî cûdabûnên xwe ji feraseta têkiliyên dîplomatîk ya di navbera dewletan de, cihêbûna wê jî ji bo em baştir fêm bikin beriya ku em derbasî kitekiteyên dîplomasî ya mijara xwe bibin destpêkê li ser hin pênaseyên dîplomasiya netew-dewlet û dîplomasiya netewa demokratîk çima pêwîste em ê hewl bidin li ser rawestin.

Bingeha peyva dîplomasî Yunanî ye û jê re *'duplîer'* tê gotin yanî di wateya kirina dû qet de ye. Ji qasidan re belgeyên danasînê ku tên dayîn kirinê du qet û dane, dibe kuwateya xwe ji wir girtibe.

Hîn dema ku dîplomasî li Ewrupa bi sazî nebibû di aliyê hikûmdaran ji bo hin mesele bi welatên biyanî re bi rêya 'bazarî' were nîqaş kirin û çareser kirin kesên ku dihatin şandin berê, bi zemanê wî demî ya ku zêdetir dihat

bikaranîn bi Frensî digotin ‘negociatevr’. karê ku dikirin re jî digotin ‘negocieteon’.

Bi taybet di dawiya sedsala 17. şûnde cara yekemîn li Fransa di dema Cardinal Richelieu cihê her du têgeha tabîrên dîplomasî û dîplomat hate bikaranîn. derbarê  pênaseya dîplomasî di dem ên cûda de ji aliyê pir çavkanî û nivîskaran de pênaseyên cûda hatine kirin.

Di roja me de ansîklopediyên ku hene û mînakên ferhengoka dema ku tê nêrandin em ê bibînin ku qasî xalên hevbeş, cûdabûn jî hene. Para rastiyê di cûdabûnên van pênaseyan de hebe jî, evyek tevî girêdayîbûna pirsa kî, ji kîderê, çawa digre dest û bi pênaseyên ku meseleyê ji yek alî ve digre dest çavkaniya xwe digre.

Hişmendiya di pêkanînê de, avaniyên çand, stratejî û taqtîkên tên pêkanîn, pênaseyên bi hêz û kîjan mekanîzmayên hêz bibandor tê kirin, armanca ku tê xwestin, hedefên ku gihane, di dawî de jî rastiya pratîka ku derketiye holê li ser van tevahî cûda cûda hatiye dest girtin û hatiye formûle kirin, pênaseyên bi vî rengî ne. Em hin ji van pênaseyan bigrin dest;

Mînak; ferhengoka Tirkî ya saziya zimanê Tirk de pênaseya 'dîplomasî‘ tevahî peymanên ku têkiliyên navnetewî vesaz dike ye. Di welatek biyanî û civînên navnetewî de kar û hûnera welatê xwe temsîl kirin, di vî karî de erk û pîşeya ku kesê kar dike civata ku ev erk ava dike ye.’ Bi vî şêwazî tê pênase kirin. Heman ferhengok wateya mecazî ya peyva dîplomasî wek ‘ di hevdîtinêk zehmet de pisporî û hûnera ku tê nîşandan’ dide diyar kirin. Li gorî ansîklopediya *Yenî Hayat* jî ‘dîplomasî pîşe û agahiya rêvebirina têkiliyên navnetewî’ ye.

wateya ku *Temel Britannica* ji peyva dîplomasî re aniye jî ‘dîplomasî, welatek têkiliye xwe bi welateke din re pozîsyona xwe parastin û baş kirin e, di aliyê din de bi welatên din re hûner û mijûlbûna têkiliyên xwe meşandine’.

Li gorî ferhengoka Îngîlîzî *Oxford* de dîplomasî ‘têkiliyên dîplomatîk bi mûzakereyan di aliyê sefîr û qasidan de hûner û karê meşandin û rêvebirinê ye’.

*Encylopedia Britannica* pênaseya 'têkiliyên navnetewî bi rêya mûzakereyan hûnera rêvebirinê' dike.

Ansîklopediya Universalis ya Frensî ji bo dîplomasî 'tevahî amûr û rêbazên fermî di têkiliyên derve ya dewletan bi aştiyane meşandine'.

Dîsa hin pênaseyên cûda jî mijara gotinê ne. Mînak; 'dîplomasî di wateya giştî de di arasteya hedef de mûxatabê xwe bin kontrolê de hiştin, wê/wî di îstîqameta tê xwestin de ber bi wê nêzikbûnê birin, li beranber hin tawîzan berjewendiya herî zêde girtin an jî ji hedefeke diyar re bi tawîzên herî kêm xwe gihandin. Pirsgirêkên di rojevê de bêyî ku serî li şer bidin bi enstrûmanê mûzakere bikaranînê re ger rewşa şer hebe nêvenga hevdîtinê ava kirinê re tevahî xebatên bi armanca sedemên şer ji holê rakirin û şer bi dawî kirinê. Hûnera ji fersendan sûd wergirtin hwd.'

Li gorî hiqûqa dewletên heyî jî dîplomasî wisa tê pênase kirin; 'têkiliyên di navbera miletan de meşandin û hûnera rêvebirinê'. Pênaseyên di vî alî de zêde kirin pêkane. Wekî ku tê dîtin di piranî pênaseyan de hin têgehên bingehîn wek –mînak' enstrûmanên mûzakere', 'têkiliyan birêvebirin', 'berjewendiya temsîl kirin, cihê xwe parastin û baş kirin', ' li beranber hin tawîzan hîn zêde tawîz girtin', 'ji fersendan sûd wergirtin' hwd.- derkeve pêş jî di mijara xebitîna dîplomasî de zehmet e ku em bêjin yek nêrîn heye.

hin dîplomasî wek 'cihê şer xilas dibe aşitî dest pe dike' gotinê re bi dema aştiyê re wekhev dîgrin. Yek dîplomasî bi şêwazê 'di dema aşitî de şer' pênase dike. Hem di jor de pênaseyên ku hatine diyar kirin hem jî pênaseyên ku li vê derê nehatine diyar kirin hema hema hemû di hûndirê xwe de cûdabûn bihewînin jî, a rast feraseta dîplomasî ya dewletan û kesayeta dîplomat ji aliyên cûda digre dest, di vê wateyê de pênaseyên ku para xwe ya rastiyê zêdetirin.

Li ser pênaseyên ku hatine danîn bi taybet mentiqê dîplomasiya netew dewlet ji bo em baştir dahûrînin ji hin têgehan zelal kirin wê girîng be.

Têgeha ku netew-dewlet di xebatên dîplomasî de ji bo xwe esas digre 'mûzakere'ye. Heta carnan dîplomasî jî bi wê pênase dike. Li gorî mentiqê netew-dewletan mûzakere, dîplomasî bixwe ye. Mijara ku em li vê derê

dixwazin îşaret bikin, bi têgeha mûzakere di navbera kar an jî faaliyeta ku tê kirin de çiqas ferq û cûdatî heye. Esas bi têgeha ku te bikaranîn karê ku tê kirin qasî masûm nîşandan armanca qemûfle kirin (veşartin) jî di hûndirê xwe de hildigre. Ji bo mijar hîn zêde were fêm kirin li ser wateya peyvan seknandin wê rast be. wateya peyva mûzakere 'li ser mijareke bi armanca şêwirandin hevdîtin û axaftin e'. Were bal kişandin ji ber pêdivî her du alî tên gel hevdû û hevdîtin çêdikin. Lewma li vê derê bazarek ne mijara gotinê ye. wateya peyva bazarî jî, 'di danûstandineke de bi armanca alî ji bo xwe bûhaya danûstandinê ya herî kêrhatî ji bo yê dî bide qebûl kirin hevdîtina ku tê kirin e.' Di wateya mecazî de, ji bo hîn hêsan bibe an jî bigihin çareseriyek baş hevdîtinên ku tê kirinê.

wateya bazarî em ji nêz ve ger bişopînin, ya yekemîn; bazariyeke ku her du alî jî li ser tiştekî dikin heye. Ya duyemîn; li ser bûhaya ku hatiye diyar kirin kişkişandineke her du aliyan jî heye. Ya sêyemîn; kişkişandina ku li ser bûha tê kirin wê encameke çawa derbixe holê ne diyare. Li vê derê tekane tiştê diyar, tişta ku li ser bazarî tê kirin ji bo di lehê aliyekî de pêk were her cûre hîle, derew û rê mûbah were dîtin. Vegotina xwe ji bo em baştir îfade bikin wateya peyveke sêyemîn jî nêrandin wê pêwîst bike, ew jî tîcaret e. 'Tîcaret, bi armaca qezencê, tevgera kirîn û fîrotinê' ye. An jî di encama kirîn û firotinê de ferqa bûha, yanî ''kar'' e. Lewma faaliyeta ku netew-dewlet bi navê dîplomasî faaliyeta ku dikin tu têkiliye xwe bi mûzakere re nîne. Navê wê re mûzakere gotin bi armanca hîle ye. Bi armanca veşartin û xapandin e. Esasa wê bi armanca tîcaretê bazarî ye. Yanî 'xespa bi armanca kar û berjewendî ye'. Wek pêwîstiya karê ku dikin ji wicdan û adaletê re cîh nîne. Bi hêza leşkerî ve sipartî berjewendiya siyasî û aborî li ser her tiştî tê girtin.

Rûxmê tevahî destgirtinên cûda yek xaleke ku li ser mûtabaqat çêbikin hebe ew jî dîplomasiya ku bi hêzên din re têkilî meşandinê de amûra ku devjê nayê berdan e.

Serokê Gelê Kurd Birêz Abdullah Ocalan, di pirtûka xwe ya bi navê 'Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Netewa Demokratîk 'de dîplomasiya netew-dewletan ya ku heye wek 'di navbera dewletan de şêwazê faaliyetên beriya şer' pênase dike. Wek merhaleya amadekariya netew-dewletan ji

şer re dinirxîne. Dîsa bal dikşîne ser dîplomasiya ku di navbera netew-dewletan de wek amûrê manîpûlasyona lîstokên şer re hatiye veguhertin.

Şerê cîhanê ya yekemîn û duyemîn ya parvekirinê ku di dîroka mirovahiyê de bê mînak e û bi qasî ku nebûye mirovan jiyana xwe ji dest daye. Ji zirar û texrîbatê re rê vekiriye ev bixwe jî bi serê xwe rastiya dîplomasiya ku pir tîr hatiye meşandin tespîta Birêz Abdullah Ocalan di derbarêdîplomasiya netew-dewlet de kiriye erê kirinê re bes e.

Ev şerên ku bi temamî bi kara herî zêde û parvekirinê re sipartî pêk tên, berî wê û piştî wê veşartî-vekirî faaliyeta dîplomasî ku tên kirin dualî, piralî û tîr bi parve kirin û kar re sipartî di derbarê pergala navnetewî wê çawa teşe bigre de ye.

Serê zimanê dîplomatîk ku tê bikaranîn dema ku tê kolandin an jî pişt perdeya dikê ku dîplomasî tê amadekirin û meşandin were rakirin wê were dîtin ku hêz bi tevahî tesîsatên xwe di pozîsyona şer de ne. Lewma pişt plana tevahî dîplomasiya ku tê meşandin misoger bi hêz ve girêdayî bûye. Berî şerê parvekirinê ya yekem di navbera nûnerên Fransa û Brîtanya hevpeymana sykes-picot ku hate kirin di serî de împaratoriya Osmanî, cîhan wê çawa û bi kîjan şêwazî were parve kirin hevpeymanek derbarê  wê de ye. Di dîrokê de mînakên ku dişibe ve hene.

Di vê çerçeveyê de dema ku tê nirxandin li ser sê arasteyên ku dîplomasiya heyî tîr dibe dikare were behs kirin. Bi mînakên dîrokî em dikarin derbixin holê. Ya yekemîn; amadekariya şereke nû bi kara azamî ve sipartî, duyemîn; piştî şer cihê xwe parastin û baş kirin, sêyemîn jî; rewşa konjonktûrel ya nû ku derketiye holê hêzên ku ji pozîsyona nû nerehetin ji bo vê pozîsyona xwe biguherin bi armanca şereke nû dîplomasiyê re giranî dayîn.

Di dîrokê de di navbera her cûre yekeyên civatan de têkiliyên cîrantî bi şêwazên kevneşop rêûresmên cûr bi cûr hene. Ev rêûresm di navbera civatan de ji ber aşitî, piştgirî û alîkarî dayîna hevdû xurt dikir nirxeke bilind dihate dayîn. Bi meyla kar re girêdayî netew-dewlet ve têkiliyê sazî kirinê re ji cewherê wê vala kirin û ji bo mêtingeh kirinê zivirandin amûreke qirêj.

Li Ewrupa bi destpêkirina serdema sermayedar ku bûrjûwazî diparêze netew-dewletên ku derketin holê, bi meyla kara azamî ve girêdayî ku xwe dispêre berî wan, enceq di sedsala 19. bi kongreya Viyana re pergala nû ya navnetewî û têkiliyên dîplomatîk li ser hin bendan bi sazî kirinê. dîplomasî ji wê û şûnde bi tam wateya xwe êdî bûye bi kara azamî ve sipartî, beriya şerê amûreke ku hatiye tîr kirin. Lewma dîplomasiya ku ji mentiqê kar re hatiye daxistin ji şêwazê têkiliyê herî bi nirx ya di navbera civakan de bûyînê hatiye derxistin, hatiye qirêj kirin. Aşitî, di navbera gelan û civakan de biratî û piştgirî xûlase beranber hevdû pêvajoyên bi sûd pêşxistinê de risteke girîng leyistinê hatiye dûr xistin û ji amûrê ku şer amade dike re hatiye veguhertin. Îcar tam di vê xalê de bi hişmendiyeke nû, pêdiviya feraseta dîplomasiyeke nû derdikeve holê.

Bi perspektîfa netewa demokratîk di navbera civakan de aşitî û piştgirî dîsa dîplomasiya ku veguherînin amûrê danûstandinên afrîner wê çareseriya pirsgirêkan esas bigre. Lewma dîplomasiya netewa demokratîk ku jinûve were ava kirin wê nebe yê şeran, wê bibe amûreke bi nirx ya aşitî, biratî, dostanî û di navbera civakan de têkiliyên bi sûd.

## DÎPLOMASÎ ÇIYE Û NE ÇIYE?

derbarê dîplomasî çiye pir pênase tên kirin. Mînak, yên ku dibêjin hûner e, pîşe ye, zanistek e hwd. hene. Dîplomasî dema ku ji nêz ve tê vekolîn kirin têkiliya xwe bi têgehên di jor de hatine diyar kirin hemûyan re heye. Ji ber xebata dîplomasî beriya her tiştî daneheva agahiyan dixwaze. Mînak agahiyên saxlem ya erdnîgarî, aborî, leşkerî û çandên giştî dixwaze. Bi van agahî û zanabûnan bes namîne di heman demê de kabiliyeteke afrîner ku van agahiyan di dem û cihê wê de ji mûxatabê xwe re dayîna bawer kirinê dixwaze. Lewma têkiliya dîplomasî têgehên di jor de hatine diyar kirin heye û bi wê re wan bi şêwazeke profesyonel bikaranîn û serxistinê re xwe temam dike. Bi vê ve girêdayî dîplomasî wek ezmûn, danehev, pisporî, afrîneriya bilind û pîşeya profesyoneltiyeke ku qabîliyet dixwaze dest girtin wê ne şaş be.

Di vê beşê de xisûseke din ku em dixwazin dest bigrin têkiliya dîplomasîû polîtîka derve ye. Di hin nêzikbûnan de polîtîka derve û dîplomasî wek heman tişt tê dest girtin an jî dîplomasî wek berhemeke jêr ya polîtîka

derve tê nirxandin. Ev her du nêzikatî jî şaşin. Bi vê reher du têgeh jî xwedî karîgeriyên ji hev serbixwe nînin. A rast yek nebe ya din nakeve tevgerandinê. Lewma wek goşt û neynik du têgehen hevdû temam dikin e.

Dem bi dem bi meqseda şêwaza nêzikatiya welatekî ji bo pênase bikin her du têgeh hemwate were bikaranîn jî, (polîtîkaya karê derva ya Îran an jî dîplomasiya Îran) esas de dîplomasî ne polîtîkaye, amûrê ku polîtîka pêk tîne ye. Bi îfadeyeke din polîtîka stratejî ye, yanî polîtîka derve ya giştî tespît dike û temsîl dike. Dîplomasî jî amûrê ku taqtîkên polîtîka derve diyar dike û pêk tîne ye.

Di aliyê din de faaliyeteke mekanîk ku bi navbeynkariya nûnerên dîplomasî were daxistin jî nîne. Dîplomasî û polîtîka derve daîmî û beranber hevdû di nava danûstandinê de ye. Her duyan bi xetên stûr em nikarin ji hevdû qut bikin. Dîplomasî tu dem pasîf nabe. Amûreke dînamîk û bitevger e. Polîtîka xwedî dînamîka bijarde û diyardeyên xwe bandor dike. Her du têgeh jî hevdû xwedî dikin û ji hev hêz digrin. Dîplomat an jî nûner tevlîbûna civînên ku polîtîka tê ava kirin rast e û di cîh de ye. Derve hiştina wan wê kemasî be. Em werin sedema vê, ya yekemîn; nûner an jî dîplomat li ser qada ku xebat dimeşîne xwedî hakîmiyet e. Lewma xwedî agahiyên girîng û ji çav neyê revandin in. Di rapor û agahdarkirinan de li ser mijarên girîng ku aniye ser ziman pirsên kitekit pirs kirinê re derfetên fêrbûnê çêdibe. Heman şêwazê polîtîkayên ku kêlekê re hatine derbas kirin an jî yê were pêk anîn li ser nûner an jî dîplomat agahiyên kitekit girtinê re pêvajo we hîn kûr were meşandin. Xisûseke din ya girîng jî, civînên polîtîka derve tê diyar kirin, amade bûyîna nûner an jî dîplomat wê di hevdîtinên piştre werin kirin de hîn zêde afrîner bike. Ya sêyemîn jî; xebatên ku dike piştî ferq kir ku girîng tê dîtin, bi moral û hêzeke hîn bilind karê xwe wê hembêz bike, ji bo serkeftî bibe bi azmeke pir mezin we bixebite.

Mijareke bi vê re paralel jî, polîtîka derve wekî ku ji polîtîka hûndir ne serbixweye rastiya ku derbasî navhev dibe û hevdû bandor dike û diyar dike ye. Bi îfadeyeke din polîtîkaya derve, li ser polîtîkaya hûndir ava dibe û encamê wê hevdû bandor dike û pêş ve dibe. PKK û KCK bi paradîgmaya nû re polîtîkaya hûndir û derve bi tam wateya xwe derbasî nav hev bûye û yekpare bûye. Heman şêwazê nûnerên derve an jî dîplomat di welatên

xwe de pêşketinên ku tên jiyan kirin çiqasî agahdar bin di hevdîtinên derve de çi heta kîderê pêwîste bibin? Kîjan gavan bavêje ji welatê xwe re zirarê an jî feyde bide wê baştir hesap bike. Ev jî wê bihele ku hîn zêde bi înîsîyatîf û hakîm bibe.

Ji bo dîplomasiya netewa demokratîk hîn bi tendûristî were fêm kirin, di navbera dewletan de pergala têkiliya wek tekane hêmanê serdest netew dewletên ku tên qebûl kirin nas kirin, bi hêzên hegemon re rastiya têkiliya û têkiliya wan bi hevdû re, mafê temsîl û mijara erkan de agahiyên xûlase dayîn we di cîh de be.

Mijara hatina naskirinê şerta pêş a bingehîn ya dîplomasî ye. Esas ev mijar di hûndirê xwe de mijareke hinek têkel e. Netew dewlet di têkiliyên navnetewî de ji dema ku bûye hêmaneke bingehîn di destpêka mijarên ku tê nîqaş kirin de hatiye. Sedema wê ya esasî pergala nû bi wersiyona dewleta nû re ji cîhanê re dayîna qebûl kirin, bingeha we ya rewa ava kirin di vê bingehê de jî têkilî danîna dewleta bi hevdû re û di qada navnetewî de kesayet destgirtina wan çêkirine. Wekî ku wê bê texmîn kirin di vê bingehê de bêyî ku qebûl kirin an jî nas kirin çêbe, hatiye armanc kirin ku li pêşiya têkilîdanîna dîplomatîk were girtin. Pergal çawaniya dewleta nû ku were ava kirin ji bo berjewendiyê xwe ger guncaw nebîne bi nenas kirinê diçe bêbandor kirinê. Lewma di rewşeke wisa de avaniyeke siyasî ku nû tê ava kirin erê kirina pergalê an jî di aliyê dewletên ku tên nas kirin hatina nas kirinê dikin wek şertekî. Di vê wateyê de têkiliya navnetewî esasê xwe de tê wateya têkiliyên navnetewî. Dîplomasiya netew dewlet di wateyekî de bi her yek netew dewletên ku di cewherê xwe de yekdestiya derve ne, koordînasyon çêkirin û xebitîna pergala netew dewlet ya cîhanê ji bo şopandinê hatiye ava kirin. Ger netew dewletek derve neyê nas kirin xwe li ser lingan girtina vê dewletê nepêkan dibe. Sedemê vê di mentiqê pergala kapîtalîst ya cîhanê de veşartiye. Riza hêza hegemonîk nebe hebûna tu netew dewletê mayînde nabe.

Bi vê re nas kirin û têkiliyên dîplomatîk heman têgehê îfade nake. Dewletek dibe kudewletek din nas bike lê dibe kupêwîstiya têkiliyeke dîplomatîk ava kirinê nebîne. Dîsa bi dewletekî re têkiliyên dîplomatîk neyê ava kirin jî sefîrê daîmî li wir hiştinê dibe kuşert nebîne. Dewlet,

dewletên ku feydeyên sefîrên daîmî ku jê bandor kirinên rasterast û agahî girtinê ku dide çêkirin ger bifikirin ku feydeya wê nîne xwe li ser sefîrên li welatên din akredît (destûrdana karê dîplomasî kirin) kirinê re temsîl kirinê dibe kubifikirin. Dewletek dewletekî din nas bike, dewletên din di karên navnetewî de wek aktoreke serdest û 'serbixwe' hebûna wê qebûl bikin tê wateya di berjewendiyê xwe de dibîne. Nas kirina dewletê nayê wateya ku hikûmet herdem were nas kirin. Nas kirina hikûmetê, hikûmeta ku mijara gotinê ye dewleta eleqedar kontrola wê di dest xwe de digre lewma bi wê dewletê re di nava têkiliyan de bûyîn tê wateya bi wê hikûmetê re pêwîstiya kar kirinê hesibandin. Dewletek ji bo hiqûqa navnetewî re bibe mijar di aliyê dewletên din de jî pêwîste hatibe nas kirin. Lê li vê derê hûrguliyeke din ya girîng jî heye. Ew jî ew dewleta ku dixwaze were nas kirin misoger hikûmeteke wê ku berspirsiyarî girtibe ser xwe divê hebe. Di vê rewşê de mînak di aliyê hikûmetê de civakek nayê rêvebirin heta dewlet bixwaze jî di aliyê pergalê de qebûl kirina vê ne pêkan e. Wateya wê mafê dewletê yek ya hûndir yek ya derve qebûl kirin e. Ev maf li ser karên hûndir xwedî radeya tambûyîn û di têkiliyên derve de jî bi şêwazeke 'serbixwe' meşandina wê ye. Di rastî de nas kirin were wateya serdestî qebûl kirinê jî dîrok bi mînakên îhlalên ku dewletên vê serdestiyê nas nekirine ve tijî ye. Lihevnekirinên sînor û wek herî cîdî jî axa welatên din dagir kirin, serdestî wek hîç hesibandin zêdetir nayê tu wateyê. Lewma her du mafên dewletekî ku me jor de îfade kir di pêşiya hiqûqa navnetewî ku hatiye diyar kirin qebûl kirin tasarûfeke hem hiqûqî hem siyasî ye. Nas kirin an jî nas nekirin misoger nêzikatiyek siyasî ye, teqez pirsgirêkên hiqûqî wê biafirîne.

Esas bi çar şêwazên naskirinê ku pêk tê behs kirin pêkan e. Yekemîn; hiqûqî, duyemîn; fiîlî, sêyemîn jî; defakto naskirin, ev pênase zêdetir dewletek rastiya dewletek din qebûl kirinê re bes dimîne. Bi vê retêkilî û tasarûfên encamên hiqûqî ava bike misoger xwe dûr dihêle. Ji vê re têkiliyê Tirkiye ya bi Qibris re, heta cihekî têkiliyê bi Başûrê Kurdistanê dikare wek mînak were dayîn. Ya çaremîn; dewlet hevdû bi şêwazeke yek alî an jî bi beyana vekirî nas kirin nebe jî bi şêwazeke bêyî ku guman bihêle bi gaveke dikare nas bike. Mînak bêyî ku îhtîraz (çekince) deyne peymaneke dualî îmze kirin tê wateya bi awayekî sergirtî nas kirin. Dîsa

ziyareta welatek ji aliyê serokdewletê welateke din ve, tê wateya ew welat di aliyê wî welatî ve misoger tê nas kirin.

Yek jî di netew-dewletan de di pêvajoyên destguhertinê şûnde nêzîkatiyên ku tê wateya nas kirinê mijara gotinê ne. Mînak; bi serhiladanên gel an jî derbe desthilatdariyê aliyê ku xistiye dest xwe ger beriya vê pêvajoyê ji pergala serdest destûr girtibe, piştgiriya veşartî girtibe pir zêde zehmetî jê re nayê derxistin. Lê di rewşeke berovajiya vê de, pergal rewşa ku nû derketiye holê -di hûndirê wê de meşrûiyeta wê ava bûbe yanî piştgiriya gel hatibe girtin jî -ger ji berjewendiyê xwe re ters an jî xeteriyeke bibîne girtina ji yek zêdetir pêkanîna re diçe nêzikatiyan ceza dike. Dîsa li ser axeke cîh guhertina desthilatdariyê berpirsiyartiya têkiliyên navnetewî ji dewletekî derbasî yê din bibe di aliyê dewletekî din hatibe qebûl kirin jî berpirsiyariyên di rewşa berê de dewr girtinê re bi vê şertê ve girêdayî qebûl kirin dibe ku bibe mijara gotinê. Her du dewlet bi îradeya hevbeş yek bibin an jî qut bibin bi heman şêwazî encamên siyasî û hiqûqî wê derbixe holê.

Wekî ku were texmîn kirin ispateke din ya girîng ku dewletek bibe mijara hiqûqa navnetewî endamê Netewên Yekbûyî bûyîn e. Ev endamtî dibe îfadeya nas kirina gerdûnî. Îro tevahî welatên -xeynî hin îstîsnayan- xwedî serdestiya hûndir û derve endamê NY ne. Ye ku teşe dide hiqûqa navnetewî pergala navnetewî ava dike hêzên hegemon in. Di hûndirê pergalê de tevahî guhertin û nûbûnên ku were jiyan kirin, misoger di dorfirehiya îcazeta pergalê de çêdibe, pergal jî bi pîvana nirxên xwe yê madî û manewî re lihev dike an lihev nake esas girtinê re bi wê şêwazê biryar dide. Welatek an jî dewletek serdestiya xwe bi riza gel ava kiribe jî madeya yekemîn di her zirûfî de derbasdarbûna xwe diparêze. Her nêzikatiyek ku vê bide zorê dixwaze di aliyê dewletên ku serdestiya wan di milê hiqûqî de hatibe qebûl kirin be dixwaze dewletekî ku nû derketibe ser dike û serdestiya xwe re rehendeke hiqûqî dixwaze bide kesibandin de hatibe kirin di bin van zirûfan de di aliyê pergalê de ji pêkanînên hiqûqî û siyasî re tabî tê girtin. Heman şêwazê beriya vê dewletekî hatibe nas kirin an jî welatek şayet di bin her zirûfî de pêdiviyên pir alî yê pergalê re lihevkirinê nikaribe çêbike an jî ‘bi serê xwe’ nêzîk dibe bi pergalê re pirsgirêk jiyan dike, wek encama wê jî ji pêkanîna re tabî

girtinê nikare xwe xilas bike. Mînak hêza hegemonîk di rewşên wisa de yek li ser dîplomasiya vekirî ya din jî bi rêbazên veşartî welatên ku mijara gotinê ne hin çalakî û pêkanîna pêş dixe. Bi dîplomasiya vekirî destpêkê zora têxilker (caydırıcılık) tê esas girtin, lihevkirin ger were çavdêrîkirin gavên teşwîq dike tê avêtin. Bi giştî ji van re 'polîtîkayên gêzer û şivik' tê gotin. Di serê van şivikan de wek amûrê sereke ya polîtîkaya hêzê, '*beriya ku serî li hêzê bidin'; tehdîda serî li hêzê dayîn*" tê. Di hin rewşan de piranî hêz dixin dewrê. Li gel vê têkiliyên dîplomatîk qut kirin, ambargo, boykot, dorpêç kirin û hwd, wek pêkanînên aborî tedbîrên dide zoriyê dixin dewrê. Di hin rewşan de –kî ji vê re 'amûrên ku nade zorê xistina dewrê' tê gotin- wek enstrûmanên polîtîkaya gêzer aborî, alîkariyên teknîk, tawîzên tîcarî, tevgerînên îltimas, sozên piştgiriyên cûda û hwd, qut kirin tê rojevê.

Bi vê re li hember hêzên ku serbixwe tevdigerin û pergalê di pir aliyan de dayîna zorê diceribînin rêbazên veşartî pêkanînê re an dixin rê an jî ceza kirinê wan esas digrin. Di roja me de wek faaliyetên xebatên tetîkkêş ya aborî ku tên îfade kirin bertîl, xistin, suîqast, tevlîheviya civakî afirandinê re girseya li hember rêvebiriyê derxistin û hwd, li ser pir mûdaxeleyan planên çalakiyên veşartî dixin dewrê. Lewma her çiqasî di lîteratûra hiqûqa navnetewî de ji têgehen desthilatdarî an jî serbixwe were behs kirin jî ev têgehên ku rastiya wan nîne ye. Di vê wateyê de tu dewlet an jî welat ne serbixwe ye. Rêvebiriya her welatê di wateyekî de wek karmendê pergala hegemonîk e. Welatên ku ji xwe re dibêjin serbixwe, ji pergala hatiye saz kirin bi rêjeyî dibin xwedî serbestbûneke bi şert. Di wateya giştî de jî bi giştî mecbûriyeta di arasteya daxwazên pergalê de tevgerandin heye. Di navbera dewlet û pergala hegemonîk de wisa hiqûqeke vekirî û girtî û zagoneke siyasî heye.

Piştî ku Serokê Gelê Kurd Abdullah Ocalan derket Roma ji hin welatan re daxwaza îltîcaya ku bê bersiv ma dîsa bi revandin û teslîmî Tirkiye kirin jî binpekirina hiqûqa navnetewî û hiqûqa welatê xwe de pêk hatiye. Sedemê wê pergala hegemonîk ya birêve dibe derketina ku Birêz Ocalan kiriye ji berjewendiyê xwe re guncaw nedîtin e. Di vê rewşê de welatek hiqûqa xwe ya hûndirîn esas girtiba û jê re guncaw tevgeriya ba di aliyê pergala navnetewî û xwediyê wê ve pir pirsgirêkên hiqûqî û siyasî wê di pêşiya

wan da hatiba çikandin. Em dizanin ku tu welatên Ewrupa vê negirtiye berçav. Ya duyemîn jî dewletek meşrûiyeta xwe bi vîna hûndir re sipartî pêkanîna wê ji bo nas kirinê pir zêde wateyek îfade nake. Meşrûiyeta xwe ya esasî zirûfên ku pergala navnetewî jê re nas dike û ji van zirûfan re lihevkirina ku çêdike digre dest. Ya sêyemîn jî misoger ji bo dewletek were nas kirin xwedî hikûmet bûyîn wek pîvan tê nîşandayîn. Li vê derê girîngiya hikûmetê, berpirsiyariya ku pergala navnetewî deyne pêşiya wê di welatê xwe de di bingeha berpirsiyariya şênber, siyasî û hiqûqî digre dest û tîne cîh de bûyîne. Di vê rewşê de her çiqas hikûmet bi hilbijartin werin ser kar jî di rastî de di welatê xwe de mekanîzmaya pêkanîna pergala navnetewî pêştir nabin xwedî vîn. Vîneke nispî nîşan bidin jî bi pergala navnetewî re lihevhatî bîyîn pêwîste.

Mijareke din jî di derbarê temsîlê de ye. Wekî sazî li cem dewletê sefîrê daîmî, temsîla dewletê dike. Yê ku erka temsîliyetê dide sefîran an serokê dewletê an jî serokomar in. Serokdewlet bîzat nameyên ku îmze dikin didin diyar kirin ku sefîr, nûnerê ku baweriya wan pê tê ye. Lewma wekaleta wê digrin ser xwe. Bi vê re sefîr yanî qasid, kesê ku serokê dewlet tayîn kiribe jî ne wek nûnerê dewletê wek nûnerê hikûmetê tê qebûl kirin. Di vê çerçeveyê de sefîrê ku nûneriya dewleta xwe dike di serî de polîtîka derve ya hikûmeta xwe polîtîka wê jî di îrade û kesayeta xwe de temsîl dike.

Di roja me ya îro de yek ji rêgezên girîng ya dîplomasî jî, netew dewlet di welatên derve de bi yek kesî temsîl kirine. Dewletek di welateke din de du sefîr an jî bi navê dewletê du nûnerên ku biaxive nabe. Derveyî sefîr an jî di heman astê de qasidê ku di heman radeyê de ye, tenê wek xwezayî bi serokên dewletê re, wezîrên karê derve wekî din bê formalîte xwedî radeya welatê xwe temsîl kirinê ye. Lê serokwezîr temasên derve an jî radeyên peymanên navnetewî îmze kirinê mecbûr in bi biryarnameya bigrin.

Mijareke din ku were vekolîn kirin jî erkên esasî yên sefîran e. Erkên ku sefîr dikin, piranî kom kirina agahiyan, kirina rapor, bi navê welatê xwe mûzakere meşandin hwd, nin. Lê dema ku mîsyona wan ji nêz ve bê vekolîn kirin wê were dîtin ku mijara mîsyona sefîr bicîh kirin di aliyê her welatî de hin karên rojaneyî pêk anîne pêwîst bike jî wek esasî di aliyê

pergala hegemonîk ya mekanîzmaya rêvebirinê şopandina xebitîna pergalê, venêrîna wê û di rewşên pêwîst de mûdaxele û rêbazê mûdaxele, naveroka wê diyar kirinê de xwedî mîsyoneke stratejîk e. Di têkiliyên navnetewî de tekane hêmanê serdestiyê li ser netew-dewleta pêş xistin wateya li ser diranên pergala navnetewî ku hatiye ava kirin tê meşandin hildigre. Yanî her dewlet di wateyekî de wek diranên xebitîna pergalê ku teşe dide de ye. Herhangî diranek (di hûndirê xwe de cewaziyên cîh û bandor kirinê hebe jî) berêxwedayîna mîsyoneke cûda wekî ku were fêm kirin wê herikandina pergalê di wezneke girîng de bandor bike. Lewma dirana di bin çavdêriyê de hiştin, kontrol kirin û dema ku pêwîst kir mûdaxele kirin ji pergalê re mekanîzmayeke ku xebitîn dide qezençkirinê. Pergal, di esasê xwe de li ser tewazûnên pir hesas tevdigere. Kulekî (aksaklık), xwedî fonksiyonên berjewendiyê giştî di kêliya wê de bandor bike de ye. Her tim ji ber danehev pêwîst dike di nav rastiya herîkîner de bûyînê dixwaze rista ku qasid dileyizin di vî milî de heta dawî girînge. Hinekî xebatê muhendîsî jî dikare were gotin. Lewma qasid welatê ku lê dimînin bi navê pergalê bandor kirin, araste dayîn, mûdaxele kirin heman demê de beriya ku rewş û îhtîmalên ku rewşa heyî bandor bike derkeve derbarê îhtîmalên heyî beriya wê agahîdayîna navendê, ji navendê jî tedbîr û reçeteyên lihevkirinê bide çêkirin an jî tedbîr ava bike girtin û pêkanînê de xwedî fonksiyon e.

## GUHERTINÊN KU DÎPLOMASÎ DE HATINE JIYAN KIRIN

Serdemeke ku leza agahî û enformasyon pêşdikeve û heman weznê de belav dibe de em jiyan dikin. Di quncikekî herî dûr ya cîhanê pêşketinên ku tên jiyan kirin di kêliya wê de mirovên ku di aliyê din yê cîhanê jiyan dikin dibin xwedî agahî, bi vê re jî namîne wekî ku di pir bûyeran de tê dîtin helwestên hevpar û çalakiyan pêş dixin. Li hember ev pêşketinên lez netew-dewlet û sînorên ku ava kirine bi şêwazeke cîdî bandor dibe, otorîte û avaniyên navendî radeyên xwe mecbûr dimînin ku dewrî herêmê bikin. Netew-dewlet ji ber pirsgirêk û krîza ku jiyan dikin, bi taybet pergala navnetewî ger ji berjewendiyên aboriya pergalê ters bikeve jî di milê lawazbûnê de pêşketina wê re dahf dide. Ev rewş dihêle înîsîyatîfa herêmê hîn zêde pêş bikeve, ji bo hêzên demokratîk jî di milê erenî de rêxistinbûn û rêvebirina xebatê re zemîn pêşkêş dike. Lewma

pergala modernîst ya sermayedar milekî de di nava pêvajoya kûrewî de cihê xwe digre milê din de jî nakokiya ku bi avaniya hêzên herêmî re pevçûn jiyan dike mecbûr dimîne ku bi hevre tevbigere. Tevahî pêşketin qasî têkiliyên navnetewî xebitîna xebatên dîplomatîk û çawaniya wê jî di kûr de bandor dike.

Milekî de bi aboriya kûrewî re bûyîna yek û di qada teknolojî de pêkandinên mezin ku çêdibin di rewşa heyî de girêdanbûna welatan beramberî hevdû di wezneke girîng de zêde kiriye. Dikare were gotin ku têgeha ‘dewleta serbixwe’ ku berî vê netewperestî kiribû mijara pesindayînê, her roja ku derbas dibe wateya xwe zêdetir wenda dike. Wisaye ku di roja me de tiştek ne bi sere xwe ye, diyalektîka beranber hevdû, di nava têkiliya ragihandin û rajêrî de hebûna xwe berdewam dike. Bi taybet sedemeke din ya rajêriya welatan ya beranber hevdû êdî çiqas bi hêz jî bin yek ji wan tenê jî bi derfetên xwe bi pirsgirêkên ku pê nikarin re rû bi rû tên. Her welat ji bo pê karibe pirsirêkan yekemîn; radeyên ku pir navendî kirine mecbûr dimînin ku dewrî cîgayî bike. Ya duyemîn jî; bi qada navnetewî re mecbûriyeta têkilî danîne derkeve holê.

Li hema ciheke cîhanê qeyraneke aborî ku derkeve holê li aboriya welatên pir pêşketî jî gef dixwe (tehdîd dike). Êdî pirsgirêk hevbeş bûne û tevahî hêz ji vê bandor dibin. Lewma ji bo karibin pirsgirêka tevgerîna hevbeş mecbûrî dibe. Pirsgirêka pir zêde ya derdor, koçbertiyê, tevgerên pênaber, nexweşiyên şewbê, hişbir û mişextvaniya mirovan û hwd, pirsgirêkên bi vî rengî bûne pirsgirêkên ku bêyî tevgerîna hevbeş ya welatan nekaribin pê bikarin. Di nav van zirûfan teva de li hember polîtîkaya hûndir ya klasîk û têkiliyên derve a rêbazên stratejîk di çapemeniya îro û di têkiliyên tevlîhev û ‘bêpergal’ ya rayagiştî de nebes dimîne. Ev rewş dîplomasiya navnetewî dîsa di wateya giştî di feraseta dîplomasî de mecbûriyeta guhertinên girîng derxistiye holê.

Wekî ku were fêm kirin beriya her tiştî destpêkê rojeva dîplomasî cûr bi cûr bûye. Dîplomatê welatan li gel erkên xwe ye kevneşop wek konsolostiya siyasî, aborî, çandî bi pirsgirêkên nûpûnû re eleqedarbûnê kiriye wek mecbûriyetek. Di mijarên navnetewî ku tevahî beşan eleqedar dike ku pisporî jî dixwaze faaliyetên dîplomasî ya nû derketiye holê. Bi vê re di asta kûrewî û xwecîhî de saziyên civaka sîvîl ku faaliyet dimeşînin jî,

di qadên wek pirsgirêkên ekolojîk, -mafê mirovan- nifûs û tevgerên koçberiyê de ji bo li ser hikûmeta xwe zext çêbikin rojeva dîplomasî fireh kirin û cûr bi cûr kirinê de rolên girîng dileyizin.

## GUHERTINÊN DI PÊVAJOYA DÎPLOMASÎ DE

Guhertinên herî girîng ya di pêvajoya dîplomasî de roja me ya îro polîtîkayên hûndir û derve bi hevdû re bi şêwazeke hîn tîr kelijîne. Sedema vê ya bingehîn pir berî vê hin mijarên ku wek pirsgirêkên hûndir dihatin hesibandin êdî ji asta navnetewî re întîqal kiriye. Saziyên hiqûq ya qada navnetewî û rêyên wê êdî hîn zêde tercîh kirin û zêdebûna saziyên di vî alî de zêdehî bi şêwazeke cidî hilhilîna têgeha darazî di vê de bandoreke girîng e. Dîsa zêdebûna mûameleyên ku sînorên xwe derbas dike û kûrewî bûyîna aborî bandorên girîng yên din in. Wekî ku me jor de jî da xûya kirin sedema ku polîtîkaya hûndir û derve hema hema bûye yek, faaliyeta dîplomatîk çawaniya xwe guhertinê re pirsgirêk û polîtîkayên ku zêdetir wek meseleyên hûndirîn tê hesibandin wek mafê mirov, enerjî, ewlekariya hûndir, polîtîkayên derdor re jî mûxatap dibe. Lê aktorên (yên rista esas dileyizin) dîplomasî ku di mijarên wisa de dibin mûxatap di hin rewşan de û di welatan de hîn jî bi rexneyên mûdaxeleyî karê hûndir tê kirin re rû bi rû dimînin. Wek mînak, dîplomat wek pêwîstiya dîplomasiya rayagiştî bi derdorên cûr bi cûr û di vê navberê de bi komên mûxalefetê pêşxistina têkiliya di rêvebiriya welatan de dibe sedema nerehetiyên cidî.

## GUHERTINÊN DI ALIYÊ RÊBAZ DE

Ji peymana Viyana ya 1961’an û vir ve di rêbazên dîplomatîk de guhertinên girîng hatine jiyan kirin. Rûxmê vê di dîplomasiya navnetewî ya niha de hîn jî serî li sê rêbazên bingehîn tê kirin. Di têkiliya dualî de dîplomasiya fermî a takekes, dîplomasiya bêdeng ‘pişt perde’ û bi mûzakereyên pir alî şûna xwe mijûl kirinê, dîplomasiya xwe gihandina konsensûs e (yekdengî ye).

Di dubendiyên nav dewletan de rakêşiyên heyî ji bo were kêm kirin ji holê rabûna zîrveyên rojhilat-rojava, mûzakereyên du hêzên sûper cihê xwe ji hêvdîtinên piralî ya serokan re hiştin wek guhertinên sereke tê qabûl kirin. Mûzakereyên di qada aborî û bazirganî di çarçeveya NY di

konferansên NY ye aborî û pêşketinê de hevdîtinên di navbera komên welatên mezin şemitiye rêxistina bazirganî ya cîhanê û saziyên xwecihî. Wek Teşkîlata Ewlekarî û Hevkariyê ya Ewrupa, NATO, NY, YE saziyên cûr bi cûr û bi hevdû re di nava pêşbirkê de di navbera xwe de rêbazên hevdîtinê ava kirine.

Di welatên Ewrupa, Rojhilata Navîn, Efrîqa ji ber sedemên pevçûnên hûndirîn pirsgirêka welatên ku lawaz bûne an jî dewletên hilweşiyane, dîplomasiya derbasbûnê an jî piştî dubendî dîplomasiya jinûve înşayê ku jê re tê gotin, hiştiye ku cûreyeke nû derkeve holê. Hêmanên esas ya rêbazê vê dîplomasiyê operasyonên ewlekariya lidarxistin, rêvebirî ava kirin, reforma hilbijartinê kirin û mekanîzmaya dadgeh kirina sûcên şer ava kirine.

Ji rêbazeke din a nû re jî navê 'dîplomasiya rêvebiriya nû' dikare were dayîn. Dîplomasiyeke wisa, 'bi taybet ji bo rêvebiriyên ku ji civakê re polîtîkayên bes întac nake an jî wek sedemên tevlîheviyên hûndir welatên ku nikarin werin rêvebirin mûdaxeleya di wezneke de ya civaka navnetewî an jî bi şêwazê alîkarî dikare were pênase kirin '(weşanên zankoya anatolya).

Li gel vê şoreşa ragihandinê girîngiya xebitîna rapor dayînên dîplomatîk kêm kiriye, ragihandina dîtbarî û nivîskî pir beriya sefaretan bi şêwazeke pir bi lez êdî diteyisîne. ji ber vêsedemê mîsyona raporên dîplomatîk di wezneke girîng de ji şîroveyan re hatiye daxistin. Helbet derfetên ku înternet ava kiriye jî di xebatên dîplomatîk de bi şêwazeke berbelavbûyî tê bikaranîn.

Ji tevahiya guhertinan re bersiv dayîn û ji nêvenga nû re ji bo lêbikin dîplomat mecbûr in hîn vekirî û bi tevger bin. Şêwazê kevn ya ser masê an jî *dîplomasiya salon* êdî derbas bûye. Ji fersendên şoreşa teknolojî sûd wergirtin, tenê bi derdorên fermî re na, bi saziyên civaka sîvîl re, însîyatîfên xwecihî re di nava hevkariyê de bûyîn çarçeveya dîplomasiya roja me ya îro pir berfireh kiriye.

## CÛR BI CÛR BÛYÎNA AKTORÊN DÎPLOMATÎK Û MEKANAN

Di serî de pêwîste were îfade kirin ku têkiliyê navnetewî êdî ji têkela netew-dewlet û saziyên navnetewî derketiye. Avaniyên wek SCS, rêxistinên derdor, cemaat, meqamên xwecihî, şaredarî, parlamento, partî û hwd, di ser dika navnetewî de her diçe zêdetir rol dileyizin. Ev rewş wek rû bi rû mayîna dîplomasiya klasîk a wek 'meydan xwendin' tê şîrove kirin. Derveyî wezareta karê derve ya dewletan û endamên dîplomasî pir saziyên din di têkiliyên navnetewî de rol dileyizin. Mînak; kar, adalet, karê hûndir, xezîne, wezaretên çandinî di qadên pisporiya xwe de ewqas pêşketine ku di welatên rojavayî de bi navbeynkariya wezareta karê derve û bi sefaretan re temasên ku tên kirin behsa cîh girtina wan tê kirin. Dîsa serokên serfermandar yê welatên mûtefîq derveyî mekanîzmayên karê derve di çarçeveya xwe de cereyan dike. Ji xebatên vê qadê re roja me de jê re '*xebatên dîplomasiya* leşkerî' tê gotin.

Wek şêwazê kevneşop ya temsîla dîplomasiya navnetewî sefaretên di peytaxtan de hîn jî girîng tê dîtin lê xebitîna wan hatiye guhertin. Wezaretên karê derve mînak, bi armanca wek navbeynkarî erkên ku têne şandin de hejmara mîsyona erkên taybet zêde dibe, konferansên navnetewî dîsa civatên di saziyên navnetewî de pêşketina dîplomasiya zîrve, di dîplomasî de hîn zêde diyarker dibe. Bi rastî têkiliyên piralî bûye çarçeveya esas ya dîplomasî. Derfetên gihandin û ragihandinê ji ber pêkanînên mezin kirinê li gel dîplomasiya zîrve an jî bi têknolojiya vîdeo-telekonferans konferansên ku tên kirin hevdîtinên rû bi rû jî tê kirin. Kanalên ji netew pêşdetir xwedî çawaniyeke hîn cewaztir e û di navbera gel û civaka saz kirina têkiliyan de risteke hîn êrenî dileyize. SCS'yên cûr bi cûr saziyên derveyî hikûmetan, organên xwecihî, partî, şîrketên pir netew êdî bi hêsanî dikarin têkiliyên derveyî sînorên welatên xwe re pêş bixin. Ev sazî di civînên navnetewî an jî konferansan de bûyerên navnetewî dikarin bandor bikin. Di hin welatan de hikûmet bixwazibin araste bidin van têkiliyan jî saziyên mijara gotinê ne êdî bûne aktorên faal. Wisaye ku hikûmet carnan ji bo bigihêjin armancên xwe yê polîtîk ji van hêzan alîkarî daxwaz dike heta mecbûr dimîne bikeva nav hevkariye jî.

**GUHERTINA TÊGEHA SERDESTIYÊ**

Di serdema me de serdestiya netew-dewlet di astekî de sinordar kirin pêşketineke girîng a din ku xebatên dîplomasî bandor dike ye. Têgeha serdestiya misoger têgeheke hema hema paşde maye. Serdestiya welatan an bi dilê xwe an jî bi rêya mûdaxeleyên derve dikare were sînordar kirin. Wisaye ku wek mînaka YE welatên serdestiya netewî dewrî qada serweriya hevbeş kirine hene. Welatên ku tevlî hevpeymanên ku berpirsiyariya hiqûqî tîne dibin jî ji serdestiya xwe re di hin mijaran de sînor danînê qebûl dikin. Ber bi guhertinê çûyîna têgeha serdestiyê di astekî de sînordar kirina serdestiya netew-dewlet wek giştî pêşiya civakê vedike. Civak hem bi hev re û hem jî bi pirsgirêkên xwe re her ku derbasî navhev dibin rehendê dîplomasiya rayagiştî girîngtir dibe û hîn zêde derdikeve pêş. Bi bandora pirsgirêkên di binyada pergalê de ji destpêkirina wê û di nava pêvajoyê de di întaca çareseriyê de pirsgirêkên ku giran bûne bi taybet jî ji ber sedema têkel bi şêwazeke cîdî ji vê bandor dibe guhertin teqez dibe. Têkelên sermaye û desthilatdarî qasî berhev kirina nirxên zêde berhevkirina pirsgirêkên ku ji dema Sumeriyan afirandiye vir de vê rewşê pir zêde dayîna zorê bi rengê guhertina şêwaz ji xebatên nûbûnê re rê vekiriye. Şaristaniya navendî ev şeş hezar sale di bin pirsgirêkên ku berhev kiriye wek berê nema dikare xwe bimeşîne. Têkoşîna hêzên demokratîk ya bênavber bi pêşdeçûyînên zanistî û teknolojîk re nûbûnên di jiyana mirov û civakê de afirandiye dema ku dibe yek guhertin teqez bûye. Di esas de guhertina herî mezin ya ku tê jiyan kirin, li ser xwezaya mirov û hebûna wê ya civakî mekanîzmayên zextê ku pir hişke her ku diçe bandora xwe wenda dike, wek encamê wê jî lêgerîna vegera cewherê xwe ya xwezaya civakî ye. Bi bandora xwe wenda kirina mekanîzmaya zext û tehakûmê û mecbûr mayîna guhertinê hem di civakê de hem jî di têkiliyan de zirûfên demokratîkbûnê derxistiye holê. Em di serdemeke ku êdî cîhana me ziviriye wek gundekî, agahî û danehev hertim xwe nû kirinê re bi bandora teknolojiya pêşketî xwe li her derî berbelav dike de ne. Ji ber herkes ji her tiştî agahdar e, pir bi hêsanî têkîlî tên pêşxistin, çalakî û rêxistinên hevbeş ku sînoran derbas dike tên afirandin, her tiştî dikarin rexne û lêpirsîn bikin, dema ku pêwîst bû dijî wê derdikevin û tevnên exlaqî û polîtîk bi lez pêş dikeve de jiyan dikin. Agahî êdî di wezneke giran de ji têkele desthilatdariyê derketiye. Gotin di

cîh de be ji esareta şeş hezar salan, ji tarîtiya zindanan rizgar bûye û azad bûye. Agahiya ku azad bûye jinûve vegeriyaye xwediyê xwe yê ku wê afirandiye. Lewma nepenî (gizemlilik) wenda bûye, xwediyên desthilatdariyê wek mîsala 'kral taziye' êdî nema dikarin xwe veşêrin. Bi vê re pergala serdest ew dema ku xwe li ser civaka hakîm dikir, dixist rewşa ku NEBE NABE; ew serdem êdî tê girtin, tevahî argûmanên xwe ye rewa wenda dike. Mirov û civak ji hêmana ku hatine diyar kirin derdikevin û di nava taybetmendiyên diyarker de nasnameya xwe jinûve înşa dikin. Mirovahî ji prometeûsa, ji şervanên azadî û demokrasî re wekî ku deynê xwe dide pey şopa wan de dest bi meşê kiriye. Civak êdî bi ketina ferqa hêza xwe re tevahî bend û sînorên ku li pêşiya wan hatiye danîn derbas dikin, ew wênesazên sexte ku cîhanê bi xêz dikin û teşe didin rizgar kirinê re xetên xwe hakîm dikin. Civak avaniyên navendî ku wan dorpêç kiriye dayîna zorê re nasnameya xwe hîn zêde derdixin pêş, gel û civatên din bi vîn û feydeya hevbeş re sipartî têkiliyên berwar û rêxistina ava dikin, însiyatîfên bi bandor derdixin holê û wateyên nû didin. Dîplomasî divê wateyê di têkiliyên ku demokratîk dibe û pêşxistina van têkiliyan de risteke girîng dileyîze.

Di nava vê pêvajoyê de me behsa girîngiya dîplomasî ya di rehendê rayagiştî de her ku diçe zêde dibe kiribû. Mînak derbarê pêkanînên dîplomasiyê de agahî û şîroveya di kêliya wê de li ser înternet ji girseyan re pir lez digihe, li ser malperên web ev pêkanîn dikare were rexne kirin û şîrove kirin. Bi saya vê heta niha civatên ku ji têkiliyên navnetewî re eleqeya xwe nebû, bi van têkiliyan eleqeya pirsgirêkên xwe yê xwecihî bi hêsanî keşif dike. Demeke navber ya derbasbûna pergala dîplomasiya kevneşop ya girtî, hiyerarşîk, jor de her ku diçe cihê xwe ji dîplomasiya zelal, vekirî û nermbûnê re sipartî dihêle tê jiyan kirin. Bi lez pêşketinên enformasyon û ragihandin bikaranîn, têkiliyên navnetewî hîn zêde zelal kirinê re guhertina nêvenga dîplomasî re rê vedike. A rast dîplomasî ji bo ji van meydan xwendina re bikaribe bersiv bide yek ji nêzîkatiyên herî girîng jî, ji civakan re hesap dayîn û qasî bes dike zelal bûyîne.

Dîplomasiya roja me ya îro de tenê ne guhertinên têkiliyên navnetewî, her ku diçe hîn zêde têkiliyên ji dewleta pêştir guhertinên avanî girtina nav xwe jî pêk tê. Ji bo dîplomata civaka sîvîl qasî ku tenê nifşek beriya xwe

neyê fikrandin girîng bûye. Pêkanînên dîplomasî di roja me de mirovên di kolanan de hîn zêde derketine pêş û girîngiya wê zêde bûye. Xwe gihandina agahiya de demokratîkbûna ku pêş ketiye, mirovan, koman, cemaatan, rêxistin û partiyan, organîzasyonên xwecihî, xûlase tevahî însîyatîfên ku vîna xwe ava kirine hem di navbera xwe de sûdê hevbeş û piştevaniyê re spartî pêşxistina têkiliyên dîplomatîk derfetên mezin daye hem jî van avaniyan zivirandiye çavdêrên serbixwe heta zivirandiye beşdarvanan. Civaka sîvîl di asta herî bilind de bûye mijara dîplomasî. Hejmara saziyên derveyî hikûmetê ya ku pir zêde bûyî, bandora tevgerên protesto ya ji dewleta jortir a ku zêde bûyî û hêza çapemeniya nû ya zêde dibe qadên manevra ya dîplomasiya navnetewî -dîplomasiya fermî- pir teng kiriye. Aktorên ne fermî nêrînên ku diparêzin li gorî bûrokrasiya giran yê karê derve bi şêwazeke pir nerm û lez piştgirî digre. Wisaye ku ev enerjiya ku hatiye ava kirin xwe gihandiye qasî ku bandor li ser polîtîkayên hûndir û derveyi welat bike. Mînak wekî ku di hin biryaran de bûne sedem ku dewlet gav şûnde bavêjin, di diyarkirina polîtîkayan de jî xwe gihandine temsîla hêz û vîneke mezintirîn. Armancên polîtîka derve û angaştên hikumetên îro bi şêwazeke bi bandor parastina wan enceq di rayagiştî ya civakê û taybet jî welatên hedef hema hema tevahî derdorên wê di kîjan weznê de dikarin bandor bikin re girêdayî bûye. Welatek di pirsgirêkek  dervede çiqasî mafdar be jî ger mafdarbûna xwe ji welatên din re, di serî de jî ji rayagiştî ya wan welatan re nede qebûl kirin carnan neheq jî xûya dikin.

Di vê qadê de qeraseya (manîwela) herî bi bandor ji amûrên dîplomasiya klasîk jî pêşdetir di salên dawî de welat jî her ku diçe girîngiyeke mezin didin ‘dîplomasiya rayagiştî’. Bandora navgîna dîplomasiya klasîk jî bi armanca amade kirinê wek piştgiriya herî mezin di dîplomasiya roja me ya îro de ji ber cihê navendî êdî dest digre di sernivîseke din de hîn bi berfirehî em ê hewl bidin vebêjin.

Di jor de rûxmê tevahî pêşketin û guhertinên ku li ser hatiye seknandin girîngî û pêwîstiya dîplomasiya rû bi rû bi temamî ji holê rabûna wê pêkan xûya nake. Zîra dewlet wekî ku viya ji bo xwe pêwîst bibînin di navbera gelan, civakan, rêxistinên civaka sîvîl de li beranber hevdû bawerî û feyde ve spartî û ji bo gihandina armancên mezin dîsa ji bo

hûrmet biafirînin temasên takekes û dîplomasiya rû bi rû wê girîngiya xwe herdem berdewam bike. Ji xeynî vê dîplomasî jixwe di wezneke mezin de guhertin jiyan kiriye û hîn jî diguhere. Ev jî teqezbûna dîplomasî piştrast dike. Erka pêşek ya ku were kirin dîplomasî, di navbera netew-dewletan de wek amûrê qirêj ya lîstokên şer ya bikar û manîpulasyon bûyînê derxistin, jinûve bi cewherê rastiya netewa demokratîk re gihandina hev e. Bi serxistina vê dîplomasî di navbera gel û civakan de di pêşxistina aşitî, biratî û piştigiriyê de wê risteke bingehîn û girîng ya bi berhem, çawanî û bi feyde wê bileyize. Dewlet û saziyên navnetewî di têkiliyên navnetewî de rista ku dileyizin bandora wê kêm jî bibe aktorên sereke ev in. Di cîhaneke wisa de tevnên civakî ya exlaqî û polîtîk pêşdebirinê re, di navbera gel û civakê de dualî an jî piralî, rasterast an jî ne rasterast, zîrve an jî di asteke jêr de dîplomasiya ku were meşandin ji bo mirovahiyê nirxên hevbeş û bi feyde ku girîngiya jiyanî hildigrin ava kirinê de dîsa pirsgirêkên heyî û lihev nekirina bi rêyên aştiyane çareserkirinê de bûyîna amûrê sereke wê berdewam bike.

## LÊNÊRÎNEKE KURT LI DÎPLOMASIYA RAYAGIŞTÎ A KU DI SERDEMA ME DE DERKETIYE PÊŞ

Dîplomasiya rayagiştî ya di roja me de ji ber sedema guhertinên çêdibin dibe cûreyek dîplomasiyê ku her girîng dibe û kişandina bale mecbûr dike ye. Ev cûreya dîplomasî ku gelemperî hikûmet û rêvebirên welatên biyanî bandor kirinê hedef dike, heman demê de berê xwe daye civaka welatên biyanî bandor kirinê. Wisaye ku qada dîplomasiya rayagiştî wek hêmanê herî girîng tê dîtin. 'dîplomasiya nû' di wezneke girîng de 'dîplomasiya rayagiştî ye'; li gorî dîplomasiya kevneşop pêwîstiya hûner, teknîk û nêzikatiyên cûda pêş tê danîn. Rayagiştî û SCS li ser polîtîkaya hûndir û derve ya welatan rêjeya giraniya wê her ku zêde dibe girîngiya dîplomasiya rayagiştî zêde dibe û di guhertina pîşeya dîplomasî de risteke bi bandor leyistina wê mûhtemele.

Nêrînên ji hevdû cûda werin jî di pênasekirina têgehan de gelemperî welatek ji bo armanca xwe ya netewî û polîtîkayên xwe, çand û îdealên xwe bi rêya danasîne rayagiştî ya biyanî bandorkirinê derxistina pêş re, tê qebûl kirin ku girîngiya vê xebata bandorkirinê zêde bûye. Bi vê re

dîplomasiya rayagiştî ya ji hêmanên dîplomasiya kevneşop cihê dike nîqaşen girîng berdewam dikin.

Pir nivîskar, dîplomasiya rayagiştî esas de propagandaya ji bo rayagiştî ya welatên din bi naveke cûda kirinê îbaretê didin xûya kirin. Li gorî hinek din jî dîplomasiya rayagiştî di bingeh de ji propaganda cûda ye, têgeheke nûpûnû ji xwe re xweser e. Bi vê re a rast yên ku dibêjin şêwazê dîplomasiya vekirî jî hene, qasî em dizanin ev têgeh li DYE hêdî hêdî cihê têgeha propaganda girtiye. Bi taybet piştî salên 90'î pir hikûmet xebatê propaganda di bin navê dîplomasiya rayagiştî de pêşkêş kirinê. Ev têgeha ku îro di aliyê piraniya de hatiye ecibandin xebateke nû pênase kirinê re dîplomasiya rayagiştî di weznekî de meylên rayagiştî ya biyaniyan jî kirina hesabê wek şêwazê propagandayek nû derdikeve holê.

Nêrîneke din jî bi şêwazê dîplomasiya rayagiştî bi qasî dîplomasiya kevneşop girîng e lê şêwazê xebateke cûda ye tê kirin. Tê diyar kirin ku mijara dîplomasiya kevneşop têkiliya di navbera nûnerên dewletan an jî aktorên din e. Hedefa dîplomasiya rayagiştî civakên welatên din, komên ne fermî, sazî û kes in. Nêrîn û nêzikatiyen ji hev cûda hebe jî dîplomasiya rayagiştî bi şêwazê bala herkesî bikşîne ser xwe wek qada xebateke bibandor derketiye pêş pêwîste ev were dîtin. Dewlet dîplomasiya rayagiştî di berjewendiyê xwe de bikartînin lê ev nayê wateya ku dîplomasiya rayagiştî ji bo tevgerên derveyî pergalê û însîyatîfên dijber re qadeke girîng bûyînê re asteng e. Piştgirî, propaganda kirin, propagandayen dijber bêbandor kirin, zemîne rewa berfireh kirin û îrade ava kirin, herî bingeh de di navbera hêzên demokratîk de têkiliyên sîmbiyotîk pêşxistinê de qada xebateke ku pêşketinên mezin biafirîne ye.

## BEŞA 2

## DESTPÊK:

Şaristaniya navendî, avaniyeke têkel ya ku xwe di bingeha dijbertiya civakê, li ser xespa nirxên zêde pêşxist û bi şêwazê bajar+çîn+dewlet saziyeke ku xwe bi pergal kiriye. Wek xeleka dawî ya vê avaniyê modernîteya kapîtalîst ev cîhana ku em hîn jî lê jiyan dikin navê pergala

wê ya hakîm e. Moderníteya sermayedar ku moderníteya hakîm ya 400 salên dawî ye xwe li ser sê lingên bingehîn bi pergal kiriye. Ev kapîtalîzm, pîşesazî (endûstriyalîzm) û netew-dewlet e. Netew-dewlet palpişta herî girîng ya pergalê ye, amûrê bingehîn ya fetihkirina civakê û çalakiya mêtingeh kirinê ye. Bêyî lingê netew-dewlet her du ling hebûna xwe nikarin bidomînin. Lewma netew-dewlet amûrê stratejîk ya ku her du lingên din xebitîn dike, civakê ji vê re amade û guncaw dike û bi vê re jî bes nabîne mekanîzmayên mêtingehkirinê xebitîn dike.

Dewlet di wateya herî giştî de wek 'têkela li ser berhem û nirxên zêde hatiye saz kirin' pênase kirin gengaz e. Dewleta ku têkel e ji bo berhem û nirxên zêde ji civakê binezilîne amûrên bîrdozî di serî de heta amûrên zorê xwe li ser civakê wek saziya avaniya jor rêxistin kiriye. Dewlet saziyeke ku ji bo nirx û berhemên zêde ku mijara gotinê ne ji bo mêtingeh bike desthilatdarî bi zagonên hiqûqê ve girê dide, bi siyaseta xwe koordîne dike û birêvê dibe ye. Di ronahiya vê pênaseyê de netew-dewlet em bi xûlase pênase bikin; netew-dewlet ji formên dewlet ji yên berî xwe cûdatir forma esas ya netew-dewlet ku şaristaniya kapîtalîst ya di binesaziya xwe de yek netew dihewîne û tevahî endamên netew di bingeha ola netewperestî de bi dewletê re yekpare dike û desthilatdarî ji tevahî civakê re belav dike ye. Taybetmendiya herî diyar ya ji formên dewletê yên berî xwe cûda dike, bi xwespartina netewekî re tevahî netew, pêkhateyên ji derveyî xwe bi çanda wan ya hezaran salan re, bi mentiqeke yekser reş û spî tine hesibandin, hilweşandin, bişavtin û tesfiye kirin e. Netew dewlet bi vê hişmendiya yekser re hemwelatiyên ku dişibin hev afirandinê esas digre. Kevneşopiya çand tine dike. Dîrok ji nêz ve dema ku were şopandin wê were dîtin ku bi hezaran ziman, bi deh hezaran bavik, êl (eşîr), cemaat, qewm, mîrateya arkeolojîk, şêwazê jiyanên cûda, qasî yê nû pir çandên qadîm wek encama vê hişmendiya yekser bûne qurbanên polîtîkaya qirkirina çandî. Lewma netew-dewleta yek reng û yek tîp, çandê (bêçandbûnê) û jiyanê hema bêje zivirandiye çolê.

Netew dewlet, tevahî cûdabûnên xwezaya civakî ya bi hişmendiya nerm ve dagirtî û bi kapasîteya azadiyê ya bilind bi xebata endezyariya civakî veguhertinê re di nav sînorên netew-dewlet de ketiye nava hewldana civakeke homojen afirandinê, ya di nava sînorên van 200 salên dawî de di

pir cihên cîhanê de pêvajoyek hatiye çavdêrî kirin e. Netew-dewlet tevahî cûdahiyên di nava civakê de dema ku homojen dike, wê bibin çi û wê çi bikin bi temamî ew biryar dide. Civakê bi her tiştê xwe xistina bin hûkmê misoger ya dewletê ve xweserî bi temamî tê sifir kirin. ji ber vêwek şertê sereke demokratîkbûna di bingeha pekhateyan de meşandina siyasetê bê derfet dibe ji ber netew-dewlet vê ji bo yekparebûna xwe wekî gef dibîne. Wek amûrên siyaset meşandinê siyasî û rêxistinên civakî ya sîvîl re bi şerta polîtîkayên dewletê re hevbeş meşandin tê sepandin. Wek rêgeza jêneveger ya demokrasiyê piranîparêzî (çoğulculuk) pêşketinên cûda yên siyasî, civakî, çandî û rêxistinbûnên aborî ji ber vê sedemê wek gef dibînin û pêşketinê wan asteng dikin.

Netew-dewlet wekî jor de jî me xwest bidin diyar kirin li ser pêvajoyên pere, sermaye, bazar di çarçeveya pergala aborî ku nexşandiye û teşe daye xwe ava kiriye. Forma netew-dewlet ya sermayedariya yekdest di roja me de bi qeyranên cîdî re rû bi rû maye. Di bingeha qeyranê de wek qadên siyasî, aborî, çandî, civakî û kesayet hem di hûndirê xwe de hem jî têkiliyên xwe yên bi hevdû re pirsgirêkan re di heman wextê de rû bi rû mane. Pergalên wek siyaset û aborî, qadên civakî-çandî ku ji civak, çand û kesayetan ava dibe ji hevdû cûdabûn û her ku diçe bi cihêbûnê re di veguhertina civakan de bûye çavkaniya hem şoreşên mezin hem jî bûhranên mezin. Li gor asta pêşketinên civakan ev pêşketinên ku diguherin êdî di aliyê pergalê de jî tê qebûl kirin. Bi reçeteyên demokratîk lîberal re ev pirsgirêkên heyî çareser kirin û di navbera pergala de cardin koordînasyek bixwazibin ava bikin jî ji çareseriyên bingehîn ava kirinê dûr in.

Pergala aborî her çiqas di çarçeveya netew-dewlet de xwe ava kiribe jî pergala sermayedar ya cîhanê û kûrewîbûna ku her diçe pergala aboriyên netewî jî digre hûndirê xwe, di cîhanê de pergala aboriya kûrewî ya cîhanê derxistiye holê. Ji têkiliyên bazara kûrewî û netewî re wekî pêvek (ek olarak) têkiliyên pergala siyasî û pergala aborî têkiliyên pergala aborî bi pergalên din re guhertinên cîdî û wekî encamê vê jî ketina rewşa ku qeyran jiyan bikin. Dîsa di demên dawî de di avaniya yekgirtî (ûnîter) de netew-dewletên ku asê mane an jî di asteke de xwecihî bûyînê re girîngî dane têkiliyê wan bi pergala aboriya kûrewî re pir tevlîhev bûye û dest bi

pêxirtengî jiyankirinê bûne. Ev rewşa qeyran û pêxirtengiyê derbas kirin avaniya netew-dewletan di rêjeyek girîng de dimehîne (aşındırmak). Civaka ku binesaziyek e an jî pergalek e, êdî ji pozîsyona ji rêzêbûyînê derdikeve. Di bin rêxistinbûnên wek partî, rêxistinên girseyên demokratîk û saziyên civaka sîvîl bi şêwazeke lez xweser dibin, ji têgeha fermî cihêbûnê re xwe rêxistin dikin.

Pêxirtengiyeke din a girîng ya netew-dewletê ew e, pergalên ku avaniya navendperest a yekgirtî (ûnîter) dike yek, bi jihevketin û paşê jî jihev belavbûnê re ne-navendîbûnê an jî şaredariyên xwecihî û avaniyên siyasal yên din her diçe zêdetira erkên netew-dewletê digrin ser xwe. Bi vê re paralel netew-dewlet mecbûriyeta ku hin erkê xwe dewrî wek banka cîhanê, NY û IMF avaniyên jorî xwe kirin ji bo xwe bûye yek ji sedemên pêxirtengiyê.

Dewlet di heman demê de yekdestdariya desthilatdariyê ku tundiya fîzîkî û siyasî ya ku di çarçeveya mecbûriyetê de sînordar û rewa dibe ye. Ji ber sedemên me di jor de rêz kirin –kî di destpêkê de bêîstîqrarbûna siyasî tê-tewazûna dewletê ya zagonsaz, rêvebirin û dad bi lez wenda dibe. Di pir welatan de dozên ku di encama binpêkirina mafê mirovan de hatine vekirin êdî ne dada welatan, birina dadgehen navnetewî (dadgeha mafê mirovan ya Ewrupa) wek asteke nû ya kûrewîbûnê tê nirxandin. Pergalên siyasî, aborî û civakî ku cewaz bûne, cûr bi cûrbûne û tevlîhev bûne êdî wek berê yeknesak kirin, kirina bin hakîmiyeta hêza navendî ne pêkane. Di vê de israr pêxirtengî û kaosa ku derketiye holê kûr kirinê zêdetir we ne bi sûd be. Pêşketina netew-dewlet pêvajoya aqilparêzbûyîn, zagonîbûyîn û bûroqratîkbûyîn bû. Bi hişkbûnê re mekanîkbûna bûroqratîzmê, dînamîzma civaka sîvîl ku ji siyasetê dikare xweser be tine dike û pêşiya girseyîbûnê digre. Lê pêşketinên teknolojîk, demokratîkbûna zanist, veguherîna cîhanê mîna gundekî avaniyên navendî belavbûnê re rû bi rû dihêle. Li hember vê jî hîn zêde dînamîkbûna civakê û bi îradebûnâ wê re rê vekiri ye. Yekdestdariya netewî di pir aliyan de ji yekdestdariya kûrewî re lihevkirinê de zehmetî bikşîne jî, pêwîstiyên polîtîkayên kûrewî bi lez pêkanînê dûr dîmîne. Di bingeha reçeteyên lîberal avakirina ku jinûve hatiye pêşdîtin, ne ji bo netew-dewletan ji çav derxistin û tesfiye kirin ji daxwazên fînans kapîtal a

hegemonyaya kûrewî ya nû re tabî bike ye. Ev jî netew-dewlet û qeyranên bi wê pergalê ve sipartî sivik kirin aliyekî jî girantir kirinê pêşdetir wê encam nede.

Ji ber sedema avaniya bi qeyran ya şaristaniya sermayedar mecbûriyeta netew-dewlet ku bi pergala şaristaniya demokratîk re lihev bike derketiye holê. Ji ber dewlet wekî ku êdî bi tena serê xwe nikare pirsgirêkan çareser bike nikare birêve jî bibe. Xûlase qeyrana binyadî ku di hinavên pergala sermayedar de derketiye holê, bi qeyrana netew-dewlet re bûye yek. Bi vê re pêşketinên zanistî ku tên jiyan kirin, demokratîkbûna agahiyan, guhertin û veguhertina civakî lez kirin û lêgerînên azadiyê ya civakan bi şêwazê kevn rêvebirina wan bi pirsgirêk dike. Lewma dewlet mecbûr mane ku, bi hêzên demokratîk re hevbeş birêvebibin an jî erka rêvebirinê parve bikin. Di vê çerçeveyê de lihev kirinê wan pêkane. Şêwazê dewletê çi dibe bila bibe ger dewlet di bingeha rêgezên demokratîk de bi avaniyan re hevkariyê bigere û bixwaze têkiliyê saz bike di bingeha vekirîbûna demokrasiyê de, bi şêwazê dewlet+demokrasî derfeta jiyana hevbeş pêkane.

Demokrasî di wateya berfireh de civatên ku dewlet û desthilatdariyê nas nekirine bixwe xwe birêve birin e. Di wateya teng de jî civakên ku dewlet û desthilatdarî bi şêwazeke tîr tê jiyan kirin rêvebiriyên xweser ku derveyî dewlet û desthilatdariyê ma ne, wek hêzên demokrasî bi nav kirin pêkan e. Civak bi demokrasiyê re ji dîrokê heta niha li hember hêzên şaristaniyê û hêzên modernîteya sermayedar yên roja me ya îro derfetên xwe wekî hêzên modernîteya demokratîk înşa kirinê dîtine. Qasî hilweşandina dewletê re bûyîna dewlet armanc nekirine, di hûndirê dewleta heyî de bêyî ku bihele û bibe dirêjahiya wê ya sîvîl xwe di tevahî qadên civakî de ava kirin û bi çalak kirinê armanc dike. Êdî civakan bi mentiqê dewletên klasîk rêvebirin nê pêkane, qad û înîsîyatîfa civaka sîvîl ji ber vê sedemê dikeve dewrê. Lê di rewşa heyî de lawaz, belave û nebes bûyîna wan valatiya rêvebiriya heyî dagirtin û parvekirina rêvebirî zehmet xûya dike. Lihevkirina avaniyên civakê yê demokratîk ku xwe hîn radîkal bi rêxistin kirine û saziyên dewletê yên ku xwe bi berhem kirinê di zirûfên heyî de wek tekane rêya derketinê xûya dike.

Ji lingên modernîteya kapîtalist ya esasî netew-dewlet wekî ku ji hin aliyan de em dest digrin, lingên bingehîn ya modernîteya demokratîk dest girtinê re em ê bikevin nava feraseta dîplomasiya nû. Birêz Ocalan têgeha şaristaniya demokratîk, şaristaniya navendî ya ku bi bajêr, çîn û dewletê re karakterîze bûye di hûndir de li hember çîna koledar, li devre li hember nasnameyên qabîle, qewm zext, talan û kolekirinê re hertim di halê berxwedanê de ne, dîsa hêzên azadîxwaz û kedkarên hûndirê bajêr û di çolteran de cîhana ku hêzên komûnal ava kiriye ji bo pênase bike bikar tîne. Di berfirehiya vê pênaseyê de yekparebûna xwe ya giştî ya ku heye û hertim ji hevdû re mîras dihêlin pir hejmar de avanî û çêbûnên wekhevîxwaz, azad û demokratîk wek hêzên modernîteya demokratîk dest digre.

Li gorî vê pênaseyê wisa tê nirxandin; hebûn û çêbûna xwezaya civakî û pêşketina wê di bingeha civaka exlaqî û polîtîk de derketiye holê. Di dîrokê de li hember hêzên şaristaniya navendî ye binketine an jî bi demê re rûxmê ku teşbihî wan bûne tevahî avaniyên wekhevîxwaz, azad û demokratîk, têkoşîna wan, ceribandin û daneheva wan, mîrasa ku hiştine tevahî dikevin nava têgeha şaristaniya demokratîk. Şaristaniya demokratîk dema ku ji roja me ya îro ya şênber re em lihevbînin (uyarlama); bi şêwaza ku dijbertiya modernîteya sermeyadar bihewîne pêvajoya 400 salên dawî wek modernîteya demokratîk em pênase dikin. Modernîteya demokratîk di vê çerçeveyê de di pozîsyona antîteza modernîteya sermayedar e. Di nava daneheva herî girîng ya vê pêvajoyê, demokrasiya bajêr ya Îtalya, konfederasyona Alman, raperîna gundiyan, komûna Parîs, caribandinên sosyalîzma pêkhatî, pêvajoyên rizgariya netewî ya di cîhanê de, partiyên demokratîk, SCS, tevgerên femînîst û hawirdorparêz, tevgerên cîwanan yên demokratîk, festîvalên hûnerê, tevger û cemaatên olî ku desthilatdariyê nake hedef hwd. daneheva pir çêbûna di hûndirê wê de cîh digre. Modernîteya demokratîk ji sê lingên modernîteya sermayedar sermayedarî, netew-dewlet û pîşesazîtî re wek alternatîf bi aboriya komûnal, netewa demokratîk û eko-pîşesazî bersiv dide.

Netewa demokratîk hêza çareseriya modernîteya demokratîk ya sereke ye. Netewa demokratîk qasî ji her çanda gel û çanda ol maf û azadiyên

bingehîn ferdên ku wekhev belav dike ava dibe, bi vî awayî mafên kollektîf û takekes netewbûna bêyî ku ji hevdû cûda bibin esas digre. Di nava feraseta nasnameya serê wê vekirî û netew de, taybetmendiya netewbûna ku yekparebûn were çêkirin, ne bi zora desthilatdariyê; di bingeha demokratîk û bi dilê xwe înşa kirin an jî bi veguhertinê pêk anîne. Dîsa rêxistinên saziyên civakî, cemaat, mezhep û beşên gel jî wek yekeyên (yekeyên) kollektîf çavkaniya dewlemendî dihesibîne.

Piştî şerê parvekirinê ya 1. Rojhilata Navîn û pir cihên cîhanê di arasteya berjewendiyên hêzên modernîteya sermayedar de hatiye vesaz kirin. Di bingeha endazyariya civakê de li gorî polîtîkaya *dabeş bike-perçe bike-rêve bibe* teşe hatiye dayîn. Li ser xwezaya civaka dîrokî ev operasyona ku hatiye pêk anîn dewlemendiya ku pir cûdabûnan di hûndirê xwe de hildigre girtine bin êrîşê; avaniya demokratîk ku pirrengiya etnîk, olî, cûr bi cûrbûna çandî di hûndirê xwe de dihewîne bi êrîşên netew-dewlet ya bi armanca înkar, îmha û bişavtinê, bi perçekirinê re rewşeke derveyî herikîna xwezayî derxistiye holê. Di nav her avaniyên hatine perçe kirin perçebûnên nû û di navbera van perçayan de jî nakokiyên ku pevçûnan derbixe holê afirandinê re hêzên modernîteya sermayedar zirûfên armancên xwe di herêmê de bi avakirinê afirandine.

Pirsgirêkên civakî di aliyê hişmendî de neyê çareser kirin wek avanî jî çareser nabin. Netewa demokratîk hişmendiya tevahî avaniya jinûve di bingeha wekhevî, azadî û demokratîk di nava cûdabûnan da yekbûn û yekparebûn çêkirinê temsîl dike. Civaka mirovahiya gerdûnî ku ji hezaran salan vir de cûdabûna xwe parastinê re di nava yekîtiya çand de li gel hevdû jiyan dike ev rewşa ku kirine weke çarenûs jê derxistinê re, jinûve yekpare kirin û di nava azadiyê de jiyan kirin hişmendiya nazariya netewa demokratîk ku esas digre ye. ‘Netew-dewlet ku wek memûrê pêkanîna modernîteya sermayedarin bi qasî înkara berê serbixin û şûna wê saziyên sîxûr yê pergalê û hişmendiya oryantalîst serdest bikin xwe li hember efendiyê xwe yê nû derketî hesibandine. Di milê çanda Rojhilata Navîn de ev 100 salên dawî perçebûnên netew-dewlet, pêkanînên ku jê re dibêjin polîtîkaya hûndir û derve di wateya giştî de bûye tevgera qirkirinê. Ji hişmendî em bigrin heta cîhanên aborî ya ku dane jiyandin perçekirina

yekparebûna rastiyê û di aliyê hêmanên modernîteya kapîtalîst anîna rewşa xwarin û daqurtandinê ye.’(Abdullah Ocalan)

Îcar netewa demokratîk cîhana hişmendiya, wekî ku Birêz Ocalan jî diyar kiriye ku avaniyên çandî ku hatine perçe kirin û xira kirin jinûve yekpare kirinê temsîl dike. Netewa demokratîk di heman mekanê de netewên cûda ji hev cûdabûna wan ya etnîkî, olî û çandî bi rengê civatên netewî di asta hîn jor de sazkirinê armanc dike. Netewa demokratîk; bi feraseta nasnameya servekirî û netewa vezen (esnek) tevahî avaniyên etnîk, netewî, çandî, olî û mezhebî di bingeha rêgezên azadî, wekhevî û demokrasî ve girêdayî, piştevaniya hevdû kirin, bi giyana civakbûna dîrokî re guncaw di hûndirê armancên hevbeş çarçeveya bi hevdû re jiyan kirinê ye. Netewa demokratîk, dibe rehendeke modernîteya demokratîk an jî têoriya wê; xweseriya demokratîk jî avaniya ku ev hişmendî têde bibe beden e. Lewma xweseriya demokratîk beden, netewa demokratîk jî avaniya hişmendî ku rih dide beden e. Di vê rewşê de hişmendiya netewa demokratîk bi şêwazê herî baş xwe bi xweseriya demokratîk bike beden.

Kurd di herêmê de gelê ku herî zêde rastî xezeba modernîteya kapîtalîst hatiye ye. Ji ber ku ji hesabên berjewendiyên modernîteya sermayedar re guncaw nebûye, piştî Şerê Parvekirinê ya 1. nexşeya siyasî ya Rojhilata Navîn dema ku hate diyar kirin Gelê Kurd gelê ku jê re şans nehatiye nas kirine. Li ser Kurdan bi şêwazê herî giran polîtîkayên bişavtin û qirkirina fîzîkî ku hatiye meşandin negihaye armanca xwe ya tam, ne hebûna Kurdan bi temamî bi karine bidawî bikin ne jî tasfiyeya çandî karîbûn pêk bînin. Di pozîsyona *gelê ku di cîhanê de teşbîhe wê nîne* de ye.  Hem zihnî hem bedenî hatine perçe kirin. Ji bo Kurdan ji vê bêstatûbûnê rizgar kirinê de tekane rêya derketinê netewa demokratîk e. Wek hişmendî û avanî netewa demokratîk û xweseriya demokratîk netew-dewletên heyî hilweşandine bêyî ku esas bigre, dewlet+demokrasî re rêvebiriyê parve kirinê re bi gel û netewên din re jiyan kirinê esas digre. Helbet ji bo vê bi rejîmek bi makezagona demokratîk maf û vîna gihandina ewlehiya makezagon û zagona pêwîst dike. Bêyî ku destê xwe li sînoran bide heta sînora kirina hinceta yekîtiya netewa demokratîk ya Rojhilata Navîn, ji bo modela Kurdistana konfederal ya demokratîk jî pir çandên cûda, komên gel xwe bi rengê yekîneyên federe dikarin rêxistin bikin. Di heman

herêmê de heman bajarî de her cûre civatên xwedî cûdabûnên etnîk, olî û çandî di nava aştiyê de digihîjin zirûfên bi hevdû re jiyan kirinê. Kurdistana konfederal ya demokratîk modela netewa demokratîk her ku pêş bixe her parçeya ku bi gelên cîran û civakan re jiyan dike wê yekîneyên dişibe vê ava bike. Bi vî awayî wê dendika yekîtiya netewa demokratîk ya Rojhilata Navîn ava bibe.

## RASTIYA TÊKILIYA DI NAVBERA CIVATÊN SERETAYÎ DE

Dîplomasiya netewa demokratîk bi giştî têkilî û çawaniya têkiliya Kurdan bi gel û civakên din, welatên derdor dîsa Kurdên di perçeyên din dike mijar. Lê dîplomasiya netewa demokratîk beriya ku em bi rehendên wê yên din dest bigrin destpêkê di navbera civatên destpêkê de taybetmendiya têkiliyên ku ava bûn û pêşketin hin tespîtan parvekirin wê di cîh de be. A rast bi navê îro jê re nebêjin dîplomasî jî pêvajoya ku têkilî yekemîn car pêşketin pêvajoya civaka xwezayî ye. Lewma civaka xwezayî çawa ku ji pir pêşketinan re çavkanî kiribe ji têkiliyên bi vî rengî re jî çavkanî kiriye. Têkiliyên dîplomatîk destpêkê tam li kîderê pêş ket û kengî destpê kir misoger zanîna me wekî ku ne gengaz e çawanî û armanca wê ji têkiliyên dîplomatîk ya dewletan di roja me ya îro de misoger cûdatir e. Têkiliya komekî bi komekî din re ji pêdiviyên civakî ya her du aliyan ava bûye û pêş ketiye, ji daneyên zanistî ku hatiye derxistin em fêm dikin. Temasa klanekî bi klanekî din re têkiliya dîplomatîk ku ava bûye, piştre bi kabileyeke re, kabileyek bi kabileyeke din re, xûlase ihtîmaleke bilind bi şêwazê têkiliya civateke bi civateke din re pêşketiye.

Civaka xwezayî, forma civakbûna ku dema di navbera cûreya mirov ji prîmatan qutbûn heta derketina civaka hiyerarşîk e. Di van deman de, li gorî taybetmendiya amûrê kevir ku bikar dianîn wek neolîtîk, mezolîtîk û paleolîtîk tê binav kirin. Di vê merhaleya mirovahiyê de civatên klan ku bi hêza jin-dayikê ve sipartî xwe rêxistin dikin, bi giranî di bingeha nêçîrvanî û berhevkirina li ser tiştên amade dibînin xwe xwedî dikin. Di vê demê ji bo mirovahiyê nikarin behsa pirsgirêkên civakî bikin. Civaka klan bi şêwaza xweza û derdorê re di nava aştiyê de, xweza wek xwe zindî û wek dayik dîtinê re bê îmtîyaz, bê çîn, bê hiyerarşî, mêtingerî nas nekirin û bê zext bi milyonan salan jiyan kiriye. Di vê rastiya civakî ya seretayî de

têkiliyek li ser bingehê hakîmiyetê ne mijara gotinê ye. Di hûndire xwe de yekitî û piştgirî, bi xwezayê re lihevkirin û yekparebûn esas e. Her tiştê ku dibînin wek xwe zindî digrin dest û pîrozbûn lê bar dikin. Civaka vê demê di bingeheke pir ji rêzê jî be wek civakek demokratîk bi tevna exlaqî û polîtîk pênase kirin gengaz e. Bi saya exlaq û polîtîka li ser lingan dimînin û xwe didin jiyan kirin. Ev civatên ku hejmara wan di navbera 25-30 kesan de ne û herdem ji ger û koçeriyê re mecbûr dimînin dema ku tiştеke ku dikarin xwe xwedî bikin disekinin û pêdiviyên xwe pêşwazî dikin, carnan jî bi rojan di pey nêçîrê de dibezin. Nêçîr qasî ku tê zanîn ne kareke hêsane. Piştî xebata dirêj û westandin dibe ku binketî jî bin, dibe ku nêçîreke ku bi serkeftî jî girtibin hebe. Nêçîrvanî, pê mijûlbûneke dabeşkirina kar e û kareke cidî, hevkarî û piştevanî pêwîst dike. Li gor encamê ji lekolînan hatiye derxistin di nêçîr kirina ajalên mezin de ji ber hêza klanekî têrê nake çend klanên cîran hatine gel hevdû nêçîr kirine. Lêkolînên ku hatine kirin, klanên ku hevbeş nêçîrvanî kirinê re biryar dane, destpêkê noqteya ku nêçîr were kirin bi tespît kirinê ji me re nîşan dide. Ev noqte bi giranî keviyên kendalên kûr in. Piştre jî ajalên ku nêçîr bikin hatine gerandin, dema ku hatine dîtin jî wan ajala noqte ku berê tespît kiribûn beralî kirine, piştî ku vê serxistin jî xeleka dorpêçê teng kirinê re ajalan ber bi kendalê re beralî kirine û nêçîr kirine ev bi lekolînan hatiye tespît kirin. Hatiye bal kişandin ku piştî ajal hatiye nêçîr kirin vê carê jî karekî zor û zehmet wek bi perçe kirinê re gihandina cihên jîngehê re rû bi rû dimînin. Di vê pêvajoyê de jî dabeşiya kar û piştevanî pêwîst dike lewma heta ku ev merhale bidawî bibe klanên ku hatin gel hevdû mecbûr ma ne ku bi hevdû re tevbigerin. Were bal kişandin ev xebat, du diyardeyên dijberî hevdû derdixe holê. Ya yekemîn klanek bi klanê din re ji ber sedema pêdivî ketina nava piştevaniyê hevbeş tevgerandin, ya duyemîn jî zilamê ku hertim nêçîr bike bi demê re taktîk, fêlbazî hwd. ku di pêşketina çanda leşkerî de rol dileyizin di zilam de ava dibe. Em dizanin ku zilamên klanekî, li hember xeteriya ku klanekî di nava dike ji bo belav bike dem bi dem van taybetmendiyên xwe bikaranîne.

Dema civaka neolîtîk ku teqrîben piştî beriya 20 hezar salan destpêkir, civakbûnek ji ya civaka klan pêşketîtir îfade dike. Pêvajoya di pêşengiya jin de derbasî jiyana xwecihî bûyîn. Ev merhale wek şoreşa gund û çandinî jî tê bi nav kirin. Di dîroka xwezaya civakî de serdemeke mûhteşem

destpê kiriye. Ji çêbûna gundan heta çandinî û xwedîkirina ajalan, ji pêşketina zanaat heta rêxistinbûna qebîle û eşîran pir pêşketin di vê merhaleya dîrokî de çêbûye. Cewherê civakan dîsa bi taybetmendiya exlaq û polîtîqaya ku jin serekeye. Bi pêşengiya dayik çandiniya ku tê pêşxistin jiyan êdî xwecihî dibe. Mirovên dema neolîtîk jî wek mirovên klan xwezayê zindî dibînin, bi xwezayê re yekpare û lihevkirî di nava têkiliyeke pir kûr jiyana xwe didomînin. Çandina axê ji du têgeha re pêşengî dike. Yek ji van heskirina welat an jî welatparêzî ye, ya duyemîn jî rihê piştevaniya bi civakên cîran re an jî enternasyonalîzm e. Întacên bi berhem dayîna axên ku tên çandin, axê pîroz dîtin û hestên girêdanê pêş xistiye. Yanî rewşa comerdiya ax û xwezayê ku ji civakê re nîşan daye, girêdan û têkiliya axê hîn bi zane kiriye. Di vê çerçeveyê de civaka qebîle li ser parçeya ax ku jê re jiyan dide ji xwe re kirine welat. Hesta empatî bi zanabûnê re bûye yek, piştevaniya di hûndirê qebîleya xwe de, heskirina welat û têkiliya azadîxwaz çiqas bi qatê û pêwîst dibîne têkilî û piştevaniya bi qebîleyên din re ewqas pêwîst dîtiye û xwestiye wate bidiyê. Têkiliya bi civakên qebîleyên cîran re di vê çarçevê de kûr bûye. Di van pêşketinan de pêşeng jin e.

Ji klan derbasî qebîle bûyînê de pêşengiya jin esase. Bi yekbûna çend klanan ava kirina qebile de zewacên derve kirina jin risteke girîng leyistiye. Pozîsyona jin ya pêşengî têkiliya navbera civatan, di bingeha piştevanî û sûdgirtina her du aliyan hiştiye ku hîn kûr û bi çawanî be. Li gel pêşketina ku jin rê vekir pêşketina di navbera her du aliyên cîran de, risteke serkeftî ku di çareseriya pirsgirêkan de dileyizin di aliyê pir lêkolînvanan wek dîplomatên seretayî û wek cînsa ku rista dîplomatîk ya seretayî leyistiye tê nirxandin.

Di Kurdistana roja me ya îro de hîn jî di pir cîhan de di navbera koman de pevçûnên ku derdikevin jin şerpa (laçika) xwe derdixe û davêje ardê ev dihêle ku zilam dev ji pevçûnê berdin û vegerin mala xwe. Ev mînak bixwe jî di dîrokê de rista jin di çareseriya pirsgirêkan de û rihê piştevaniya di navbera civatan de pêşxistin e radixe ber çavan. Bi vê re di pêvajoya civaka xwezayî de pirsgirêkên ku derketine heyet hatine beranber hevdû û pirsgirêkan ji feyda her du aliyan re birina çareseriyê esas girtine. Di roja me ya îro de jî heman rêbaz di navbera civatan de ku tê pêk anîn

xwedî mînakên pir zêde ye. Em çend mînakan bidin; komên ku bi xwedî kirina ajalan xwe diberidînin bi biharê re ji bo ajalên xwe biçêrînin mecbûrin derbikevin zozanan. Piraniya komên ku derdikevin zozana ji ber mecbûrin ajalên xwe li ser axên hin komên din biçêrînin pirsgirêk jixwe derdikevin. Ji bo çareseriya vê û pirsgirêkên bi vî rengî her alî heyetê îxtiyara ava dikin. Li gel vê komek sêyemîn ku ji îxtiyarên hûrmeta her du aliyan jî girtine rista hakem digrin ser xwe. Di bin hakemiya wan de di feyda her du aliyan de rêyên lihev kirinê tên gerandin. Bi giştî pirsgirêk bi lihevkirin tê çareser kirin. Yên ku rista hakemî girtine ser xwe rêgezên exlaq û wicdan esas girtinê re bêyî ku her du alî zirar bibîne gihandina çareseriya dostane heta di navbera koman de pêşketina têkiliyên mayînde re jî îtîna nîşan didin. Dem bi dem pirsgirêkên ku nikarin çareser bikin dema ku bi pevçûn bi encam dibe dîsa bi heman rêbazî çareseriyên ji feyda her du aliyan tê gerandin.

Xisûseke din jî di gundan de çandinî, rakirin û dîsa di pêşwazî kirina pêdiviyên ajalan yê zivistanê de ji ber civat bi serê xwe têrê nakin ji civatên din piştevanî pêwîst dike. Di tevahiya van rewşan de ku niha hîn jî tê bikaranîn, rêbaza ku jê re dibêjin zibare ku ji civaka xwezayi maye tê esas girtin. Li gorî vê rêbazê piraniya gundên cîran ji bo temîna pêdiviyên hevbeş û hevpar dixin rêzekî diyar û li gorî vê rêzê tevahî gundiyên gundên cîran tên ba hev. Pêdiviya her gundekî di nav rihê piştevanî û alikariyê hewl didin ku pêşwazî bikin. Ev çalakî di roja me de jî wek faaliyetek asayî berdewam dike. Xebat di nava coş û hewaya cejnê de destpê dike û bi encam dibe. Mînakên ji pêvajoya civaka xwezayî heta roja me ya îro berdewam kirin e, zêde kirin gengaz e.

Civaka neolîtîkê ku hîn merhaleya berhemên zêde pêş neketibû li gorî pêdiviyên civatan çandina întacan esas girtibûn. Rûxmê vê beşek ji întacê bi civatên cîran re parve kirin hatiye jiyan kirin. Ev rewş di navbera civatan de di bingeha alîkarî û piştevaniyê de ji têkiliya diyarî û pevguhertinê re rê vekiriye. Hin lekolînvan ev pevguhertinên ku çêbûnê, di navbera civatan de bi şêwazê jidestdayînê zêdetir, tiştê ku were guhertin an jî diyarî were dayîn cihekî guncaw ku aliyê din texmîn bike û bibîne hatiye hiştin, piştre civata cîran bi wê girtinê re cihê wê tişteke din

danîne, bi vî şêwazî têkiliya diyarî û pevguhertin hatiye meşandin dide diyar kirin.

Di tevahiya pêşketinan de pareke diyarker ya hişmendiya jin û pêşengiya wê heye. Li hember pêşketina pîrozbûna jin û çanda wê beşeke girîng ya zilaman wek xwezayî dûrî vê pergalê dimînin. Bi taybet zilam û pîrên ku jin-dayik wana bi feyde nabîne, êdî derveyî pergalê tê hiştin. Li hember zilamên ku jin li gel xwe digre, ji aliyê zilam û pîrên ku derveyî pergalê dimînin destpêkê bertek di hûndirê xwe de kom dikin, piştre ev bertek dizivire nakokî û bi demê re kûrbûyîna nakokî pêvajoya ku piştre pêşbikeve ji kokê de wê bandor bike û biguhere. Pîrên ku derve tên hiştin di vê bingehê de ber bi bîrdoziyek zilamsalar ve meyla xwe nîşan didin. Şamanîzm wek întaca vê zirûfê derdikeve holê. Şaman, yanî rahîbên zilam li beranber jin pir bi pergalî tevgerandineke dijberdest bi avakirina pergala malê dikin. Bi çanda nêçîrvaniyê, zilamê ku çanda şer pêşxistiye rahîb wan jî dikşînin aliyê xwe, li beranber jin û pergala ku saz kiriye îtifaqeke nû ava dikin. Ev îtîfaqa ku bi zilamên şervan û zilamên pîr û bi tecrûbe li beranber jin pêş xistine di girîngiyek dîrokî de ye. Bi demê re li ser xortên ciwan heta li ser zarokan bi yaftayên (etîketên) bîrdozîk ku ava kirine di nava civakê de bandora xwe bi hêz dikin. Esas li beranber pergala çanda jin ev îtîfaqa ku hatiye pêş xistin pengaveke polîtîk dij-civakî ye. Hem nêçîrvanî hem li hember derve civakê parastin, di çawaniya leşkerî de xwe dispêre kuştin û birîndar kirinê. Destpêka çanda şer e. Parastin dema ku dibe mijara gotinê, bi otorîte û hiyerarşî re girêdan pêwîst dike. Kesê berpirsiyar tê wateya kesê ku gotin û otorîteya wî ya herî bilind e. Li hember çanda jin destpêka raseriya hişmendî û çandeke cûda mijara gotinê ye.

Beriya civakên bi çîn pêşketina vê otorîte û hiyerarşiyê wek xaleke vegere ya dîrokê tê qebûl kirin. Di pêşengiya zilame pîr de li hember jin îtîfaqa ku hatiye pêşxistin, îtîfaqeke polîtîke  û şêwaza kişandina ciwan û zilamên din ji vê îtîfaqê nêzikî şêwaza dîplomasiya îro pêk hatiye. Di destpêkê de hiyerarşiya ku ferdî û bi sûd ya bi otorîteya pîroz ya şer re kirina yek û ber bi sazîbûnekî jorî civakê re çûyîn, bi hevdû re wekî ku çînayetiyê tûj bike, bi demê re wê bizivire otorîteya dewlet. Întaca nirxên zêde ku ji hinavên dewlemend ya neolîtîkê derdikeve û bi demê re îtîfaqeke sealî ya

bi pergal derxistina holê (rahîp+leşker+rêvebir) yekdestdariya vê îtîfaqê di vir de rista bingehîn dileyize. Ya ku tê jiyan kirin tam dijşoreşek e. Ji meyla têkiliyê bi feyde ya bi armanca piştevaniyê derketin û destpêka herikîna milê berovajî de ye. Pêvajoya bi xwezayê re vajî (ters) ketin û berê xwe dayîna rûxandinê ye. Guhertinên bingehîn ya çandî û hişmendî wê pêvajoya hakîmiyeta hişmendiya baviksalarî bide destpê kirin. Pêvajoya bi xwezayê re vajî ketin û berêxwedayîna rûxandinê ye. Guhertina hişmendî û çandê ya ji kokê de wê pêvajoya hakîmiyeta hişmendiya baviksalarî bide destpê kirin. Ev jî bi giştî avaniya civakê dîsa çawaniya têkiliya di navbera civakê de wê ji kokê ve biguherîne. Bi îfadeyeke din hûnandina civakê ya exlaqî û polîtîk bi serûbin kirinê re, civak ji civakbûnê wê were derxistin. Êdî sêgoşeya çîn, bajar û dewlet bandora wekî zîncîrê nîşan bide û bi şêwazê guhertinê re wê bikevê pêvajoyêke nû ya berbelav. Di navbera civatan de pergala têkiliyan a li ser bingehê aşitî û piştevaniyê ve sipartî têkiliya xwezayî xirakirinê re têkiliya berjewendî û mijokdarî şûna wê girtiye. Ev pêvajoya ku bi mijokdariya mirovan li ser mirovan destpê kiriye, piştre jî têkiliya hakîmiyet û mêtingeriya li ser xweza û jin şûna hevbeş tevgerandin, piştevanî û parvekirinê mekanîzmayên ku hêzên îdeolojî, leşkerî û siyasî rista xwe dileyize wê bizivire têkiliyên berjewendiyan. Avaniya konfederal ya civaka neolîtîk ku xwe li ser cûdabûnên civakê dispêre wekheviye, civaka exlaqî û polîtîk bi felç kirinê re, kiriye ku xebitîna wê raweste. Li ser vê yekê şaristaniya nû ya yekdest ku mêtingeriya xwe wê pêşbixe li beranber tepisandina civakê, civaka xwezayî jî ketiye nava berxwedaneke ku heta roja me ya îro hebûna xwe berdewam bike.

Şaristaniya yekdest di 400 salên dawî de bi formatekî nû bi modernîteya kapîtalîst û modela dewleta netew-dewlet li ser xwezaya yekemîn û duyemîn bû pergala mêtinger ya herî zêde. Bi kongreya Viyana ya sala 1815 di qada navnetewî de tekane hêmanê serdest netew-dewlet û têkiliyê navnetewî de pergala têkiliya nirxandinê re di sazîbûna dîplomasiyê de ji pêvajoyeke nû re rê vekiriye. Bi hevpeymana Viyana ya sala 1961 de vê pêvajoyê temam kiriye. Êdî dîplomasî bi tam wateya xwe zivirandin amûrekî ji bo berjewendî û kar beriya şerên ku werin meşandin.

Ji nirxandinên di jor de jî wekî ku were fêm kirin di dîrokê de di navbera civatan de pergala têkiliya sîmbiyotîk ya ku feyda xwe ji her du aliyan re jî heye ber bi xirabûnê ve çûye. Bi pêşketina şaristaniyê re çawaniya têkiliyê xirakirinê re veguhertine têkiliya kara herî zêde û desthilatdariyê. Rastiya netewa demokratîk di navbera civakan de rih û şêwazê têkiliyên ku risteke girîng leyistine dîplomasiyeke ku jinûve were înşa kirin qasî ku hîn zêde aşitî, piştevanî, danûstandina bi afrînerî, wê bibe dîplomasiyek bi tevahî pirsgirêkên ku derdikeve mijûl dibe. dîplomasiya netewa demokratîk, wê bibe amûreke girîng ya ne ya şer, ya aştiyê, ne ya dijminahiyê, wê bibe ya dostaniyê, ne ya cihêkariyê ya biratiya, ne ya berjewendiyê ya pêşxistina danûstandinên bi feyde be.

## DI DÎROKA KURDISTANÊ DE DÎROKA KURT YA DÎPLOMASÎ

Navenda erdnîgariya ku şoreşa neolîtîk pêşket û stewiya axên Kurdistanê ye. Lewma erdnîgariya Kurdistan bi hezaran sal ji şoreşa neolîtîkê re dergûşî kiriye. Di vê wateyê de Kurdistan di formê klanan de bi milyonan salan berdewam kir û bi şoreşa neolîtîkê giha halê xwe ya herî pêşketî. Piştî klan avaniyên qebîle û eşîr derket, erdnîgariya bi çandinî û sewaldariyê cihê jiyana xwecihî derketiye holê ye. Bi vê re qada teşegirtina dewletên bajêr ya yekemîn, keyatî (kraltî), împaratorî qadên çeperê Kurdistanê ne. Kurd, hem di navbera eşîran de hem dewletên yekemîn ku li herêmê avabûne têkiliyên ku em jê re dikarin bêjin dîplomatîk hem jiyan kirine hem jî bûne gelê pêşeng yê şahid.

Ji ber bûye navenda ku neolîtîk lê hatiye jiyan kirin erdnîgariya Kurdistan ku xwedî dewlemendiyên mezine êdî di dîrokê de cara yekemîn bi derketina dewletan re bûye qadekî çavberdanê û herdem xwestine dagir bikin, vê taybetmendiya xwe heta roja me ya îro parastiye. Ji ber vê rista xwe ya dîrokî û girîngiya piralî ev erdnîgariya ku Kurdistan navenda têkilî û hevbendiyên dîplomatîk herdem xwedî ciheke taybet bûye û heta dawî taybetmendiyên pêşketî nîşan daye.

Bi pêşketina şaristaniya navendî re avaniyên qabîle û eşîr yên di herêmê de cihêbûneke cîdî jiyan kirine. Beşên qebîle û eşîran ya ku hiyerarşîk bûne ketine nava pêvajoya dewletbûnê. Qebîle û eşîren ku derveyî vê mane li hember vê pêşketinê di hûndir de xwe rêxistin kirinê re

piştevaniyê bi hêz kirine bi vî şêwazî hebûna xwe domandinê esas girtine. Di destpêka van beşan de jî Kurd tên. Kurd, herî zêde xwe birêxistinkirina şêwazê *konfederasyona êlan (eşîran)* di herêmê de bûne hêzeke bi bandor û girîng. Eşîr li hember erîşên hêzên şaristaniya navendî di bingeha têkiliyên pir tîr yên dîplomatîk de hatine ba hev. Li ba vê, ji belgeyên dîrokî yên ku derketine holê, tê fêm kirin ku dewletên ku li herêmê hatine saz kirin têkiliyên dîplomatîk çêkirine û pêşxistine. Mînak, peymana yekemîn ya di dîrokê de, wekî bi navê *Peymana Kadeş* a di navbera Mısır û Hîtîtan de hatiye çêkirin tê hesibandin, lê bi daneyên erdkolanê ango arkeolojîk hatiye piştrast kirin ku pir beriya wê, di navbera Hurî û Misiriyan de peyman hatiye çêkirin. Ji hev re name şandina Hurî û Misiriyan, zewaca prensesa Hurî Nefertîtî a bi firawûnê bi navê Akhenaton re (Amonhotep ê 4. re) asta têkiliya dîplomatîk nîşan dide. Bi vê re em dikarin bêjin ku Mîtanî, Gutî û Kasîdiyan jî bi şêwazeke dişibe ya vê têkiliya dîplomatîk, hem di nav xwe de hem jî bi dewletên herêmê re ketine nava têkilî û hevbendiyan (hevbendiyan).

Bi navê Kurdan di dîrokê de rûxmê tevahî pevçûnên hûndir û derve têkiliyê devre û dîplomasiya herî serkeftî Medya meşandiye. Dewleta herî hişk ya herêmê împaratoriya Asûr e. Medya, li hember împaratoriya Asûr, di serî de bi Babilî û Urartuyan re, herwiha bi gel û civakên din re bi bi çêkirina hevbendiyê re di sala B.Z. 612 de desthilatdariya Asûr bi dawî kirine. Binkeftina dewleta Asûr di wezneke mezin de encama hevbendî û têkiliyên serkeftî ya Medan de çêbûye.

Di dîrokê de yek ji neyêniyên herî mezin di encama xiyaneta prensê Kurd Harpagos de binketina Medan û di aliyê Persan de bi encambûna têkoşînê ye. Ev xiyaneta dîrokî di pêvajoyên piştre de jî kevneşopiya Kurd hertim di bin serweriya hin hêzên din de jiyana xwe domandinê derxistiye holê. Lewma meyla Kurdan ya di asta duyemîn de mayîn bi vê bûyerê re bûye wek kesayet. Rastiya têkiliya di sala 1071 û 1514 de encamê ku gihan jî di vê çawaniyê de çêbûye. Ev meyla ku bûye wek kesayet helwestên siyasî ya Kurdan piştre di wezneke girîng de bandor kiriye. Çîna jor ji bo hebûna xwe berdewam bike vê rêyê hildibijêre, ev rewş her diçe taybetmendiya nokeriya kûr wê ava bike û daîmî bûyîna vê helwestê de risteke esasî bileyize.

Bi vê re Kurd ji ber pir kêm tevlî dewletan bûne rûye dewletê dîplomasiya qirêj pir zêde nas nekirine. Xebatên dîplomatîk ku meşandine bi giştî diyardeya exlaq, heq, adalet esas girtine. Encama vê de têkiliyê xwe bi dewletan re piranî ketine kêmînê û xapandine, em şahid dibin. Di têkiliyên dewletê de nebûna zagonên sinc (exlaq), maf û dadmendî, berjewendiyê wan çawa pêwîst dike li gorî wê helwestê xwe guhertin, ev hiştiye ku Kurd her tim di van têkiliyan de wenda bikin û astek negrin.

Bandora mûdaxeleyên derve ji Rojhilata Navîn re lerizîner û hilweşîner e, ketina dika dîrokê ya sermayedarî û wekî şênber di 200 salên dawî de pêk hatiye. Wek forma dewleta moderníteya sermayedar netew-dewlet û netewperestî wek tovê fitne ketina Rojhilata Navîn re di navbera gelên herêmê û navbera civakan de ji nakokî û pevçûnan re rehendeke nû aniye, qasî ku di dîrokê de pêk nehatiye bûye sedema encamên hilweşîner û bi êş. Moderníteya sermayedar ji têkiliya di navbera gelan û navbera civakan çawa teyisiye û ji kîjan encamên neyênî re rê vekiriye piştî şerê cîhanê ya yekemîn statûkoya ku li ser înkara Kurdan hatiye ava kirin em pir zelal dikarin bibînin. Kurd, piştî şerê parvekirinê ya yekemîn aliyê dîrokî û yekîtiya civakî ya tamamker a erdnîgariya Kurdistan û Anatolyayê dîtinê re wekî berê bi Tirka re tevgeriya ne. Di kongreya Sewasê de, di bingeha erdnîgariya Kurdistan û Anatolya wek welatê hevbeş dîtinê re wek formûlasyona mîsak-î mîlî ku derbikeve holê lihev kirine. Mîsak-î mîlî wek sepandina aliyeke pêk nehatiye. Di bingeha welatê hevbeş û rêvebiriya hevbeş ya her du gelan esas digre hevpeyamaneke dîrokî ye. Lê pêşketinên piştre seyra dîrokê ji koke guhertiye. Brîtanya, li beranber Tirkiye ji rastiya mîsak-î mîlî devjêberde, di bingeha înkara Kurdan de ji serdestên Tirk re dema ku ji bo bibin netew-dewlet musade da ji mîsak-î mîlî devjêberdan, Başûrê Kurdistan û Rojava ji Fransa û Îngîlîstanê re hatiye terikandin.

Ji vê dîrokê şûnde çavkaniya tiştê ku Gelê Kurd û Tirk jiyan kirine û êşên kişandine ev diyarde heye. Serdestên Tirk netew-dewleta ku Kurdan înkar dike hilbijartine, tevahî polîtîkayên xwe ye hûndir û derve li ser Kurda tine hesibandin, înkar kirinê re helandine dane rûnişkandin. Kurd ji vê pêvajoyê re bê amade hatine girtin, li beranber polîtîkaya dewletê nikarîbûn tedbîr bigrin. Hişmendiya netew-dewletparêzî ji bo Kurdan û

civakên din xeteriyên çawa tîne neketine ferqa wê. Esas bi vê şêwazê şîrove kirin jî pêkane; Kurd rûxmê ku piştî şer zirûfên nû ku ava dibe di hin rehendan de ketibin ferqê jî di hûnera dîplomasiya ku pêwîst dike kirinê de- wek Ehmedê Xanî dibêje- ne serokatiyek bi hêz, ne jî di navbera xwe de yêkîtiyek bi hêz ava nekiribûn. Ji vê pêvajoyê re bê amade hatine girtin. Di vê pêvajoyê de ji ber di nêrînê de cihêwazî derketiye rûxmê ku ji konferansa Parîs'ê re hatine dawet kirin heyeteke ku îradeya hevbeş temsîl dike nikaribûn derbixin.

Sedsala 20. di aliyê Kurdan de bûye sedsaleke ku dîplomasî dijberî wan dixebite. Li Rojhilata Navîn statûko û tewazûnên nû ye ku hatin ava kirin li ser înkar û tine hesibandina Kurdan hatiye saz kirin. Ji vir û şûnde ji bo parastina hebûna xwe her helwestê ku nîşan dan wek paşverûtî hate pênase kirin. Ev rewş ji ber berjewendiya hêzên navnetewî re lihev dihat, dihate qebûl kirin.

Di pêvajoya şerê parvekirinê ya 2. de li Rojhilatê Kurdistanê komara Mahabad ya ku hate ava kirin, piştî ku Rusya vekişiya ji aliyê hêzên Îranî hatiye perçiqandin. Kurd; wekî ku ji ti cihî piştevanî negirtin cîhan jî li hember vê bûyerê wek temaşevan ma.

Li Başûrê Kurdistanê di pêvajoya şerê sar de; tevgera bi piştevaniya Îran, DYE û Îsraîl zîndîbûnek dabe çêkirin û çalak jî bûbe di sala 1974'an de, di encama hevpeymana li Cezayir ya di navbera Îran û Iraq'e de çêbû bi binkeftinek trajîk encam bû. Bi serê xwe ev rastî, bûye mînakek herî baş ya ku bi hêzên derve re sipartî hebûna xwe ava kirin wê konjonktûrel bimînin, bi guhertina tewazûnan encam jî wê werin guhertin. Li ba vê, careke din hatiye piştrast kirin ku ev enceq bi têkoşîna xwe dispêre hêza cewherî ve û bi xebatên dîplomatîk dikare watedar û encamgir bibe.

Binkeftina 1974'an a tevgera li Başûrê Kurdistanê di aliyê dîplomatîk de dersên ku jê werin derxistin ve tijî ye. Di vê çerçeveyê de feraseta siyaseta PDK û teyisîna wê ya têkiliyên derve rawestandin pêwîste. PDK wekî ku hêza xwe ji civakê nagre bi giştî siyaset û dîplomasiya xwe jî ne spartiye civakê. Feraseta siyaseta derve ya ku xwe nespêre hêza cewherî ya civakê ji bo herdemê li beranber hêzên derve wê di pozîsyonek heta dawî lawaz

û hesas de bimîne. Wek hêzeke bi îrade û mayînde nikare hebûna xwe ava bike. Guhertina rewşa konjonktûrel bi her şêwazî wê wan diyar bike.

Di rewşa heyî de PDK, wek Birêz Ocalan jî diyar dike DYE û Îsraîl ji bo ku Kurdan di bin kontrolê de bigrin wek hêzeke siyasî bikartînin. Ji ber vê sedemê hîn di destpêkê de li beranber Tevgera Azadiya Kurd herdem di nava helwesteke neyênî de bûn. Bi vê re hêzên hegemonîk siyaseta di nava Kurdan de PDK kirina hêza herî bi bandor şopandin e. Yek ji sedema komploya navnetewî ya li beranber Serokê Gelê Kurd Birêz Abdullah Ocalan jî ev rastiye. Di pêvajoya komployê de PDK, di derbarê PKK de wek 'rêxistineke terorist' dosya pêşkêş kirina wê, vê rastiyê piştrast dike. Îro bi pir aliyan re têkilî û danûstandinên dîplomatîk pêşxistina PKK û PYD'ê de astengiya herî zêde PDK derdixe. PDK, bi van nêzikatiyên xwe ji berjewendiyên hin hêzên navnetewî û herêmî re guncaw dixwaze bibe tekane nûnerê Kurdan. Di vê bingehê de di xebatên dîplomasiya netewa demokratîk de ev polîtîkaya PDK divê were dîtin.

Bi vê re bi navê Kurdan ji bo ku xebatên dîplomasiyek rast were meşandin li beranber Birêz Ocalan komploya ku hatiye pêşxistin bi her aliyê wê ve fêm kirin mecbûriye. Lewre komploya navnetewî şaşitî û lawaziyên dîplomasiya ku bi navê Kurdan tê meşandin wekî ku pir zelal derxist holê; xebatê dîplomasiyek rast û bi bandor pêwîste çawa were pêşxistin de bûye xaleke fêrker. Yê ku dixwazin bi navê dîplomasiya netewa demokratîk heta ku komplo dernexin zanabûnê nikarin dîplomasiyek bi bandor û rast bimeşînin. Li beranber Kurdan û gelên din wekî ku xeteriyan pêşnebînin tedbîrên dîplomatîk jî nikarin bigrin. Di şexsê Birêz Ocalan de li hember Kurdan û Tevgera Azadiyê komploya ku hatiye pêşxistin derxistina zanabûnê re stratejiya komplo vala derxistin û bi wê re têkoşînê derxistî be; xebatkarên dîplomasiya netewa demokratîk jî bi komplo derxistina zanabûnê re pêwîste xwe bigihînin zanabûna dîplomasiya hîn bi hêz û bi bandor.

Tevgera Azadiya Kurd îro li Rojhilata Navîn bûye hêzeke bi bandor. Lê hêza dînamîk ya Tevgera Azadiya Kurd xwe ne gihandiye asta tewazûnên siyasî ya li herêmê bandor bike û bi vê re denk, asta têkiliyê dîplomatîk ya ji vê hêzê re denk û pêşketî. Dîplomasiya ji bo herêmê ya Tevgera Azadiya Kurd esas ji aliyê Birêz Ocalan dihat meşandin. Bi hewldanên Birêz Ocalan

li Rojhilata Navîn têkiliyên bi hêz hatibûn derxistin, di encama hewldana têkilî û dîplomasiya di herêmê de derfetên xwe bicîh kirin û têkoşînê hatiye afirandin. Îtîbar û bandora Kurdan li ser gelên herêmê di vê bingehê de zêde bûye. Tevgera Azadiya Kurd ger li Rojhilata Navîn bûye hêzek têkoşîna bi bandor ya girîng, di vir de rista xebatên dîplomatîk ya Birêz Ocalan diyarker e.

Navenda ku ji tewazûnên cîhanê re teşe tê dayîn Rojhilata Navîn e. Di vê erdnîgariyê de em têkoşîn dimeşînin. Lewma di vê qada ku derfet û zehmetî navhev de ye dema ku xebatên dîplomatîk dimeşînin, li gor asta pêşketina têkoşîna me faaliyet meşandin elzeme.

Xebatên me yê heta niha pir seranser û tenê zextên dewleta Tirk bi teşhîr kirinê re sînordar maye. Lewma wekî ku asteke stratejîk ya mayînde negirtiye têkiliye ji vê re guncaw jî dernexistiye holê. Xebatên heta niha hatine meşandin bi giranî ji ber bi partî, hikûmet û saziyên dewletê re sînordar maye di van mijaran de encamê ku tê xwestin nehatiye girtin. Wek tevgera me tevgereke demokratîk û sosyalîst di xebatên dîplomasî de civakan, gelan, bawerî û çandan, saziyên demokratîk, avaniyên derveyî pergalê û saziyên derveyî pergalê pêwîst dike ku esas bigre, lê xebatên me yê di derbarê vê mijarê de heta dawî nebes maye. Dîsa di cîhanê de gelên li herêmên din, civak û bi hêzên demokratîk re di asta ku tê xwestin de têkilî nehatiye pêşxistin. Pir bi sînor têkiliyên ku hatine pêşxistin di aliyê têkoşîna me de neziviriye hêzê.

Di tevahiya van rastiyan de xebatên dîplomatîk hîn bi rêxistinî, birfireh û bi bandor kirin pêwîst dike. Di vê pêvajoya ku di herêmê de tewazûnên nû tê saz kirin wek pêwîstiya li Rojhilata Navîn bûyîna hêzeke siyasî ya bi bandor; li gorî vê astê xwedî asta dîplomasiyek bi bandor bûyîn heta dawî girînge. Kurd bi gelên din re ji bo jiyaneke demokratîk û azad bigihe xwedî statûyek ev pêwîst dike. Xûlase; di pêvajoyek ku Tevgera Azadiyê tewazûnên Rojhilata Navîn bandor dike û her roj hîn zêde balê dikşîne ser xwe xebatên me ye dîplomasî bi feraset û rêxistinbûna berê û şêwazê xebatê meşandin nabe mijara gotinê jî. Di vê bingehê de, di dema nû de li gorî hişmendiya netewa demokratîk xebatên me yên dîplomatîk ku wê xwe ava bike ji çawaniya stratejî û taktîkê re guncaw ketina nava pêvajoya pengavî teqez e.

## DI PKK DE RASTIYA HEVBENDIYÊ

Di dîplomasiyê de mijara hevbendiyan (hevbendiyan) xwedî ciheke girîng e. Serok APO dide diyar kirin ku, di şoreşan de hêzek tenê na, du cîhanên xwedî feraset û armancên cûda tên beranber hevdû, bi vî aliyê xwe ve jî şoreşa rast xebateke hevbendiyê ye. Têgeha hevbendî di wateya herî giştî de 'bi hêzên cûda re di arasteya heman armancan de hedefa ku hatiye diyar kirin dema ku diçin, têkoşîna hevbeş û yekîtiya berjwendî li ser hin rêgezên bingehîn ava kirin û ketina nava piştevaniyê ye' pênase kirin pêkan e. Lewma, hevbendî li ser mijarên berjewendiyên hevbeş ku piştevanî pêwîste tê ava kirin. Bi îfadeyeke din li hember hêzên ku li beranber hebûna wan xeterî ava dike têkoşîn û yekîtiya hevbeş çêkirin e. Di vê wateyê de a rast her têkilî wek hevbendî dikare were hesibandin. Stratejiya li ser polîtîkaya rojevî kirin, bi diyarbûna helwestên cûda û hevbeş têkilî û hevbendî hîn zêde eşkere dibe. Di vî milî de hevbendî heman demê de li hember rewşeke pozîsyona xwe diyar kirin, alîgirê çiye derxistina holê û derbasî çalakiyê bûyîn e.

Li gorî naveroka wê hevbendiyan wek 'stratejîk û taqtîkî' cihê kirin pêkan e. Mînak carnan bi hinekan re tenê ji bo nas bikin û fêm bikin dikarin bikevin nava têkiliyan, di vê bingehê de têkilî û hevbendiyên rojane an jî demkî jî dikare were ava kirin. Carnan jî têkilî û hevbendiyên dirêj an jî dem-navîn, têkiliyên hîn bi çawanî pêş xistin pêwîstiyeke girîng ya dîplomasiyê ye.

Di vê bingehê de nêzikatiya PKK ji hevbendiyên berê em bi kurtasî dest bigrin;

PKK wek polîtîk tevgereke di zirûfên sosyalîzma pêkhatî de hatiye ava kirin e. Sosyalîzma pêkhatî jî taybetmendiya xwe ya enternasyonalîst rastiyeke ku vekirî daniye holê ye. Em dizanin ku têgeha enternasyonalîzm bi gelên din civakan re piştevanî û hevbendî digre hûndirê xwe ye. PKK, di derketina xwe de di nava rastiya cîhanê ya du qûtûb de hebûna xwe ava kir û di zirûfên navnetewî de bijardeya xwe ji aliyê kampa sosyalîzma pêkhatî kir. Hîn di destpêkê de qasî girîngî da nirxên însanî û gerdûnî taybetmendiya xwe ya enternasyonal vekirî daniye holê. Lewma PKK hîn destpêka derketina xwe biratiya gelan û

piştevaniya bi têkoşîna wan re di asta herî jor de giringî daye. Wek tevgereke bi vî rengî têkoşîna azadî û demokrasî ya gel û civakên din re hişyar û berpirsyar nêzik bûye. Di nava koma dendik ya PKK de wek Hakî Karêr, Kemal Pîr hevalên ji gelên din cîh girtina wan, dîsa di nava dîroka têkoşînê de şehadeta bi dehan hevalên ji gelên din, diyardeyên herî baş ya ku rihê enternasyonal ya PKK nîşan dide ye.

Birêz Ocalan di pir nirxandinên xwe de di derketina PKK'ê de rol û bandora tevgerên çep-sosyalîst ya Tirkiye bi lêv kirin ji ber giringiya ku dide vê mijarê ye. Wek encama vê PKK têkoşîna ku bi derfeta herî biçûk afirendiye jî ji bo bi tevgerên çep-sosyalîst re parve bike hewldaneke pir mezin daye. Ji bo rihê piştevaniyê xurtir bike bi armanca zemînên têkoşînên hevbeş ava kirinê hewldana ku ji destê wî hatiye daye.

Wekî berê piştî salên 1980 jî PKK li Rojhilata Navîn fersenda di bingeha xwe jinûve rêxistin kirin û berê xwe dayîna şerê gel ê şoreşgerî bi tevahî rêxistinên demokratîk û sosyalîst re ji bo parve bike ket nava hewldanan. Bi vê armancê di encama civîn û hevdîtinan de em dizanin ku platforma eniya şoreşger yekpare ya li hember faşîzme hatiye ava kirin. Lê wek teorîk Kurd-Tirk û bi komên çand yên din re pir gavên hatine avêtin jî di asta pratîkbûyînê de ji ber ferasetên şaş qutbûnên ku çêbûn bi îstîqrar mayînde nebûye. Sedema vê ya bingehîn bîrdoziya şoven Tirk ya ku xwe jor û navend dibîne li ser meylên çep-rast û navend bandoreke xwe ya cîdî heye. Kîjan bîrdoziyê esas digrin bila bigrin komên bi wan re dixwest têkilî were pêşxistin ji van koman qutbûneke radîkal çênekirine.

Dostanî û hevbendiyên azad, wekhev û demdirêj avakirin û nûbûna wê de hêmanê herî esas ji bandora bîrdoziyên fermî yên serwer xwe rizgar kirine. Xwe gihandina zanabûna rast ya dîrokî û civakî û ji vê re guncaw sekna polîtîk pêşxistin e. Di roja me de rûxmê sedema êşên ku tên jiyan kirin û çavkaniya wê ne pirsgirêka têkilî û hevbendiyan tam derbas nekirin, zemîna piştevaniya şoreşger-demokratîk û têkoşîna wê bi şêwazeke xurt sedema ne afirandina wê bandora van hêzên polîtîk û bîrdoziyên serwer in. Esas ev bandor ji çanda civaka Tirk dûr, wek sûnî encama şêwaza mîtolojîk hatiye afirandine diyar kirin pêkane. Ji bo hevbendiyên rast û mayînde werin saz kirin beriya her tiştî meylên wek xwe digre navendê, ezez, kirina yên din, kirina yedek, berjewendîparêz,

lewma yên ku perçe dike, nade lêhurbûn kirin û marjînal dihêle pêwîstiya xwe ji van rizgarkirinê di holê de ye. Bi heman şêwazî di Kurdan de nêzikatiyên wek netewperestiya seretayî, asoya teng, xwe girtina hûndir, teng, bila kêm be bila ya min be hwd. ku derketine holê vekiriye ku nêzikatiyên ji hemûgiriye dûr, bi pirsgirêk û pêwîste werin derbas kirin in. Serkeftina Têkoşîna Azadiyê ji pêşxistina têkilî û hevbendiyên pir alî derbas dibe, ger ev nebe xebata dîplomasiyek rast jî nikare were meşandin zanîna vê girîng e. Pêwîste neyê jibîr kirin ku şoreş di hûndirê xwe de çiqasî xwedî bandorên pir mezin û bi hêz jî be ger ji vê re denk ne xwedî hevbendî û têkiliyan be serkeftin û zaferê misoger kirin gengaz nabe.

Di jor de me dabû diyar kirin ku PKK di hûndirê pergala sosyalîzma pêkhatî de hebûna xwe ava kir. Wek îdeolojîk û polîtîk di derketina xwe de vê pergalê esas girtiye. Piştî 1980 bi derketina derveyî welat di wê demê de wek berdevka pergala sosyalîst bi yekîtiya sovyet re ketina nava têkiliyan di astekî de têkilî hatiye çêkirin. Bi heman şêwazî derdorên çep û sosyalîst û partiyên li Ewrupa re jî di astekî de têkilî hatiye pêşxistin. Lê revîzyonîzma ku di çapê cîhanê de tevahî de mohra xwe li pergalê dabû têkiliyên mijarê gotinê encama ku tê hêvî kirin nedaye. Têkiliya kirina nav berjewendiyên hegemonîk, ji bo armancên taktîkî û bi sûd heba kirin, netew-dewletokên sosyalizma pêkhatî di nêzikatiyên pragmatîst û îstîsmar kirinê de israr kirin û derbas nekirina wan pêşiya pêşketinê têkiliyên bi tendûrist yê enternasyonal xetimandiye. Bi vê wateya xwe feraseta têkilî ya pergala sosyalîst teşbihî têkilî û polîtîkayên netew-dewlet ên kapîtalîst pêşketina têkiliya asteng kiriye.

Rûxmê tevahî zirûf û encamên neyênî bi israr daxwaza bikaranîna PKK di saya sekna bi biryar, hevgirtî û bi bawer ya têkoşîna hevbeş, biratiya gelan û enternasyonalîzmê çêbûye. Gelê Kurd di serî de Gelê Tirk bi gelên cîran re di bingeha azadî û wekheviyê de ji jiyana hevbeş re amade kirin encama girêdana PKK ya pir xurt bi enternasyonalîzmê ye.

Piştî 1980’an tevahî partiyên din berê xwe didan sahayên xwedî zirûfên rehet lê PKK di Rojhilata Navîn de herêma herî germ hilbijart. Ev hilbijartin taybetmendiya PKK’ê ya enternasyonalîst û şoreşgerî re girêdayî ye. Heman demê de nêzikatiya dînamîk a herî girîng ya serdemê

bi tevgerên rizgariya netewî re hevbendî cewherê şoreşgerî di hûndirê xwe de dihewîne. Sûriye, Libnan, Filistîn û bi gelên din re armanca pêşxistina têkiliyên rizgariya netewî hildigre. Hewldanên tîr ye Birêz Ocalan, li Rojhilata Navîn li ser têkiliyan pêşketinan bidest xistinê de, derfetên bicîhbûna tevgerê dîtin û hebûna xwe ava kirin û heta roja me ya îro hatine de diyarker bûye. Li gel nasnameya Kurd û têkoşîna azadiyê ji herêmê û cîhanê re dayîna nas kirin pozîsyonek stratejîk bidest xistinê de jî heta dawî bi bandor bûye. Wekî ku ji van rastiyan tevahî were fêm kirin Tevgera PKK ji destpêkê heta roja me ya îro ev her du faktorên bingehîn di bin her zirûfî de tu dem piştçav nekiriye û heta roja me ya îro aniye. Yek ji van; xwespartina hêza xwe ya cewherî, ya din jî rûxmê tevahî neyêniya bi têkoşîna azadî û demokrasî ya gelên din re zemînên hevbeş afirandin û di nava hewldan û lêgerîna piştevaniyê de bûyîne. PKK ji van xisûsan re ji roja damezrandinê heta roja me ya îro rêgezî nêzik bûye. Lewma bi têkoşîna demokrasî û azadiya gelan re têkilî û hevbendî pêşxistin ne konjonktûrel, sekneke şoreşgerî û rêgezî ye.

Di dema nû de bi xebatên dîplomasiya netewa demokratîk ev rastiya rêgezî wateyekî hîn jiyanî bidest xistiye. Bi vê encamê tenê ne di navbera hêzên sosyalîst û demokratîk ya Tirk û Kurdan de; herî kêm berjewendiyê wan di nav heman sînorên siyasî de tevahî hêzên ku alîgirê jiyana biratî û dostane nin, ji rastiyên hevdû ye dîrokî û civakî re bi rêzdarî nêzik bûn, hevdû wekhev û azad qebûl kirin, wekî ku bibe bingeha dostaniyên mayînde û hevbendiyan esasê yekîtiyên nû ya bihêz û çalakiya ye.

## REHENDA DÎPLOMASIYA NETEWA DEMOKRATÎK

Esasê dîplomasiya netewa demokratîk û hevgiriya wê ji bo baştir were fêm kirin di serî de rehenda dîplomasiya netewa demokratîk pênase kirin û bi vê pênaseyê ve girêdayî rojevê diyar kirin pêwîste. Rehenda dîplomatîk bi giştî perçebûna Kurdistan û Kurdan; pirsgirêkên di heman erdnîgariyê de Tirkmen, Sûryan, Ermen û komên etnîk, bi vê re derbarê çandên cûda, olî û mezhebî çareseriyên çawa tên pêşniyar kirin bi rêgezan ve girêdayî zelal kirinê dike mijar. Di vê rewşê de rojeva rehenda dîplomatîk wek xwezayî pirsgirêkên tên jiyan kirin çawa tên pênase kirin, çawa tên dest girtin û çareseriyên çawa tên pêşniyar kirin dihewîne.

Rojeva rehenda dîplomasiya netewa demokratîk heman demê de rojeva rehenda dîplomatîk ya KCK'ê ye jî. Di vê rewşê de KCK rewşa şênber ya çareseriya demokratîk e. Ger wisaye KCK pirsgirêkê çawa pênase dike, çareseriyên çawa pêşniyar dike û wek rêgezî nêzikatiya KCK pêwîst dike ku em pênase bikin. Beriya vê ger KCK di wateya teng de em xûlase formûle bikin; KCK di çareseriya pirsgirêka netewî de ji zirûfên roja me ya îro re guncaw veguhertina heri rasteqîn û bi kok daye çêkirin. Di pirsgirêka Kurd de mafê çarenûsa xwe diyarkirina netewan şîroveya wê ya ne dewlet îfade dike. Bi dahûrandinên parêznameyên ji 5 cîldan ya Serokatiya Gelê Kurd re sipartî çavkaniya pirsgirêkên ku îro mirovahî jiyan dike bi giştî 5000 sal pergala hegemonîk, taybet jî modernîteya sermayedar ya ku mohra xwe li 400 salên dawî xistiye. Wek lingê wê ya esasî meyla daneheva bênavber û kara azamî (qezenca herî bilind) ya netew-dewlet û sermayedarî-pîşesazîtî ye.

Domandina pîşesazîtî, ji bo zagonên daneheva sermayedarî bixebite mekanîzmaya netew- dewlet ku di wezneke pir zêde zor, zext û dextê ve hatiye arastin (donatmak) di 200 salên dawî de serdestiya xwe bi sazî kirin û berbelav kirinê re tenê ne sedema pirsgirêkên civakî û xwezayî de, di pêşiya çareserkirina pirsgirêkan de jî astengiya herî mezin e. KCK ev pergala ku texrîbatên xwe yê ji bo xweza, civak, gelan û kedkaran heye wek amûrê çareserî dîtin aliyeke dijî cewhera xwezaya yekemîn û duyemîn dibîne. Lewma KCK perçeya herî girîng ya pirsgirêkên civakî wek çareseriya pirsgirêkên netewî de hem wek pêwîstiya xwezaya civakan, gelan û kedkaran hem jî ji ber sedema astengiya netew-dewlet ya pergala hegemonîk modela demokratîk û feraseta wê esas digre. Modela çareseriya KCK, di cewherê xwe de xwe dispêre nêzikatiya bûyîna netewa demokratîk û civak xwe wek civaka netewî ya demokratîk înşa kirine.

Li vir civak mafê xwe yê xwe wek netewa demokratîk înşa kirinê bizat bikaranîn mijara gotinê ye. Netewa demokratîk, ferdên azad û civat bi îradeya xwe civaka hevbeş ku ava dikine. Penaseya netewa demokratîk ya ji sînorên hişk, yek ziman, çand, ol û dîrokê ne hatiye girêdan, hemwelatiyên piralî-wekhev-azad re li gel hevdû û bi şêwazê piştevanî jiyana hevbeş îfade dike. Di netewa demokratîk de ya ku mohra xwe li hişmendiya hevbeş dike ne netewperestiye, zanabûna azadî û piştevanî

ye. Bedena netewên bi hişmendiya azadî û piştevanî jî xweseriya demokratîk e. Xweseriya demokratîk wek esasî ferd û civatên ku hişmendiyên dişibe hevdû parve dikin xwe bi xwe birêvebirin e. Em dikarin bêjin rêvebiriya cewherî ya civaka demokratîk. Di çarçeveya pênaseya ku me kir KCK, çareseriya pirsgirêka netewa Kurd ji nêzikatiyên kevneşop pêşdetir, nêzikatiyên netew-dewletokî red kirinê re modela netewî ya demokratîk mafê netew bûyîna Kurdan, veguhertina diyardeya civaka netewî di xweseriya demokratîk de pêkanînê esas digre. Bi netewên din re ji pênaseya netewa jor re vekirî pênaseya netewa yek beden (welatê hevbeş) mijara gotinê ye. Pênaseya netewa jor bi şêwazê ji yek zêdetir netewan bigre hûndirê xwe dikare were birfireh kirin, serê wê vekiriye.

Ji pênaseyan jî wekî ku were fêm kirin KCK netewbûna Kurd bi du rehendan difikire. 1- rehenda hişmendî, 2- rehenda bedenî. Ji bo rehenda hişmendî me got netewa demokratîk. Li vê derê pîvanga (qistasa) bingehîn bi cûdabûnan ve sipartî xeyala cîhaneke azad û wekhev wek hişmendî parvekirine. Cûdabûnên heyî bêyî ku biterikîne hişmendiya azadî û wekhevî di qada rayagiştî di cîhana civakê ya polîtîk û exlaqî de tê wateya herdem jiyan kirinê. Bêyî ku tîrbûnên ziman, çand, dîrok, aborî û gelhe (nifûs) îhmal bike di derbarê van qadên girîng de çalakiyên xwe bi zanabûn bi hestê piştevaniyê bi kirina yek re wek cîhana hişmendiya hevbeş jî em dikarin diyar bikin.

Rehenda duyemîn jî rehenda bedenî ye. Me ji vê re gotibû xweseriya demokratîk. Bi beden tiştê ku em dixwazin bêjin hebûna civakî xwe li gorî cîhana hişmendî jinûve sererast kirine. Lewma xwezaya civakî û derdora wê jinûve sererast kirin û rehenda bedenî pênase dike. Modela çareseriya demokratîk ya KCK rehendê wê yê xwedî hûrgulî hebin jî di bingeha her du rehendên li jor me pênaseya wan kir modelên netewa demokratîk ku tên înşa kirin wek modela çareseriya bingehîn esas digre. Di vê arasteyê de KCK çavkaniya tevahî pirsgirêkên ku îro mirovahî dijî, di herî bingeh de şaristaniya hegemonîk, taybet jî wek dirêjahiya wê modernîteya sermayedar ku ji 400 salên dawî re mohra xwe lê daye dibîne. Çareserî jî şaristaniya demokratîk û bersiva di wateya serdema 400 salên dawî modernîteya demokratîk; aboriya komûnal, netewa demokratîk û eko

pîşesazî xwe rêxistin dike. Heman şêwazî KCK modela çareseriya netewî dibîne û wek bersiva vê ya herêmê jî 'yekîtiya netewên demokratîk ya Rojhilata Navîn', bersiva wê ya cîhanê jî wek 'konfederasyona netewa demokratîk ya cîhanê' formûle kiriye. Gelê Kurd bi vê modela çareseriyê tenê pirsgirêkên xwe ya demokratîk ya netewî çareser kirinê nake hedef. Ji bo tevahî herêma Rojhilata Navîn û mirovahî ev derketina şoreşgerî ku pir wate îfade dike pêk tîne.

Ev derketina ku wek modernîteya demokratîk em formûle dikin Rojhilata Navîn ku di dîrokê de dema xwe ya herî aloz jiyan dike rêya çareseriya pêwîst e. Ev 200 sale li herêmê modernîteya kapîtalîst çareserkirina pirsgirêkan milekî bêhtir geş kiriye, ev pirsgirêk enceq bi modernîteya demokratîk dikare were çareser kirin.

Em komî ser hev bikin KCK li hember netew-dewletok netew-dewletoka Kurd wek rêgezî red dike. Di bin her zirûfî de otorîteya ku Kurd dipejirînin rêvebiriya xweser ya xwe bixwe ye. KCK wek pergal bêyî ku bikeve nava şovenîzma netewî, pevçûnen sînor, bûrokrasî, netew-dewletokan ji bo tevahî gelan ku karibin xwe bi şêwazê otorîtêyên siyasî ya jidil avakirinê ye. Di vê bingehê de KCK, di nav sînorê netew dewleta Tirkiye, Îran, Iraq, Sûriyê û dewleta federe ya Kurd li Iraq'ê wek çêbûna xweseriya demokratîk projeya jiyana wekhev ya herî bi îdeal e. Wekî ku rastiya civakî jî piştrast dike tevahî pirsgirêkên bi van dewletan re hene enceq di bingeha xweseriya demokratîk di nava aştiyê de bi rêbazên demokratîk çareser kirina wê bawer dike.

## PÊNASE KIRINA DÎPLOMASIYA NETEWA DEMOKRATÎK; ARMANCA WÊ Û REHENDÊ WÊ YÊ STRATEJÎK Û TAKTÎKÎ

Dîplomasiya netewa demokratîk;  bi cewherê civaka demokratîk ya konfederal ve girêdayî mayinê re (civaka exlaqî û polîtîk) bi cûdabûna sipartî di nava yekparetiya rêgezî ya wekhev, azad û demokratîk tevahî avaniya di bingeha têkiliya sîmbiyotîk piştevaniya wan bi hev re çêkirin e. Pirsgirêkên ku derkevin holê bi rêgezên empatî, wicdan û exlaq ve sipartî di bingeha aşitî, dostanî bi rêbazê diyalog û mûzakere amûrê gihandina çareseriyê ye.

Civaka demokratîk di cewherê xwe de civaka exlaqî-polîtîk an jî civaka xweseriya demokratîk e. KCK, rêxistina sîwan ya xweseriya demokratîk e. Civaka xweseriya demokratîk an jî civaka demokratîk wateya wê ya fireh netewa demokratîk e. Bi îfadeyeke din jî netewa demokratîk, rehenda hişmendiya xweseriya demokratîk e. Xweseriya demokratîk jî bedena ku hişmendiya netewa demokratîk xwe li ser ava bike ye. Di vê çerçeveyê de dîplomasiya netewa demokratîk li ser du rehenda xebat dimeşîne. Rehenda yekemîn bi pêkhateyên herêmê re xebata dîplomasî ku were kirin –ev heman demê de lingê stratejîk e- rehenda duyemîn jî xebata ku bi dewletan re were meşandine – ev jî lingê taqtîkî ye.

Ji pênaseya stratejîk ya dîplomasiya netewa demokratîk me li jor berfireh cîh da. Bi dewletan re dîplomasiya netewa demokratîk ku were meşandin ger em pênaseya wê bikin; pênaseya taqtîkî ya netewa demokratîk: bi dewletên têkildar (eleqedar) di serî de (KT, Iraq, Îran, Sûriye) tevahî netew-dewletên din û saziyên jorî netewan di serî de pirsgirêka Kurd, pirsgirêkên gelan ya mezhebî û pirsgirêkên tevahî komên çandî yên azadî û demokrasiyê li ser bingehê lihevkirinê çareserkirinê esas digre, di vê bingehê de îradeyên demokratîk ku derketine holê bi netew-dewletên têkildar re, bi dewlet+demokrasî naskirina wê armanc dike. Di nava aştiyê de li ba hev jiyan kirin û rêvebiriyên xwe yên cewherî ava kirin e, di bingeha avaniyên civaka demokratîk xwe rêxistin kirin, saziyên dewletê ku hîn bi berhem werin kirin di nava hev de û di bin temînatên makezagonî de lihevkirin û bi hev re jiyînê armanc dike.

Di zirûfên roja me ya îro de pirsgirêkên azadî û demokrasiyê heta dawî derbasî navhev bûye. Di vê xalê de daneyek şaş sererast kirin pêwîst dike; bi giştî di civakên netew-dewlet têkoşînên ku dane jê re dibêjin têkoşîna demokrasî, têkoşîna gelên bi çanda mêtingeriyê tên birêvebirin re jî dibêjin têkoşîna azadiyê. Li gorî ramana rûniştî civakên netew-dewlet pirsgirêkên wan yê demokrasiyê ku pêwîste çareser bikin heye bi vê re wek civakên azad tên dîtin. Halbûkî pirsgirêkên azadiyê ya civakên netew-dewlet ji pirsgirêkên demokrasiyê zêdetir e. Di dawî de demokrasî pirsgirêka mafên bingehîn û ya azadî ye. Cihekî ku pirsgirêka demokrasî hebe li wir pirsgirêka azadiyê jî heye. Berovajiya wê, cihê ku pirsgirêka azadî hebe li wir pirsgirêka demokrasî tê jiyan kirin. Di vê rewşê de her

du qadên têkoşîne pêwîste yekpare were dest girtin, pirsgirêka azadî û demokrasî ya gel, civatên etnîkî, avaniyên olî-mezhebî û komên çand yên din têkoşînên ku dimeşînin divê bi hev re yekpare bibe. Bi vê ferasetê dema ku nêzikatî çêbibe wê were dîtin ku ev pirsgirêkên ku ewqas derbasî nav hev bûne, çareseriyê wan jî bi hev ve girê dide.

Têkoşîna azadiyê ya Gelê Kurd gelên din ku bi hevdû re jiyan dike bi têkoşîna wan ya azadî û demokrasiyê re neyê hevpar kirin, di vê bingehê de dewletên têkildar ji demokrasiyê re neyên hişyar kirin gihandina serkeftine zehmet e. Dema ku em li bûyerên li Rojhilata Navîn ên îro diqewimin dinêrin, şerê gelan, şerê bêeman a mezhebên ji heman olê, herî zêde encamên ji feydeya pergala hegemonîk derxistiye holê. Nêzikatiyên wek 'ez îbadeta xwe bi şêwazeke azad bikim yên din min eleqedar nake', 'tenê azadiya min, min eleqedar dike' wekî ku sînerjiyek ava nake dihêle ku enerjiyên heyî jî di bin zexta hestên teng û seretayî de heba bibe. Dîplomasiya netewa demokratîk ev enerjiya ku di rewşa bêrêxistin û berbelav de ye veguherandina sînerjiyeke xurt, bêrîkirina hezaran salan ya gelan, avaniyên etnîk, ol, mezhep û çandên cûda bi înşaya netewa demokratîk pêkanîn û ji bo vê anîna gel hevdû armanc dike.

Wekî ku tê zanîn wek pêwîstiya avaniya netew-dewlet wekî pir daneyan a rast siyaseta ku karê gel e, di xwe de navendî kirinê re di bingeha cûdabûnan de siyaset meşandine asteng dike. Di wateyekî de vê li hember yekparebûna dewletê wekî xeterî dihesibîne. Lewma di mijara partî û civakên sîvîl şerta sereke bi polîtîkayên dewletê re hevbeş tevgerandin e. Tişta ku dewlet bi vê armanc dike qada polîtîk ku xwe serwer û bêrîtî dike herdem fireh kirinê re hêza xwe ya li beranber civakê diparêze. Li beranber dewleta ku hêza xwe qada siyaseta demokratîk teng kirinê re ava dike wek xwezayî hêza civakê lawaz dikeve. Îcar tam di vê xalê de girîngiya siyaseta demokratîk derdikeve holê. Siyaseta demokratîk tê wateya di hûndirê civakê de vebûna siyasetê. Armanca wê avakirina civaka demokratîk e. Ji bo tevna polîtîk bi tendûristî bixebite zirûfên nêvenga demokratîk ya pêwîst afirandin e. Civak ji bo siyaseta demokratîk bike her ku bigihêje nêvenga demokratîk ji ber ku wê pêş bikeve qadên ku dewlet ji xwe re girtiye wê her biçe teng bibe. Bi

firehbûna qada siyaseta demokratîk jî ‘zêdetir civak kêmtir dewlet’ wê derbikeve holê.

Li ser rastiya HDP em dikarin derbarê vê mijarê de mînak bidin. Di derbarê HDP’ê de nêzîkatiyên teng yê ku derdikevin holê tên zanîn. HDP di aslê xwe de pêşnûmeya ji civakê re qada siyaseta demokratîk vekiriye. Bi gotineke din HDP, li Tirkiye di berfirehiya pêşnûmeya vêbûna kedkar, demokrat, çepgir, sosyalîst, avaniyên cûda yên bawerî û etnîk qada siyaseta demokratîk vekirin, di siyaseta demokratîk de pêşnûmeya aktîf û dînamîk kirin e. Her qada ku avaniyên civaka demokratîk bikeve nav qadên ku bandora dewletê teng û kêm bikin e. Bi vê şêwazê dewlet dema ku biçûk dibe qadên civaka demokratîk jî wê fireh bibe. Welatên ku dewlet bi hêz e, qadên çalakiyên polîtîk nefireh e mafên bingehîn û azadiya tu hêzan ne di bin misogeriyê de ne. Dewletê li beranber demokrasî hişyar kirin û heta ku mecbûrî paşvekişînê neyê kirin bi hêzên demokratîk re di çarçeveya makezagonên demokratîk de ketina nava lihev kirin pêkan nabe.

Di mijara Rojava de jî heman rastiyê em dikarin bidin xûya kirin. Rejîma Sûriye ji demokrasiyê re hişyar neyê kirin –kî ev bi pêşketina civaka demokratîk û pêşiya siyaseta demokratîk vekirinê re pêkan e- misogeriya azadiya Rojava nayê çêkirin. Bi gelên din û avaniyên etnîk, qebîle, êşîr, cemaat û mezheb, saziyên civaka sîvîl û partî di pozîsyona mutefîkên stratejîk yê dîplomasiya netewa demokratîk de ne. Dîplomasiya netewa demokratîk, bi siyaseta netewa demokratîk re sipartî anîna van hêzan gel hevdû, avakirina hêz û îradeya hevbeş û rêvebiriya xwe ya xweser ava kirinê esas digre. Tevahî avaniyên ku me li jor hejmart di vê tewereyê de hêzên ku dîplomasiya me li ser bixebite, di bingeha rêgezên wekhevî, azadî û demokrasiyê de têkilî pêş bixe û berfirehiya civaka demokratîk esas bigre ye.

### REHEND Û PALPIŞTÊN BINGEHÎN YA DÎPLOMASIYA NETEWA DEMOKRATÎK

Xalên palpiştên bingehîn ya dîplomasiya netew-dewlet hêza leşkerî, polîtîk û aborî ye. A rast îro ji aliyê van dewletan ve tevahî xebatên dîplomasiya ku tê meşandin di plana pişt de têkiliya bi hêz heye. Di serî de hêzên hegemonîk, polîtîkayên netew-dewlet ku hêz û çalakî di destê xwe

de girtine ji dewletên din re dayîna qebûl kirinê de em dizanin ku pir zêde zehmetî nakşînin. Dîplomasiya netewa demokratîk jî wekî ku xebatên xwe naspêre têkiliyên hêz, di xebatên xwe yê dîplomasiyê de jî wek rêgezî vê nêzikatiye red dike. Di vê rewşê de pirsa dîplomasiya netewa demokratîk bi kîjan xalên palpiştê ve tê meşandin tê hişê mirov. Yekemîn xala palpiştê ku dîplomasiya netewa demokratîk xwe bispêriyê, daneheva dîrokî-civakî ye. Wek daneheva kombûna şaristaniya demokratîk jî pênase kirin pêkan e. Ev xwe dispêre daneheva çand. Ya duyemîn, îradeya gelan ya demokratîk, yekgirtî, siyasal e. Ev îrade digre pişt xwe. Ya sêyemîn, hişmendiya stratejîk, Paradîgma modernîteya demokratîk e. Ya çaremîn jî rêgeza exlaq, adalet û wicdan e. Wek wicdana civakî jî em dikarin pênase bikin. Wicdana civakî tekane qada xwespartinê ya ku hêza wan ya siyasî, leşkerî, aborî nîne.

Palpiştên bingehîn ya dîplomasiya netewa demokratîk ger em hinekî ger vekin; daneheva civakî dîrokî an jî daneheva şaristaniya demokratîk, bi derketina şaristaniya dewletî hedî bibe jî, temsîla daneheva mirovahî ya heta roja me dike. Bi derketina şaristaniya dewletî wek rûyê din ya dîrokê a ku ji holê ranebûye rûxmê tevahî zext û mêtingeriya şaristaniya navendî hebûna xwe parastiye û heta roja me ya îro aniye. Di cewherê xwe de yekparebûna exlaqî û polîtîk ya xwezaya civakî îfade dike. Şaristaniya demokratîk di rêjeyeke mezin de konfederasyonên qebîle û eşîran ji bo wekhevî, azadî û demokrasiyê li hember êrîşên şaristaniya navendî di jiyana exlaqî û polîtîk de israr, di vê bingehê de ketina nava raperîn û berxwedanê, ji bo vê jî rastiya dîrok, civak û çanda wê temsîl dike. Ji şaristaniya navendî zêdetir xwedî kok e û merhaleya herî demdirêj a peresana mirovahî digre hûndirê xwe. Tevahî afirandin, danehevên nirxên komûnal temsîl dike. Dîplomasiya netewa demokratîk xwe dispêre daneheva komûnal civakê ya tevahiya vê dîrokê.

Îradeyên siyasal yekgirtî demokratîk ya gelan, hêz û sînerjiya xwe di tewereya civaka demokratîk de xwe digihîne avaniya rêxistinî, ev dibe vîna tewandina wê herî zor, vîna qewîm ya herî rewa ye. Tek pirsgirêkê wê li beranber avaniyên şaristaniya hegemonîk ya navendî xwe nekirina hêzeke rêxistinkirî û di pozîsyona belave de mayîn e. Di bingeha hişmendiya netewa demokratîk de xwe zane bike, xwe bigihîne avaniyên

civakê ya demokratîk vîneke ku dikare meşa dîrokê biguhere. Hêza palpişta herî mezin ya netewa demokratîk ev îradeya demokratîk, siyasal, yekgirtî ya ku ti hêz nikare bikaribe ye.

Pilpişteke din ya dîplomasiya netewa demokratîk wek hişmendiyeke stratejîk jî me îfade kir paradîgma modernîteya demokratîk e. Paradîgmaya modernîteya demokratîk, alternatîfa modernîteya sermayedar û di pozîsyona dij angaşta wê de ye. Dîplomasiya netewa demokratîk, bi vê stratejî û hişmendiyê ve spartî esasên bernameya xwe pêkanîna hedef dike. Hişmendiya stratejîk ku xwe bispêre daneheva dîrokî û civakî ya bi kok, hêza potansiyel û rastîn yê welat di cihê wê de, dema wê de û berê wê bide hedefên rast. Rêxistin û amûrên wê diyar kirin û hevbendiyên wê rast tespît kirinê re hişmendiya ku bi cîh bike ye.

Rêgeza exlaq, edalet û wicdan: Machiavelli ya ku rêbaza zanistî a hişk ya Îbn-î Sîna û Arîsto di qada siyaset û sosyal de pêk anî, di rojava de di teşegirtina dîplomasiya netew-dewlet de risteke girîng leyistiye. Îro bixwe jî di siyaset, felsefe û bi taybet jî di dîplomasiyê de wek îfadeya herî zêde ya bê exlaqî tê hesibandin ‘armanc her cûre wasitayê (amûrê) meşru dike’ wek xwediyê vê peyvê siyaset û dîplomasî di felsefa xwe de ji etîk û exlaq bi temamî veqetandiye. Beriya vê di astekî de jî be behsa têkiliya teoriya siyasetê bi etîk û exlaqê re dikaribû were kirin. Mînak têgehên wekî rast-şaş, baş-xirap, bi exlaq an jî derveyî exlaq di asteke xwedî diyarkerde bûn. Bi vê re di têkiliya de jî cihekî wan hebû. Machiavellî, yekemîn bîrewerê ku bûyerên siyasî û civakî, bendên etîk an jî exlaqî bêyî ku bispêre di nav têgehên xwe de nîqaş kiriye. Dîplomasiyê de tekane hûnere ku derxistiye holê ‘hesabperesti ye’. Li gorî wî dîplomasî, amûrê herî girîng ya dewletekî ji bo aliyê dijber bixapîne ye. Ji vê pêşdetir wate nade. Dîsa li gorî wî polîtîka derve dewleta ku herdem di nava şerdeye derveyî hewldana hêza xwe xurt kirinê ne tişteke din e. Dîplomatên wan jî ji bo hikûmdarê xwe bi hêz bikin û bi taybet nav û denge wî/ê zêde bikin bi feyde tê dîtin. Hêza dewletekî ya çek û serwet di têkiliyan de hêmanê herî diyarker dihesibîne. Her yek jê di heman demê de netew-dewletên ku yekdestdar in bi armanca kar ku faktora bingehîn ku têkiliyên xwe dispêrin faktora hêz e. Wekî ku ji pênaseyên Machieavelli ji felsefa siyaset û dîplomasî re aniye em fêm dikin di pirtûke wan de ji exlaq, adalet û

wicdanê re nirx nayê dayîn. Lewma ji bo berjewendiyên dewletê tiştekî ku neyê kirin nîne. Di gihandinê de her rê mubah tê dîtin.

Di têkiliyên netew-dewlet ji zemanê kevn de mijareke tê nîqaş kirin jî dewletek soza xwe di kîjan zirûfan de bigre an negre wê rewa were hesap kirin e. Di şerê parvekirinê ya 1. de Serokê Emerîka Woodrow Wilson, di konferansa Paris'ê de şerên ku hatin jiyan kirin yek ji sedemên wê yê bingehîn di têkiliyê dewletan de bi exlaq nêzik nebûne nîşan daye û di vê dorfirehiyê de li ser têgeha exlaq tîr sekiniye. Lê nêrîna rojavayiyan li ser exlaq hevpeymanên di navbera xwe de çêbikin bi şêwaza kesêk bi exlaq nêzik bibe pêwîstiya bi hevgirtî (tutarlı) nêzikbûn e. Bi îfadeyeke din hevpeymanek di kîjan zirûfan de hatiye kirin, naverok û şêwazê wê çi dibe bila bibe misoger pêk anîna wê ye. Li vê derê beriya wê bê exlaqiyên ku hatine kirin qet nagrin dîqatê. Hevpeymaneke ku li ser bê exlaqiyê hatiye avakirin, bi exlaq sipartî pêkanîna wê û di pêvajoyê de bi exlaq girêdayî mayinê re pêwîstiya hevgirtî nezikbûnê xwestin derveyî bê exlaqiya xwe pişt hevgirtî nêzikbûnê veşartine ne tişteke din e. Were bal kişandin dîroka tevahî netew-dewletan bi bêexlaqîbûn û bêwicdanbûnê ve dagirtiye. Netew-dewlet beriya şerê cîhanê di navbera xwe de parve kirin. Nexşeyên parvekirina vesaz kirin, ji bo armancê xwe ji yek zêdetir hevpeyman û hevbendiyên dijberî hev û vala derdixe imzeya xwe avêtin. Çalakiyên wek gelan, civakan, çandan ji bo bi rêve bibin perçe kirin, tine kirin, bi hevdû şikandin, mêtinger kirin bi giştî di bingeha înkara exlaq û wicdan de çalakiyên ku tê pêş xistin e. Lê civaka demokratîk bi tevgerandina wicdanê tê parastin. Bêyî hewldana qezenckirina nirxên wicdanî, ne pirsgirêk tên çareser kirin ne jî mafan bidest xistin pêkan dibe. Cihê ku adalet, exlaq û wicdan tinebe wek xwezayî hêmana hêz derdikeve holê. Lewma yên hêzê xwe hene serdikevin, ye nîne mafdar jî be ji wenda kirinê re tê mahkum kirin. Li gel tevahî rêgezên dîplomasiya netewa demokratîk nêzikatiya rêgezî ya herî girîng jî rêgeza exlaq, adalet û wicdan e. Yên ku empatiya xwe nîne nikare exlaqî û wicdanî nêzik bibe. Lewma aliyê beramberî xwe nas nake û fêm nake. Nas bike jî tenê berjewendiyê xwe esas digre. Di vê çerçeveyê de dema ku em dest bigrin pêkhateyên dîplomasiya netewa demokratîk vîna xwe ya cewherî derxistina holê re ji civaka demokratîk re dema didin kezanç kirin, destpêkê bi empatî nêzikbûnê esas digrin.

Bi paradîgmaya azadiyê re siyaseta hûndir û derve navhevbûneke pir şidiyayî qezenc kiriye. Bi vê re asta polîtîk hem bi rastiya dîrokî hem ya rojevî re girêdana xwe heta dawî bi hêz bûye. Baxê polîtîka bi exlaq re ya ku diyalektîk e û qut nabe em dizanin. Lewma dîplomasiya KCK bi taybet qasî zanistîbûna polîtîkaya hûndir û derve bi têgeha exlaq, wicdan û edaletê bûye yek xwe dispêre têkiliyeke şidiyayî.

Rehendên dîplomasiya netewa demokratîk jî; di dema nû de PKK û KCK di serî de nêzikatiya xwe ji pirsgirêka Kurd, pirsgirêkên din yên civakê, şêwazê dest girtin û perspektîfa çareseriyê ji rihê demê re guncaw veguhertin derbas kiriye. Têkoşîna PKK ya heta niha êrîşên înkar-îmha û bişavtinê vala derxist û wek pêwîstiya her gel çarenûsa xwe bixwe tayin bike ava kirina dewletê hedef digirt. Birêz Ocalan di parêznameyên xwe de pirsgirêkên dîrokî, civakî ku daniye holê û derbarê pergala hegemonîk bi dahûrandinên bîrdozî, felsefî, polîtîk, aborî çavkaniya tevahî pirsgirêkan bi derketina pergala hegemonîk ya navendî ya yekdest ve girê dide. Sêberiya çîn, bajêr û dewlet tevahî nirxên komûnal ya civaka xwezayî mêtinger kirin û xwe li ser vê bisazî kirin.Dema ku vê dikirin avaniyên demokratîk ya ku li hember wan berxwe didan herdem tepisandin, ev jî esasê pêşdeçûna şaristaniya dewletî ya navendî di parêznameyan de bi şêwazeke berfireh tê dest girtin.

Wek xeleka dawî ya şaristaniya yekdest ya navendî û ji 400 salên mirovahiyê re mohra xwe lê daye modernîteya sermayedarî jî bi şêwazeke dişibe vê daneheva mirovahiyê ya zanistî, çandî, felsefî û bîrdozî li gorî armanca xwe lê anînê re îstîsmar kiriye. Bi vê li ser sermayedarî, pîşesazîtî û netew-dewlet xwe bi pergal kiriye û heta roja me ya îro hatiye. PKK û KCK tevahî pirsgirêkên ku îro tên jiyan kirin di dorfirehiya modernîteya sermayedarî û her sê lingên wê sermayedarî, pîşesazîtî û netew-dewlet de dest digre. Çareseriyê jî wek alternatif şaristaniya demokratîk ku pêş xistiye û xwe dispêre sê lingên wê aboriya komûnal, pîşesaziya ekolojîk û netewa demokratîk.

Têkoşîna PKK ya heta niha hîn zêde bê encam hiştina polîtîka û nêzikatiyên hebûna Kurd tesfiye kirinê esas digirt. Pirsgirêka Kurd dîtinî kirinê re çareseriyê rojev kirin bû. PKK û KCK ji vir û şûnde nasnameya Kurd û îradeya rêxistinkiri, daxwaza jina azad ya ku derxistiye holê ne di

avakirina dewletê de di avakirina netewa demokratîk de dibîne. Binê wê xêz kirinê daxûyakirin pêwîst be, di pirsgirêkên netewî û civakî de veguhertina ku hatiye jiyan kirin xeta esas netew-dewleta ku di rewşa çavkaniya pirsgirêkan de ye wek çareserî dîtinê dûr ketin wek alternatîf çareseriya demokratîk esas girtine. Çareseriya demokratîk, derveyî netew-dewlet têkoşîna demokratîkkirina civakê îfade dike. Demokratîkkirina dewletê an jî civaka demokratîk; tê wateya bi tevna exlaqî û polîtîk re sipartî mafê siyaseta demokratîkkirinê azad bikar anîn û xwe bixwe rêvebirine. Dewlet+demokrasî wekî du otorîte di bin heman sîwane de bi hev re jiyankirina dewlet û civaka demokratîk îfade dike.

Îro di cîhanê de netew-dewletên ku wek tekane hêza desthilatdariyê di dest xwe de digre ji navendê ber bi herêmê ve erkên xwe yê rêvebiriyê mecbûrî parvekirinê dimînin, heta wek avanî di arasteya derbasbûna wan de pêvajoyek tê jiyan kirin. Di vê wateyê de veguhertineke siyasî ya cidî mijara gotinê ye. Di milê erenî de veguhertina netew-dewlet, demokratîkbûn, rêvebiriya xweser, avakirina netewa demokratîk, demokrasiya xwecihî û çanda demokrasî di tevahî qadan de pêşxistin û avakirin pêkan e. Wek rêxistina sîwana siyasî ya netewa demokratîk KCK, di pirsgirêka Kurd de netewa demokratîk ku xwe ji netew-dewlet şûştiye, tenê ne ji bo Kurdan, ji bo tevahî civatên qewmî-netewî ku derbasdar e îfadeya pêşniyar kirin û avakirinê ye. Çareseriyê wek '*ji dewletê par girtin*' nabîne. Kurd bi îradeya xwe ya azad mafê xwe yê bi rêvebirinê û di vê bingehê de wek netewa demokratîk avakirin bîzat pêk anîne. Netewa demokratîk ferd û civakên azad bi îradeyên xwe yên cewherî civakên hevbeş ku ava kirine an jî wekheviya bi tevahî cûdabûnan ve sipartî yekîtiyên hevbeş yên demokratîk û azad in me dabû xûya kirin. Li vir hêmana bingehîn di netew-dewletan de netewbûyîn bi xebateke endazyarî homojen kirin û yektîp kirinê re sipartî ye. Di netewa demokratîk de jî berovajiya wê cûdabûna wek xwezaya civakê û dewlemendî hesibandin heye. Bi ba vê, wekhevîbûnê naspêre eynîkirinê (tektîpkirinê) dispêre cûdabûnan. Bi zorê bişavtin, bi girtina yedeka xwe an jî bi şibandina wekî xwe cûdabûnan di nava çanda serdest de bişavtinê ango helandinê red dike. Bi îradeyên xwe yên cewherî ji parastina hebûna parastin û ji xwe pêşxistine hêz digre. Li vê derê wek ewlehiya çanda avaniyên cûda bi wekhevîbûnê ve sipartî ji hevdû bandor bûyînê xwe

xwedî kirin û yekparebûnê bi cûdabûnan ve sipartinê digre. Di navbera cûdabûnan de behsa girêdana analîtîk û atifî dikare were kirin. Her cûdabûn ji ber bi yên din re wê di nava bandor û xwedî kirinê de bin her diyardeya cûda hebûna diyardeya din wek hebûna xwe dihesibîne û ewlekariya xwe jî ewlekariya yê din jî di ewlekariya xwe de dibîne. Tevahî cûdabûn bi vê şêwazê li beramberî hev hatin, yek li ser ya din xwe di jor de hesibandinê re girtina bin zext, nêzikatiyên ku dişibîne xwe dûr sekinandinê gel hevdû rêzbûne re di xaleke hevbeş (ev dibe yekparebûn) de kilît dibin. Lewma her cûdabûn ji yê din cûda, bi tena xwe wekî ku xwe nîvço bibîne bi yên din re yekbûna wek hinceta hebûna xwe dihesibîne. Bi giştî cûdabûnê ku em dibêjin ev in; gel, qewm, ol, mezhep, cemaat û eşîr di serî de li gel nasnameya çandên cûda rêxistinên civaka sivil, sendika, parti, odeyên pîşe, kedkaran, jinan, ciwanan û hwd, tevahî avaniyên civakî digre hûndirê xwe. Ev avanî teva çarçeve û feraseta ku me diyar kir ya ku li gel hevdû bigre hişmendiya netewa demokratîk e. Xweseriya demokratîk ev avaniyên ku me li jor hejmartin dîsa avanî û civakên ne dewlet in û bi dewletê re lihevhatî jî bin dewletbûnê nakin hedef, di bingeha rêgeza xwe bi xwe di nava cûdabûna xwe de wekhev, azad û demokratîk birêve dibin civakên exlaqî-polîtîk an jî civakên demokratîk in.

Dîplomasiya netewa demokratîk, bi hişmendiya netewa demokratîk û avaniya xwe ya xweseriya demokratîk ve sipartî cûdabûnên mijara gotinê ne anîna gel hevdû, zemîna piştevaniya jiyana hevbeş, xebat û siyaseta demokratîk bi afirandinê re bi hêz kirinê esas digre. Bi vê re wekî organîzasyonên jorî yekîtiya di navbera gelan yekîtiyên herêmî û kûrewî (mînak yekîtiya netewên demokratîk ya Rojhilata Navîn û wek merhaleya wê ya jortir yekîtiyên netewên demokratîk konfederal ya cîhanê) armanc dike.

Bernameya KCK tevahî tiştên ku me gotine bi şêwazeke berfireh û dorfireh formûle kiriye û di rewşa hedef û armancên bingehîn ya dîplomasiya netewa demokratîk de ye. PKK û KCK di bernameyên xwe de bi şêwazeke binê wê xêz kirî vekiriye deklare kiriye ku bi gelên din re di bingeha feraseta netewa demokratîk ya sere wê vekirî bi yekitiyên netewa demokratîk ya berfireh û hevbendiyan re vekiriye. Serokê Gelê

Kurd Abdullah Ocalan bi hevoka; ‘gotina *şoreş îfadeya hevbendiyê ye*’ vê yekê destnîşan dike. Lewma gelên bêdewlet ya ku têkoşîna azadî û demokrasiyê dikin ji bo avaniyên qewmî û hêzên derveyî pergalê hêza spartina herî mezin rastiya hevbendî ye. Di zirûfên pergal cîh nede de ya ku zirûfên dezavantaj tewazûn bike dîsa ev rastî ye. Dema ku em dîroka siyasal ya cîhanê dinêrin, di tevahî pêvajoyên kaos û krîtîk de siyaseta derve bi giranî bi hevbendiyan ve hatiye sipartin. Yê ku hevbendiyên herî bihêz ava kirine mohra xwe jî li pêşketinan xistine. Rastiya hevbendiyê xwedî wê taybetmendiyê ye ku hevsengiya hêzê ya ne xwedî wekheviyê ye bi denge (tewazûn) dike. Lewma dîplomasiya me ya netewa demokratîk wê di nava feraseta herî zêde xwe bi hevbendiyan ve sipartî de be. Îro di cîhanê de ti hêz bêyî ku xwe bispêre hevbendiyên hûndir an jî derve siyaseta xwe nikare bi bandor bike. Hêzên herî zêde lawaz jî bi saya vê dikarin li ser lingan rawestin. Wekî encam di nav rastiya cîhanê ya roja îro bi sere xwe asta têrbûna hêz di kîjan astê de dibe bila bibe bêhevbendî avakirin û xwespartina wê gihandina armancê pir zehmet e.

PKK-KCK di dîrokê de hevbendî û yekîtiyên ku di çanda Rojhilata Navîn hatine jiyîn,  rojevî kirin û avakirinê, wek tekane rêya rizgariya rasteqîn û azadiya gelên Rojhilata Navîn dihesibîne. Ji ber vê sedemê KCK çareseriya pirsgirêka Kurd di bingeha modela xweseriya demokratîk de, gelên Tirk, Fars, Erep di serî de bi avaniyên din yên qewmî, çandî û olî dîsa hêzên demokratîk yên şoreşger bi pêşxistina rewşa hevbendiyan pêştir dibîne. Gelên Rojhilata Navîn û hêzên demokratîk re bi rêgeza wekhev-azad û demokratîk re sipartî, di bingeha derdorên şovenên sosyal ya netewperest û faşîst bertaraf kirin di nava têkilî û piştevaniyê de bûyînê armanc dike. Dewletê ji demokrasiyê re hişyar kirin, pirsgirêka Kurd di serî de, bi qasî pirsgirêkên gelên din pirsgirêkên civakî zirûfên gihandina çareseriyê wê çêbike. Çareseriya pirsgirêkên dîrokî, qewmî û civakî hemû, wê were wateya demokratîkbûna herêmê. Îcar dîplomasiya me li ser hedef û armancên ewqas vekirî, şênber bi plansaziyên demkurt û navîn xwe rêxistin kirin û plan kirinê wê esas bigre.

Di pêvajoya modernîteya sermayedar de gelê ku herî zêde bûye qurbanê leystoka Kurdin. Dîplomasiya netewa demokratîk di navbera Kurdên perçe bûne û derdora berjewendiyên cûda de beşbûne avakirina

platformek hevbeş pêştir dibine. Bi pêkanîna wê, di navenda xebatên dîplomatîk de ev platform wê cîh bigre. Pêşketinên îro li Rojhilata Navîn de tên jiyan kirin ji pêkanîna platformek wisa re nêvenga erenî pêşkêş dike. Platformek wisa ku vîna hevbeş ya Gelê Kurd temsîl bike bi qasî çareseriya pirsgirêkê di îstîqrar û demokratîkkirina herêmê de wê risteke diyarker bileyize. Berovajiya wê Kurdên ku derdora berjewendiyên cûda de perçe bûne rastiya dîplomasiya ku her rêxistin û perçe bi serê xwe dike de israr kirin pir xeteriyên cidî û metirsîdar wê ava bike dîsa zirûfên ku derketine holê sûd jê wergirtine wê ji holê rabike. Lewma di navbera Kurdan de dîplomasiyek yekpare pêşxistin di destpêka erka netewî de tê. Di dema pêşiya me de xebatê herî jiyanî ya dîplomasiya netewa demokratîk yek jê jî xebata pêkanîna kongreya netewî ye. KCK di bernameya xwe de helwesta xwe di derbarê kongreya netewî de bi vî şêwazî îfade kiriye; '*Kongreya netewî ya demokratîk a mûhtemel pêwîste beriya her tiştî bibe rêxistinek mayînde û di pêkhateya wê de ji herkesî re li gorî pozîsyona wan divê cîh were dayîn, wek duyemîn divê mekanîzmayek daimî ya îcrayê ango pêwîste konseya rêvebir were hilbijartin. Wekî sêyemîn pêwîste fermandariyeke hevpar ya ku wê hêza parastina rewa ya hemû rêxistinan têde bike yek were saz kirin. Wekî dawî bi konseyê ve girêdayî komîtêya têkiliyên derve divê were ava kirin. Têkiliyên KCK û rêvebiriya herêmî ya Başûrê Kurdistanê a bi kongreya netewî ya demokratîk re, divê li gorî ku bikarin bi hev re bi awayekî hevpar bixebitin were dirist kirin. Gavên ku di aliyê komkirina kongra netewî de tên avêtin ji bo bigihîje encamê, pêwîste xebat were meşandin*'. Pêşketinên netewî û demokratîk, her wiha çareseriyên demokratîk yên di her parçeyê de, meşandina bi hêza cewherî ya ku xwe dispêre gelê li wê parçeyê û di her perçeyê de hewldana pêşxistina yekitî, piştevanî û piştgiriya bi bandor a hêzên netewî-demokratîk a di navbera xwe de, li ser vê bingehê xebatên amedekariya kongreya netewî ya demokratîk di nava xebatên bingehîn ya dîplomasiya me de cîh digre.

Zerengiyeke din a girîng ya dîplomasiya netewa demokratîk jî Kurdên ku cihên cûr bi cûr yên cîhanê belav bûne, parastina mafê wan yê demokratîk, ji bo pêşketina rêxistinbûna wan û çanda wan piştgirî dayîn, her wiha wan bi mirovahiya pêşverû û bi têkoşîna li Kurdistanê re gihandina hev e.

Zerengiya herî bingehîn ya ku dîplomasiya me wê li ser raweste helbet xebatên derbarê Birêz Ocalan de ye. Di vê dorfirehiyê de di serî de ji bo paradîgmaya nû di cîhanê de were fêm kirin danasîna her pênc parêznameyan, dîsa ji bo azadiya Birêz Ocalan li 4 perçe Kurdistan û derveyî welat kampanya û çalakiyan wekî şênber jî bi navê 'ji Ocalan re azadî' kampanya û konferansên werin lidar xistin bi bandor û daîmî kirin e. Di vê çerçeveyê de jî azadî û tendûristiya Birêz Ocalan rojev kirin, li ser vê bingehê rayagiştî ava kirin mijareke girîng ya din ku dîplomasiya me li ser bisekine ye.

Dîsa di çapa kûrewî de tevgerên demokratîk, azadîxwaziya jin ya derdorparêz, derdorên hûmanîst, rêxistin û sendîkayên civaka sîvîl, yêkîtî û odeyên pîşeyî, dezgehên ramanî, serokên girîng yê kanaatê, ronakbîr, komên zextê yên cûr bi cûr, dezgehên mafê mirovan, şaredarî, insiyatîfên cûr bi cûr yên herêmî û hwd, bi tevahî derdoran re di nava têkiliyê de bûyîn, bi vê re ev hêzên şaristaniya demokratîk platformên jorî netewan ava kirin, kongreya demokratîk ya kûrewî ya gelan ne bi navenda dewletê saz kirin, di nav hedefên dîplomasiya netewa demokratîk de cihê xwe digre.

Di vê rewşê de avaniya ku hatiye rewşa pêkhate û namzetên potansiyel wek mekanî di rewşa belav û bi perçe de bûyîna wan helbet şêwazê xebat û ferasetek cûda pêwîst dike. Lewma di dema nû de şêwazê xebatê jî şerte ku di vê guncawiyê de be. Pêwîste ji hin nêzikatiyên karkirinê yên wekî; bi hin navendên diyar re asê û xetimî dimîne, xwe dide rahênandin (xwe dide şert kirinê) xwe bidin rizgar kirin û xwe daxînin asta (tabanê) civakê. Taybetmendiyên dîplomasiya me ya ku xwe dispêre vîn û rêgeza gelparêz û şoreşger re lihevanîn enceq bi vê rêye dikare were pêkanîn.

Xaleke din a girîng jî ew e, ku em dikarin dîplomasiya xwe wek cûreya 'dîplomasiya tîrûtêr û berbelavî' pênase bikin. Di vê bingehê de divê em xebateke dîplomasiyê ya bi armancên paradîgmayî re guncaw ku xwe vesaz û bicîh kiriye, plansaziya xwe ya demkurt, demnavîn û demdirêj çêkiriye, bi şêwazeke tîr û berbelavî derbasî jiyanê bikin, encamên wê bişopînin, bêyî ku bêhnteng bibin bi nêzikatiyên vezen (esnek) û afrîner em pêşde bibin, em ji heqê pirsgirêkan derkevin û ji bo xwe bigihînin

armancê girîng e ku em şêwazê hişyar, zana û bi rêxistinkirî ku dizane çi dike bi dest bixin.

Dîplomasiya xwe wek cûreyeke tîr û berbelav me pênase kir. Tîrbûna ku li vir em behs dikin kûrbûn, dagirtîbûn û daîmî bûn e. Qesta me ji berbelav bûyînê jî her xaleke ku pewîstê em li wir bin cihê xwe bigrin û di vê bingehê de berbelav bûyînê re tevgir (kapsayıcı) bin. Vekiriye ku ev jî dînamîzmeke pêwîst dike. Lewma dîplomasiya me heman demê de statîk, ne rawestiyayî be neçar e  ku heta dawî di tempoyeke bilind de bi tevger û bi dînamîk be.

## TAYBETMENDIYÊN KU PÊWÎSTE DÎPLOMATÊN NETEWA DEMOKRATÎK TEMSÎL BIKIN

Hostatî, hûner, jîrbûn taybetmendiyên girîng ên ku di her dîplomatan de pêwîste hebin. Lê ji vê jî girîngtir dîplomatek di kesayet, jiyan û feraseta xebata xwe de ya ku temsîl bike taybetmendiyên paradîgmayê nin. Bêyî van taybetmendiyan cûdabûna xwe ji dîplomatên din hebe hîn zêde hûner û jîrbûna zêdetir be. Lê, kî, çi temsîl dike, li gorî çi dîplomasî dike ev mijar wek nepenî (mûamma) wê bimîne. Lewma dîplomatên netewa demokratîk hîn di destpêkê de diyardeya ku pêwîste cûdabûna xwe deyne holê, li gorî hişmendiya ku nûnertiya wê dike sekna têkoşîn û jiyanê ava kirin e. Bi îfadeyeke din cewher û teşeya ku di dîplomasiyê de xwedî ciheke girînge bi şêwazeke herî bi hevdû re di nava ahengê de sipartina hişmendiya netewa demokratîk ve di jiyan û xebata xwe de temsîl kirin e. Lewma dîplomatên netewa demokratîk li gel besbûna bîrdozî û polîtîk pêwîste xwedî hêza di bin her zirûfî de sekn û xebata exlaqa jiyana azad ku dikare nîşan bide de be. Kadroyeke ku hişmendiya netewa demokratîk hûndirîn nekiri ye, xwe ne gihandiye besbûna bîrdozî, polîtîk, exlaqî, rêxistinî, ne pêkane ku tevahî bîrdozî û şêwazên jiyanê wek netew-dewlet, desthilatdar, netewperest, olperest, zayendperest, lîberal, dogmatîk ku koh dike û ji heqîqetê dûr dixe vala derbixe û bibe namzeta dîplomasiya hişmendiya netewa demokratîk.

Me dabû diyar kirin ku xwezaya civakî heta dawî xwedî avaniyên cûda û pêkhateyan e. Bi tevahî avanî û pêkhateyan re meşandina dîplomasiyeke ku xwe dispêre hişmendiya netewa demokratîk, di asteke girîng de

daneheva ramyarî û çanda ramyarî ya demokratîk dixwaze. Kadroyek li ser vê neponije wekî ku zehmetî bikşîne di xebatan de jî ji zehmetî derxistinan re wê meyldar be. Di vê bingehê de ger em dest bigrin beriya her tiştî xebatkarên dîplomasiya netewa demokratîk pêwîste di asteke rast û bes de xwedî zanabûna civakî û dîrokî bin. Ji dîrokê vir de di navbera gelan, civakan, çandan de têkilî û danûstandinên ku hatiye jiyan kirin heta ku rast pênase neyê nekin û dernexin zanabûne têkilî û hevbendiyên dadmend (adil), wekhev û azad asta ku pêş bixe nikare were girtin. Di serî de dîroka xwe, dîroka gelên din û dîrokê de danûstandin, bi hev re bûn, hevbendiyên çêbûnê, pêşketinên ku hevbendiyan re vekiriye, sedemên piştre ku pêşketina xetimandiye hatine jiyan kirin di van mijaran de divê xwedî danehev bin. Bi vê re dîsa li ser dîroka têkiliyên navnetewî de jî xwedî danehev bûyîn wê awantajên xwe hebin. Qasî zanabûna dîrokî bi aktûel re jî têkildar bûyîn girîng e. Pirsgirêkên civakî di serî de pirsgirêkên demokratîkbûnê rast dahûrandin di navbera dîrok û niha de têkiliyên baş sazkirinê ve girêdayî ye. Di dîrokê de bûyerên ku hatine jiyan kirin zirûfên herî bingehîn ya ku roja me ya îro diyar dike ye. Ji bo em roja me ya îro baş nas bikin pêwîste em dîrokê baş nas bikin. Lewma bêyî ku dîrok baş nas bikin pirsgirêkên ku îro tên jiyan kirin bi tendûristî wekî ku neyê tehlîl kirin, çareseriyên baş jî nikare were hilberandin. Kesekî ku ketiye bîrê ji bo jê derbikevê yekêmîn tişta ku ji bîrê derkeve û bike, zanibe ku çawa ketiye bîrê ye. Nizanibe çawa ketiye bîrê zanîna wî ya çawa jê derkeve jî zor e. Dîrok di vê xalê de, hem hişê pirsgirêkan hem jî yê çareseriyan e. Her pirsgirêk di nava xwe de çareseriyan jî dihewîne. Her çareseriya ku bi tendûristî nehatiye fikrandin jî pirsgirêkên nû yên ku wê ji nava wê derkeve diafirîne. Niha an jî ya aktûel rewşa dîrokê xwe bi derfetên pirsgirêk û çareserî re pêşkêş kirin e. Birêz Ocalan dibêje; em dikarin mûdexelayî niha û pêşerojê bikin, bi bingeha fikrî û hêza maddî ve girêdayî dikarin ya rojane biguherin. Heman şêwazî dikarin guhertina lezgîn bikin, ber bi aliyê din ve bizivirînin, pêşeroja xwe wekî ku em azad bikin dibe ku kole jî bikin, dide diyar kirin. Ev bi temamî bi pozîsyona hêzên mûdaxele ve girêdayî ye. Ya girîng, bi xeleka esas ya dîroka borî pirsa ji niha re pêwîste çawa were têyisandin bersiva ku were dayîn e. Roja îro bi taybet pirsgirêkên dîrokê ku em pê re têkildar dibin wek îfadeya qadên têkildar tehlîl bikin û em

bizanin ku mifteya çareseriya pirsgirêkên civakî ne. Lewma yên ku ji zanabûna dîrokê bêparin, rast fêm nakin, roja îro rast fêm kirin û azad kirin, demokratîk kirin, ji pirsgirêkan re çareseriyên rasteqîn ditin wê ne gengaz be. Dîroka herî pêşketî, civak bixwe ye. Civaka ku bixwe dîrokê bi heqîqeta wê ve heta ku nas nekin ji pirsgirêkên wê rizgar kirin û gihandina çareseriyên demokratîk û şêwazên jiyane jî gengaz nabe. Di vê bingehê de dema ku nêzik dibin her dîplomat qasî zanabûna dîrokî, civakî, bi roja me ya îro re jî têkîlî çêkirin û asta ku jê re hêz bîne girtin di nava erkên sereke de ye. Bi vê ji tevahî cûdabûnên civakê re bi hûrmet nêzîkbûyin, di bingeha cûdahiyan de rastiya wekhevî û lihev kirin, qasî uslûbe nîqaşê naveroka wê, cesareta wê ya siyasî, pêşekiya exlaqî û wicdanî, bi empatî nêzikbûn, li ser mijara hakîmiyet xûlase nêzikatiya zanistî ya yekpare taybetmendiyên ku pêwîste dîplomatek xwediye wê bin e.

Tevahî hêmanên ku danehev û tecrûbe pêwîst dike ji hemûyan re gotina çanda siyasî pêkan e. Lewma dîplomatên netewa demokratîk rehende ku herî zêde xwediyê wê bin rehenda çanda siyasî ye. Çanda siyasal di wateyekî de di derbarê siyasetê de zanabûn, helwest û bawerî ye. Çanda siyasal, arastekirina agahiyên baş, hişmendiya stratejîk û teyisîna wê ya pratîk e. Yani çanda siyasî di navbera avanî û pêkhateyên netewa demokratîk an jî civaka demokratîk dîsa di navbera xwe û hemwelatiyan de hestên siyasî, bawerî, nirxwên exlaqî û polîtîk ku serwer e yekpareya ku tê ba hevdû ye. Lewma siyaset, di wateyekî de ji safoka çanda siyasetê derbasbûnê ve fealiyetên ku jiyanî dibe nirxandin pêkan e.

Çanda siyasî di heman demê de têkiliya xwe bi demokrasiya piluralîst re pir şidiyayî heye. Demokrasiya pluralîst bi tam wateya xwe demokrasî bixwe ye. Sedema vê, di pergalê de gel biryara xwe di encama lihevhatinên beramberî hev û nîqaşan de digre wek taybetmendiya sereke ya vê pergalê ye. Di çanda demokrasiya pluralîst de empatî, xweşbînî, lihevhatinên demokratîk û azadî hêmanên devjênayêberdan in. Lewma cûdabûn, pir dengî, bi cûdabûna ve sipartî wekhevî û azadî adeta rihe demokrasiya pluralîst e. Moderniteya demokratîk, di bin her zirûfî de jiyanê bi tevahî reng û cûr bi cûrbûna wê ve azad, wekhev û demokratîk kirine, wek hişmendî û avanîbûna wê me pênase kiribû. Lewma

modernîteya demokratîk, li hemberî rastiya netew-dewlet ya gerdûnîparêz, rast pêşdeçûn, misoger, ji alternatîfa re girtî, civakê homojen kirinê re civakan veguherandina girseya pez ji avabûnên siyasî ya cûda re vekirî pir dengî, pir çandî, di navbera pêkhate û avaniyan de tewazûn pêşxistinê armanc dike. Yekbûna wê bi wekheviyê ve sipartî, li ser cûdahiyan avaniya ku ava dike nêzikatiyeke alternatîf temsîl dike. dîplomatên ku tevahiya esasan wek hişmendî û şêwaza jiyanê kiriye taybetmendî û helwest, ji çandên avaniyên piralî bawer dike, zanabûndaneheva xwe sipartiye rastiyên dîrokî û civakî dîsa xwedî çanda siyasal demokratîk, pluralîst û di bin her zirûfî de rêgezî dest digre bêyî ku tawîzan bide pêk tîne wêrek, dînamîk, bi irade, li pey heqîqetê dibeze, erkên xwe yên exlaqî, polîtîk û entelektûel bi hestê berpirsiyariyeke mezin dikarin bînin cîh.

Îro di navbera netew-dewletan de têkiliyên ku tên meşandin wek pêwîstiya xwezaya wê dîplomasiya wan jî zayendperest e. Lewma wekî di pir xebatan de di dîplomasiya navnetewî de jî ji jin re pir kêm cîh tê danîn. Yên ku cîh jî tê danîn herî zêde ji têkiliya mêtingeriya pergalê re guncaw, bi feraseta nezî taybetmendiya zilam temsîl û tevlîbûna xwe çêdikin em dizanin. Ji jin re di nava pergalê de di rêjeya ji cewherê xwe dûr ketin û ji xwe beyanîbûnê de cîh hatiye dayîn. Lewma nirxên şaristaniya demokratîk xesp kirin û ji wê derketinê re pergala hegemonîk ku pêş xist heta roja me ya îro di xebatên dîplomasiyê de qasî ku jin mêtinger kiriye di bingeha ji têkiliya mêtingeriyê re guncaw bikaranînê dest girtiye. Di xebatên dîplomasiya netewa demokratîk de cihê jin û girîngiya wê di dîrokê de rista wê ya pêşengtiyê û di avaniya ji hêza wê ya civakî re wê denk be (hevseng be). Wekî tê zanîn hêza pêşeng ya civaka xwezayî û zanaya wê jin heman demê ji şoreşa neolîtîk re hem hilberîn hem jî fikra wê re pêşengtî kiriye. Qasî nirxên exlaqî û polîtîk ku civakê ava dike xweditiyê dike nirxên ku mijara gotinê ne herî zêde jî di taybetmendiya jin de hebûna xwe didomîne ev jî di xebatên dîplomasiya netewa demokratîk de mîsyona ku jin bileyize binirx dike. Pir têgehên girîng ku îro ketine lîteratûra dîplomasiya me aşitî, piştevanî, empatî, feydeya hevbeş, wicdan, exlaq, biratî, azadî, wekhevî, demokrasî û hwd, têgehên wisa hîn nêziktirî taybetmendî û hestên jin e. Jin di pêşketina van têgehan de risteke girîng leyistiye. Li gel tevahiya van hîn zêde civakîbûyîna jin,

hûnera wateyên cûda yê ziman fêm kirin-tehlîl kirin û axaftinê de bi hêz bûyîn di van xebatan de hîn aktîfbûyîna jin pêwîst dike. Wek encam kadroyên ku dîplomasiya netewa demokratîk bimeşînin di serî de pergala hegemonîk ya cîhanê fêm kiriye, fikrên paradîgmayî, hişmendiya netewa demokratîk hest û fikrê wê hûndirîn kiriye, bi vê re nemaye kiriye şêwazê jiyan, zana, gihaştî, serwer, bi rêzdar, xwedî ezmûn (tecrûbe), xwedî exlaqa baş xûlase di jor de tevahî taybetmendiyên mirovên zana ku me li jor hejmartin jin û zilamên ku bi taybetmendiyên xwe re kiriye yek avabûna wê heta dawî girîng e.

## PIRSGIRÊKÊN KU DÎPLOMASIYA ME JIYAN DIKE Û JINÛVE AVAKIRINA DÎPLOMASIYA NETEWA DEMOKRATÎK

Xebatên me ye dîplomasî berÎ vÊ jî hin pirsgirêkên avanî û teşeyî jiyan kiriye. Lê bi taybet dema ku em berê xwe didin avakirina netewa demokratîk paradîgmaya nû û esasên bername dema ku em balê dikşînin qada xebatê ya herî girîng yek jê ku pêwîste li gorî rihe paradîgmaya nû jinûve were ava kirin xebatên dîplomasî ye. Xebatên me yên dîplomatîk hîn taybetmendiyê wê yê ji xwe re xas ava nebûye. Li beranber çawaniya xebatên xweser di me de wek şaxê kêlekê ya xebatên siyasî û feraseta êniyê derbas nake wek rastiye. A rast di bin siya pir xebatan de perçiqî maye. Tam jî di vê xalê de taybetmendiyeke xweser avanekirina dîplomasiya me bi temamî sedemên derve û nêzikatiyan ve girêdan -bandora wê hebe jî- di jinûve ava kirinê de wê ji çareseriyê re alîkarî neke. Lewma em qebûl bikin ku xwedî rastiyeke hîn bi pirsgirêk ku lêpirsînek kûr pêwîst dike. Di çapê tewazûna herêm û cîhanê de tevgereke ku encam û bandoran re rê vekiriye, dînamîk bûye, tevgera girseyî ku xwe gihandiye milyonan dîplomasiya wê ewqas lawaz rewşeke bi nakok e. Gelên ku bi mêtingeriyê tên birêvebirin di têkoşîna xwe de ji bo herdemê xala wan ya herî xurt bi potansiyela berxwedanê ve girêdayî hêza wan ya bi vîn bûye. Lê li gel vê heman hûnerê di dîplomasiyê de nîşan nedayîn jî aliyên wan yê lawaz bûye. Di rewşa ku ev têwazun baş were saz kirin wendahiya enerjî were asteng kirin, hem parastina destkeftiyan hem jî di pêşketina wê de misogere ku wê encamên girîng derbixe holê.

Wekî pir berxwedanên dîrokî li beranber KT berwedana Zap'ê dîsa li hember Îran'ê berwedana Qendîl'ê de jî têknolojiya şer ya herî pêşketî ku ev hêz bikaranîbûn bê encam mecbûr mane ku vekişin. Serokê serleşkeriya giştî ya Tirk ya wê demê wekî ku mîsyona wan paşvekişînê li hember berxwedana Zap'ê gotina '*Wekî ku em ji nivîşke mû bikşînin me bi awayekî serkeftî xwe paşve kirşand*' di esasê xwe de bi zimanek din bûye îfadeya gotina ku dibêjin 'destê ku me nikaribû xwar bikin em mecbûr man maç bikin'. Aliyeke me ewqas hêz û îrade girtiye aliyê me ye din jî di bin siya wê de wek xala ku bi zorê tê dîtin maye.

Di derbaskirina wê de aliyê ku bingehîn were lêpirsîn kirin ne dezawantajên sûbjektîf rastiya me ya cîvakî, dîrokî û diyardeya çanda ku bi me re avabûye ye. Yek ji armancên herî bingehîn ya şoreşa sedema bingehîn ya ku rastiyên ku avabûna wê re rê vekiriye guhertinê re aliyên me yê lawaz maye bi hêz kirine. Wekî em dizanin yek ji sedema wek mêtinger mayinê jî aliyê gel yê lawaz ku mekanîzmayên mêtingeriyê xwe li ser ava dike ye.

Di pêvajoyên krîtîk ya dîrokê de dîmeneke heta dawî bêbandor nîşandayîna Kurdan hiştiye ku pozîsyona ku ji wan re hatiye diyar kirin de bimînin û di serî de hêzên hegemonîk netew-dewlet jî bûne hêzên ku wan diyar dike. Rûxmê bi milyonan alîgir û sempatîzanan dûrî vê rastiyê xwedî dost bûyîna me –ku piraniya van dostan bi hewldan û derfetên Serokatî hatine çêkirin- di aliyê me de mijareke fikirandinê ye. Pirsgirêkek têkoşîna me jî pirsgirêka xwe vegotin e. Em nikarin bêjin ku vê pirsgirêkê di rewşa heyî de me çareser kiriye. Cîhaneke ku xwe vegotin jixwe pir zehmete, derfetên ku bûne malê mirovahiyê bi şêwazeke bes, têkûz û rast bêyî ku bikarbînin li benda hinek din werin me fêm bikin, dema ku fêm nekirin jî gazin kirin rast nabe.

Ev rastî dema ku ber çav tên kirin dîplomasiya xwe careke din înşa kirin û gihandina pergaleke diyar mijareke ku lezgînî dixwaze ye. Di sala 2013'an de konferansa dîplomasî ya ku hate lidarxistin biryara navenda xebata girtina Rojhilata Navîn hatibû girtin. Bi vê ve girêdayî di binyada KCK'ê de partî, şaredarî, jin, ciwan, saziyên civaka sivil û hwd, tevahî avanî û pêkhateyên ku cîh digrin têkiliyên xwe yên derve yên taybet –ku piranî jî heye- her yek bi nasnameya xwe xebata dîplomasî dimeşîne. Dema ku

pêwîst bû her avanî mijarên ku avaniyên din û pêkhateyan têkildar dike divê têkilî pêş bixe, di hûndirê xwe de piştevaniyeke diyar divê pêş bixin. Dîsa her avanî û pêkhate di serî de bi perçeyên din ya Kurdistanê welatên tên zanîn Rojhilata Navîn û çapê cîhanê bi gelên din re ji formatê wan re guncaw bi hêz û avaniya wan re divê di nava piştevanî û têkiliyan de bin. Mînak şaredarî, welatên têkildar, herêm û cîhanê de bi pir şaredariyan re di bin hin navan de têkiliyên piştevaniyê dikarin pêş bixin.

Bi vê re îro hejmara kadroyên ku xebatên dîplomasî dimeşînin pir kêm e. Sedema vê ji daneheva kadro re girîngî nedayîna me ye; bi xebatên rojaneyî ve girêdayî, feraseta kadro ya guherîner xebatên me yê dîplomasî vekireye ku nayê asta profosyonel bibe û pirsgirêkê çareser bike. Lewma xebateke ku lezgîn were kirin yek jê jî navenda KCK di serî de her avanî û pêkhateyên di binyada wê de ji hişmendiya modernîteya demokratîk û netewa demokratîk re guncaw kadroyên profosyonel ava dike pêş xistin e. Akademiyên ku werin vekirin pêşketina daneheva kadro, dîplomasiya me gihandina pergalê, ya herî girîng jî li gorî hişmendiya netewa demokratîk namzetên dîplomasî derxistinê de wê risteke girîng bileyize.

Di şêwaz û rêbazên xebatên me yên dîplomatîk de jî amatorî heye. Mînak feraseta dîplomasiyeke me tenê di arasteya daxwaz û pêdiviyên rojane tevdigere mijara gotinê ye. Çanda dîplomasiya me ya ji xwe re xweser nîne. Di roja me de dîplomasî êdî ji salona derketiye kolana, asteke bi zêdeyî dînamîzm dixwaze girtiye. Bi dosya kar kirin, karê ku tê kirin şopandin, bi plan tevgerandin, ji bo gihandina armance xisûsên ku hatine piştrast kirin in. Van xisûsan derveyî ezmûn fêrbûn helbet di binyada xebatên akademiyê de tiştekî bibe ye. Me dabû diyar kirin ku dîplomasiya me, wek stratejîk û taqtîkî li ser du lingan tê meşandin. Ev, dîplomasiya ku bi pêkhateyên netewa demokratîk re were kirin û dîplomasiya ku bi netew-dewlet û saziyên jorî netewan were kirin e. Li vê derê xala ku were zelal kirin di van her du qadên xebatê de kadroyên ku kar bikin wê ji heman kadroyan be an nebe ye.

Her du qad di cewherê xwe de xwedî taybetmendiyên cûda ne, di asteke de cûda kirinê berçav dike. Dîsa xweseriya kadroyên di her du qadan de kûr bûn û di encama wan şopandinan de jî bi şerta ku navenda wan yek be ji kadroyên cûda ava kirin dibe ku hîn bitendûrist be.

Wek encam bi giştî serkeftina têkoşîna me hatiye piştrast kirin ku bi rêxistinî bûn xebata rêxistinî ve girêdayî ye. Hele hele saha xebateke wek dîplomasî heta dawî tevlîhev û hesas de tewereya hişmendiya nû de, pêvajoya ku em têre derbas dibin wek stratejî û taqtîkî denk dikeve, şêwaza rêxistinî û kordîne em dernexin holê encamên cîdî girtin aliyeke derfetên heyî jî dibe ku em heba bikin. Lewma ev pêvajoya ku di pir qadên ku têkoşîna me pêş ketiye, bandora me zêde bûye, di pir qadan de faaliyetên dîplomatîk em dimeşînin û jinûve xwe ava dikin veguhertinên pêwîst kirin, rêxistinî û bi vê rêxistinbûnê hem giştî hem jî di herêmê de gihandina koordînasyonên bi hêz tevahî qadan di vê bingehê de bi hevdû re têkildar kirin û anîna rewşa temam kirinê ya herî girîng jî di vê qadê de pergala dîplomasiya xwe ya xas pêşxistin, bisazî kirin erkên ku bêyî ku paşde werin dayîn bicîh anîne ne.

## BEŞA 3

## TAYBETMENDIYA DÎPLOMASIYA KU BI DEWLET HÊZÊN NAVNETEWÎ Û SAZIYÊN JORÎ NETEWANWERE MEŞANDIN

Yek ji lingên ku wê xebata dîplomasiya KCK bimeşîne, bi dewletan re, bi saziyên navnetewî û bi saziyên jorî netewan re dîplomasiya ku wê bê meşandin e. Di vê beşê de giranî dorfirehiya dîplomasiya ku bi hêzên mijara gotinê ne were kirin, armanc û naveroka wê ve girêdayî perspektîfek derxistinê em ê hedef bikin. Dîsa di hûndirê mijarê de bi dewletan re hevdîtina ku were kirin, taybetmendiyên giştî ya mijarên diyalog û mûzakere, şêwaz-çawaniya wê, bingehên wê yên stratejîk û taqtîkî, xalên ku nûner an jî dîplomat baldar be û girêdayî berpirsiyariyê em ê hewl bidin perspektîfeke derbixin. Helbet dema ku em vê dikin, li ser mînakên hatine jiyîn, yên tên jiyîn û yên dibe ku werin jiyîn em ê hewl bidin mijar were fêm kirin.

Beriya her tiştî tevgera PKK li hember tesfiye û êrîşên hûndir û derve wek leşkerî, siyasî û bîrdozî têkneçûna xwe piştrast kiriye û ji herkesi re daye qebûl kirin. Di cîhan û herêmê de li gorî rihê serdemê û demê xwe li gorî zirûfên nû lê aniye, veguhertinên pêwîst bi afrîneriyek mezin ser xistiye. Dîsa bi alternatîfa modernîteya demokratîk sekna xwe li beranber modernîteya sermayedar di bingeha serkeftinên polîtîk hîn bi rêgezî

kiriye. Di asta ku nikare were înkar kirin xwedî ezmûn û daneheveke mezin ya girtîn e (muazzam e). Di nîvê Rojhilata Navîn de (gotin cîh de be di sifra guran de) navenda ku nakokî û pevçûn pir tîre bi çanda berxwedaneke mezin têkoşîna xwe tîr kiriye û bi Gelê Kurd di veguhertina demokratîk ya şoreşgerî de rista xwe ya sereke bi vîn û biryardariyeke mezin didomîne. Di dîroka têkoşînê ya 40 salan de her çiqas hîn bi temamî negihîştibe hedefa xwe jî di nava Gelê Kurd de bi gelek guherînên kokdar yên di asta şoreşê de ne, pêk aniye, ji bandor kirinên asta herêmî re rê vekiriye, siyasetên çors yên înkar û tinekirinê bêkêr kiriye û vala derxistiye; hema bêje afirandina miletekî ji xweliyê xwe, serxistiye. Êdî îro rastiya gelekî ku ketiye ferqa xwe, heqîqeta xwe dikare biaxive û dikare biparêze, ji nasnameya azad, vîna jiyana azad bawer kiriye derketiye holê. Hin pirsgirêkên xwe hebin jî di rewşa heyî de Kurd bi PKK'ê re hêza xwe ya cewherî derxistine holê, wek gelek bi vîn û rêxistinî tewazûna dikare bandor bike û diyar bike pozîsyoneke dînamîk û diyarker girtine.

Xala ku Gelê Kurd hatiye û têkoşîna wan ya ku didome rastiya guhertina nû ku jiyan dike çareseriya pirsgirêka Kurd aniye merhaleyeke zarûrî ku nebe nabe ye. Kurd, ji bo pirsgirêka ku gelê herêmê dijî, bi paradîgmaya xwe ya nû xwedî perspektîfa herî rasteqîn û alternatîf û ji bo pêşeroja herêmê û gelan hatiye asta ku ronak be. Pirsgirêka Kurd di destpêka pirsgirêkên herî sotîner û bingehîn de tê. Demokratîkbûna herêmê (ronesans) gihandina îstîqrar û aşitiya rasteqîn wekî ku bi çareseriya pirsgirêka Kurd ve girêdayî ye rêya çareseriyê jî paradîgmaya nû wek rih, hişmendî û beden ji avakirinê derbas dibe.

Perspektîfa çareseriya pirsgirêkên ku li herêmê tên jiyan kirin ne rastiya netew-dewlet ne jî projeyên ku hêzên hegemon ji gelan û herêmê re disepîne ye. Çareseriya rasteqîn wek 'Xeta Sêyemîn' alternatîfa modernîteya sermayedar modernîteya demokratîk e. Wek rehendên bingehîn ya modernîteya demokratîk rastiya civaka ekolojîk-exlaqî û polîtîk paradîgma ku çanda cografya esas digre ye. Hişmendiya netewa demokratîk ya modernîteya demokratîk û avaniya xweseriya demokratîk ji vê rewşa kaosê derketinê de modela herî guncaw ya wekhevî, azadî û demokratîk e. Paradîgmaya nû nûnertiya hişmendiya di serî de tevahî

gelan, civakan, olan û mezheban tevahî cûdahiya li ba hev, bi şêwazeke wekhev û vîna azad, di nava xwişk û biratî, aşitî û ewlehiyê de dikare bijî dike. Wekî rêxistina sîwan ya tevahî yekparebûna çandî wek modela konfedarasyona netewan ya demokratîk a Rojhilata Navîn esas digre.

Kurd rûxmê asta ku îro gihanê hîn jî bi pirsgirêkên pir cîdî yên dîplomatîk re ji rû bi rû hatinê rizgar nebûne. Beriya her tiştî bi têkoşînê li ser wan polîtîkayên qirkirinê ya înkar û tinekirinê di astekî de bê karîger mabe jî, wek fermî hebûna wan ji ber nehatiye qebûl kirin xeteriya polîtîkayên mijara gotinê ji holê ranebûye. Bi vê re di serî de PKK, KCK pir organizasyon bi kadroyên xwe yên pêşeng pergala navnetewî û wek rêvebirê wê di aliyê hêzên hegemonîk bi şêwazeke neheq girtine lîsteya terorê. Ev, tevî ku pirsgirêkên heyî hîn bêhtir dike rewşa qeyranê, bi pêşîlêgirtina legalbûna têkoşînê, zêdebûna lezbûna wê, bidestxistina zemîna rewabûna wê, pirsgirêk tê kûrtir kirin.

Vîna Gelê Kurd dema ku nayê nas kirin jî bi rêbazên siyasal demokratîk çareser kirin û di vê çarçeveyê de zirûfên dîplomasî kirinê ji holê tê rakirin.

Kurd li cem hin gelên din di cîhanê de mileteke ku xwedî gelheyeke nifûseke pir zêde û bêdewlet mane û li ser axên xwe bi şêwazeke azad nikare jiyan bike ye. Bi vê îro di NY de pir gelên bêdewlet herî kêm di asta çavdêr de statûya wan ya fermî rûxmê ku hatiye qebûl kirin Kurd gelheya wan ku 40 milyonî derbas dike û têkoşîna wan di statûyeke wisa de qebûl kirin jî ne mijara gotinê ye. Ya ku ji vê re rê vekiriye di cewher de pergala hegemonîk ya navnetewî ji berjewendiyê xwe re guncaw nedîtiye. Di serî de komara Tirkiye, dewletên din ên herêmî yên ku xebatên dîplomatîk ên dijber dimeşînin jî di nava van karîgeriyên (faktorên) ku rê li ber rewşeke wiha vekiriye nin.

Wekî ku me li jor diyar kir îro di cîhanê de di serî de wek xwedî gelheya herî zêde Gelê Kurd pir gelên bêdewlet hene. Statû û vîna van gelan ji aliyê pergala navnetewî ji ber ne hatiye nas kirin û qebûl kirin, bi giştî wekî ku ji zirûfê têkoşîna wan re astengî û zehmetî tên derxistin, têkiliyên dîplomatîk pêş xistin, xebat meşandin û di vê qadê de di mijara li ser dika cîhanê de cihê xwe girtinê de jî astengiyên cîdî yên siyasî û hiqûqî tên

derxistin. Li vê derê pirsgirêka bingehîn, gelên bêdewlet di serî de di rehendên dîplomatîk û yên din de pirsgirêka xwe temsîl kirine. Di rastiya cîhanê ya bi du qûtûb de dîsa li ser teqala *Koma Negirêdayiyan*, ji tewazûnan sûd wergirtinê re, gel di astekî de hin derfet û zirûfên xwe îfade kirinê girtine. Di roja me de ev derfet û zirûf bi temamî ji holê rabûne. Valatiya heyî enceq têkoşîne hîn tîr kirin û bi gelên din, çand, etnik, olî, mezhebî û tevahî avaniyên ku pergal derve dihêle bi hêzên mûxalîf yên navpergalî re di bingeha rêgeza wekhevî, azadîxwazî û demokrasiyê de qadên têkoşîna bi vîna hevbeş afirandin û di nava yekparebûn û piştevaniyê de tevgerandinê re dagirtin pêkan e. Cewherî nirxên îro çawa ku bi têkoşîne hatibin ava kirin li ser feraseta nû zirûfên dîplomatîk jî enceq bi vê şêwazê em dikarin ava bikin.

Wekî duyemîn jî îro pergala hegemonîk ya navnetewî û avaniya wê ya netew-dewlet di rêjeya asta pêşketî ya serdema me hevnegirtî lihevnekirî, bipevçûn û qeyranan re rû bi rû ye. Pergal ji bo ji vê qeyranê xwe rizgar bike avaniya netew-dewlet ku xwe li ser ava kiriye veguhertin zarurî bûye. Yan serdestiya xwe li ser civakê wê hîn mutlaq bike otorite û zexta xwe bi hîn zêde kirinê re ji bo pergalê wê veguhere avaniyeke ku krîzên hîn kûr re rê vebike yan jî wê ji evîndariya xwe ya tekane desthilatdar bûyînê devjê berde – yanî erka rêvebiriyê ji navendê ber bi herêmê ve bi parvekirinê re mafê gelan ya siyaset kirinê, di pêşiya rêxistinbûna di bingeha exlaqî û polîtîk de tevahî astengiya rakirin- civakê di bingeha wekhevî, azadî û demokrasiyê de pirsgirêkên ku bi dewletê re jiyan dike ji bo çareseriyê xwe ji rêgeza çareseriya demokratîk re vekirî bike.

Di rêgeza çareseriyê de xisûsa bingehîn; dewlet+demokrasî saziyên demokrasî û saziyên dewletê di nava lihev kirin û aştiyê de, vîna bi hev re rêz (hûrmet) nîşandayîn, hiqûqa hevdû nas kirin û li ba hev jiyan kirinê re girtina bin ewlehiya makezagonî ye. Îcar netewa demokratîk dîplomasiya ku bi dewletan re bike; di serî de Tirkiye, Îran, Sûriye, Iraq ku di navenda pirsgirêka Kurd de cîh digrin dewletên herêmî û cîhanê; ji nêz ve sazî û dezgehên jorî netewan ve vîna gihandina zemîna hiqûqî, girtina bin ewlehiya makezagon, naskirin, jê re rêz nîşandan, nêzîkatiyên astengdar derbas kirin û polîtîkayên neyînî derbaskirinê dike mijar. Ev hêz û

derdoran ji pêvajoya çareseriyê re piştgirî kirin û piştevaniyê nîşandayînê tewere digre.

## PIRSGIRÊKA CIVAKÎ Û ÇARESERIYA WÊ YA SIYASÎ

Pirsgirêka civakî beriya ku pênase bikin rewşa xwezayî ya civakê a berê pênase kirin wê pênasekirina me ya pirsgirêkê re alîkar be. Hema civakek an jî civatek şayet bi şêwazek azad avaniya xwe ya exlaqî û polîtîk dikare ava bike û eger li gorî vê bijî ji wê rewşa civakê re civaka xwezayî an jî civaka demokratîk gotin pêkan be. Di vê rewşê de tevna exlaqî û polîtîk ku civakê dike civak û bi vê tevnê azad jiyan kirinê.

Ger balê bikşîne dema ku me civakê pênase kir li ser du diyardeyan pênase kir. Yek ji van hebûna avaniya civakê, ya duyemîn ji vê hebûna avanî re nirxên ku wate û xebitîn didin yani tevna exlaqî û polîtîk e. Bi vî şêwazî dema ku pirsgirêka civakê jî pênase bikin li ser du diyardeyan pênase kirin gengaz e. Ya yekemîn; avaniya civakê bi temamî dema ku tê hedef girtin bi pirsgirêkekî pir mezin re rû bi rû tê mayîn. Ya duyemîn jî hebûna civakî bêyî ku tevahî were hedef girtin lê jiyana civakî tevn û nirxên ku wate û xebitîn dide dema ku hedef girtin jî bi xwe re pirsgirêkek mezin derdixe holê. Ya herî xirap hem hebûn hem jî tevn û nirxên ku hebûnê watedar dike û karîger dike bi hev re hedef girtin e. Ji vê pirsgirêkê cîdîtir pirsgirêkek din nîne. Di vê rewşê de civak ji civakbûnê tê derxistin. Civakekî ji polîtîka azad û exlaqê bêpar hiştin heman demê de wek pirsgirêka civakî ya herî cîdî ku qesta hebûnê dike pênase kirin pêwîst e. Di cewherê yekdestiya desthilatdariyê de ji bo xespa nirxên ji ber mayî diyardeya civakî du şêwazê êrîşê ku me li jor diyar kir di navhev de bi bikaranînê re çawa êrîş dike û civakan tîne çi rewşê ji mînakên dîrokê em baş dizanin. Mînakên vê yên herî trajîk yek jî li ser Gelê Kurd û civaka wê înkar, îmha û polîtîkayên bişavtinê ku tê pêkanîn e. Ti avaniyên civakî wek bandorên avabûnê exlaq û polîtîkaya civakî ku bi tevn xwe ava dike nebe nikare hebûna xwe ya cewherî bidomîne. Civakek tevna xwe ya exlaqî û polîtîk azad jiyan neke nikare hebe. Ji bo bikaribe xwe bidomîne ger saziyên xwe yên exlaqî û polîtîk ya pêwîst ava bike û nikaribe bide xebitandin, ketiba rewşa xebitîn nekirine di cendereya zextê de ye. Rewşa şer rewşa bê aşitî ye. Lewma aşitî enceq di bingeha parastina cewherî de

dikare bi wate bibe. Pêkanîna aştiyê parastina cewherî ya civakan yanî taybetmendiya civakê ya exlaqî û polîtîk were parastin û qewî bikin dikare bigihîje wateya xwe ya rast. Derveyî vê her nêzikatî navê wê re çi were gotin bila were gotin ji xapandinê zêdetir tiştekî din îfade nake.

Aşitî ne bi temamî rewşa şer ji holê rabe ye ne jî îstîqrar û rewşa bêşer ya di bin aliyê serketî de ye. Di vê rewşê de yekemîn; aliyan bi temamî bêçek kirin nikare were pêşditin. Duyemîn; misoger serketina aliyeke ne mijara gotinê ye. Sêyemîn; di van zirûfan de alî di çareseriya pirsgirêkan de ji xebitîna saziyên exlaqî û polîtîk ya civakan re bi hûrmet bûyînê dipejirînin. Şerta ku jê re dibêjin çareseriya siyasî di vê çarçeveyê de dikare were pênase kirin. Agirbesteke ku çareseriya exlaqî û polîtîk nehewîne wek aşitî nikare were şîrove kirin. Di bin vê zirûfa aşitiya rêgezî de siyaseta demokratîk girîngiyek jêneger digre dest. Saziyên exlaqî û polîtîk dema ku dixebitin wek xwezayî pêvajoya ku derdikeve holê dibe pêvajoya siyaseta demokratîk. Di tahlîla dawî de aşitî wek lihevkirina bi şert ya demokrasî û dewletê jî dikare were pênase kirin. Ev di çarçeveya dewlet+demokrasî çarçeveya zagonî û hiqûqî ku her du alî lihev bike, vîna hevdû re rêz nîşan bide pêvajoyeke ku dikare were jiyan kirin e. Helbet ev rewş nayê wê wateyê ku di navbera aliyan de qet pirsgirêk û nerehetî nayê jiyan kirin. Alî pirsgirêkên ku derdikevin bi diyalog û muzakerayan çareser kirinê esas digrin. Lê aliyek vîna xwe bikşîne pevçûn û rewşa şer dibe ku bikeve rojevê. Di hin rewşan de ji aliyekî ve pêvajoyên bi rengî bi nêzikatiyên taqtîkî meşandin, westandina giran, piştgirî an jî meşrûiyeta xwe wenda kirin bi van rewşan vê girêdayî wek merhaleyeke jinûve amedakariya şer dest girtin jî dibe ku bê jiyîn. An jî hêviya wekî ku wê çareser bike afirandinê re ji demê re belav kirin û bi armanca tesfiye kirinê dibe ku bikeve nava nêzikatiyeke taqtîkî. Di dîrokê de mînakên vê bêhejmar hatine jiyîn. Du hêzên ku bi hevdû re di nava şer de ne, eger nekarin hevdû bin bixin an jî bawer bikin ku bi şer nagihîjin encamê, di hin rewşan de jî wek rêgezî eger biryar bigrin ku bi şer naçin encamê lewma dev ji şer berdin û ji bo encamgirtinê dest bi rêbazên siyasî bikin, wê çaxê rêya çarseriya demokratîk tê rojevê.

## BINGEHÊN DÎPLOMASIYA KU BI DEWLETAN RE WERE KIRIN

A rast dîplomasiya ku bi dewletan re were kirin; dewletên pêwendîdar çareseriya pirsgirêka Kurd bi riya siyaseta demokratîk û mûzakere kirin û qebûl kirinê digre nav xwe. Di sernivîsên berê de jî wekî ku me da diyar kirin di çareseriya pirsgirêkan de mûzakere di encama daxwaz û vîna her du aliyan pêvajoya ku pêş dikeve ye. Lewma ji aliyeke yek jê wek rêgezî jê re vekirî be lê aliyê din jê re girtî be nîşan dide ku berfirehiya çareseriya demokratîk de zemîna ku pirsgirêk bi rêbaza mûzakere dest girtin ava nebûye.

Çareseriya demokratîk di asta nav de rewşa wê ya ku şênber bûye wek temsîla Kurdan KCK ye. KCK wek rêgezî ji bo çareseriya pirsgirêkê di bingeha wekhevî, azadî û demokrasiyê de daye xûya kirin ku vekiriye. Di vê rewşê de dewletên pêwendîdar jî bi şêwaza ku ji rayagiştî re bidin bawer kirin ku ji çareseriya demokratîk re vekirîne an jî ji mûxatabe xwe re bi şêwazeke fermî ragihînin pêvajoya diyalog û mûzakere wê despêbike. KCK di pirsgirêka Kurd de ji netew-dewlet xwe şûştiye tenê ne ji bo Kurdan ji bo tevahî civatên netewî modela çareseriya netewa demokratîk ku derbasdar e ifadeya wê ya pêşniyar kirin û pratîk kirinê ye. Lewma KCK rêya aşitî û çareseriyê lingên bingehîn ya modernîteya demokratîk aboriya bazara civakî ya bê kar, pîşesaziya derdorparêz (ekolojîk) û netewa demokratîk jîyanî kirinê de dibîne.

Di vê bingehê de sekna KCK ya rêgezî ji aşitî û çareseriya siyasî re vekirî û di pozîsyona dest dide de ye. Ger dewletên pêwendîdar li hember pozîsyona KCK ya dest dide pêşnûmeyên xwe yên qirkirina çandî ya sergirtî ku li ser Kurdan pêk tinin, ji polîtîka û pêkanîna wê devjêberdin astengiyên pêşiya çareseriya siyasî rakin, netewa demokratîk di serî de aboriya bazara civakî û pîşesaziya derdorparêz gihandina statûya makezagonî ya demokratîk biprejirînin wê rêya aşitiya mayînde û çareseriya siyasî jî vebe. Li vê derê çareseriya demokratîk di cewherê xwe de bûyîna netewa demokratîk û civak xwe wek civaka netewa demokratîk avakirin e. Di vê çarçeveyê de di rêgeza çareseriya demokratîk de xisûsa bingehîn; saziyên demokratîk û saziyên dewletê vîn û hebûna hevdû bêyî ku bispêrînin karê di çarçeveya dewlet+demokrasî bi hev re jiyankirinê girtina bin misogeriyê ye.

Vekirin pêwîst be bixwaze kêm netew bi xwaze piranî be, ji zimanên cûda etnik û netewan bin çi dibin bila bibin mafên ferdî û bi şêwazeke azad mafê îfade û rêxistinbûna tevahî beşên civakê li beranber dewletê girtina bin misogeriyê îfade dike.

## BERFIREHIYA DÎPLOMASIYA KU BI DEWLETAN RE WERE MEŞANDIN

Berfirehiya dîplomasiya netewa demokratîk ku bi dewletan re were meşandin di sernivîsa berê de esasên ku me dabû îzaha wê ya hîn fireh û mûzakereyên ku bi dewletan re were kirin xalên bingehîn ku di çareseriya makezagonî ya demokratîk de bikin mijar çi nin, digre dest. Bi îfadeyeke din tê wateya wergiriya firehkirina xebatên me ye dîplomatîk û kûrkirina wê. Beriya her tiştî wekî di tevahî xebatên me yên din, di navenda dîplomasiya ku bi dewletan re em bikin bênîqaş azadiya Serokatiya me cîh digre. Bi şêwazeke pir şênber nêzikatiya ji Serokatiya me re asta nêzikatiya ji pirsgirêka Kurd û çareseriya wê diyar dike. Di vê çarçeveyê de dema ku em dinêrin azadiya Serok APO hinceta hebûn û azadiya me, tesîsa azadî û wek şerta devjê nayê berdan ya yêkîtiya azad demokratîk ya gelan em dihesibînin. Jixwe KCK ji bo çareseriya aşitiyane demokratîk di diyalog û mûzakereyan de Serok APO wek mûxatabê tekane û bi navê tevgera me wek hêza biryarê payedar û stratejîk pejirandiye.

Bi Tirkiyê re çareseriya demokratîk ku were pêşxistin ji bo pêk were cihê Serok APO di girîngiya stratejîk de ye. Heta rewşa heyî jî serokatiya me ji biratiya gelan û ji bo aşitiya bi rûmet rista pêşengtiyê kiriye vê rista serokatî bigrin dîqatê ti pêşnûmeya çareseriyê ku azadiya wî esas nagre zemîn û şensê pêkhatina wan nîne.

Bi vê re li derveyî welat her cûre çalakî, kampanya, konferans, di civîn û forûman de azadiya Serok APO rojev kirin, paradîgmaya wî dayîna nas kirin, wek erkê esasî ya xebatên me yê dîplomasî pêwîste were dest girtin. Di çareseriya siyasal demokratîk ya pirsgirêka Kurd de mijareke din ya sereke pirsgirêkê rast, rasteqîn û bi şêwazeke vekirî pênase kirine. Pênaseya pirsgirêkê dema ku tê kirin têgeh (Kurd, Kurdistan) vekirî û di cihê wê de bikar anîn pir girîng e. Pirsgirêkek çiqasî rasteqîn û radîkal were pênase kirin çareseriya wê jî di wê astê de rasteqîn û radîkal dibe. Pirsgirêkan bi têgehên wê pênase kirin polîtîkayên heyî ya îmha-înkar û

bişavtinê wekî ku were wateya devjê were berdan wê mecbûriyeta lêgerîna çareseriya makezagona demokratîk ya gerdûnî derxe holê. Encama vê wê nêzikatiya xebatên makezagona nû çêkirin, mijarên rêbaz û naverok, mûxatabê wê re parve kirin û kirina nav de, wê bi xwe re bîne. Were bal kişandin gava yekemîn ku were avêtin şêwaz û çawaniya gavên ku piştre werin avêtin teşe û çawaniya wê şekil bide. Dudilî, bêcesaret û rewşa tirs ya ku aliyê din nîşan dide bi gavên piştre sererast kirin wê pirsgirêkan bi xwe re biafirîne.

Di çareseriya siyasal demokratîk de mijareke din ya sereke mafê Kurdan bi vîna xwe ya cewherî xwe bi xwe birêvebirinê nas kirin, di pêşiya bûyîna civaka netewa demokratîk de asteng nedanîne. Şayet netew-dewletên hakîm ji rêgeza demokratîk re di asta gotin de di cewher de girêdayî bin piştevaniya civaka demokratîk nekin jî pêwîst dike asteng nekin û qedexe nedeynin. Li vê derê xala krîtîk ku pêwîste were îfade kirin çareseriya demokratîk dewlet an jî hikûmet wê pêş nexin. Ji çareseriyê hêzên civakî bixwe berpirsiyar in. Ji mijara me re ya ku bûye mewzûbehs li ser bingehê vîna ku derketiye holê de -xweseriya demokratîk- hêzên civakî bi dewlet an jî bi hukumetan re di bingeha destûra bingehîn de lihevkirinê gerandin an jî lihevkirin çêkirin e. Di rewşa pêkhatina lihevkirinê de di navbera hêzên civaka demokratîk û hêzên dewlet û hikûmetê de parve kirina rêvebiriyê, bi zagonan tê diyar kirin. Ji vê re pîvanga (qistasa) bingehîn ne teqez dewlet ne jî teqez demokrasî ye. Ev daxwaz wekî ku ne rasteqîn e dijî rihê çareseriyê ye jî.

Di çareseriya makezagona demokratîk de ji dewletan mijareke sereke ya din were xwestin jî helbet ji azadiya fikir û îfade re girêdana tam e. Di astekî de wekî ku di rehenda netewa demokratîk de me da diyar kirin netew-dewletên têkildar bi Kurdan re ger di bin normên hevbeş de dixwazin jiyan bikin, divê di bingeha cîhana xwe ya hişmendî û hestan ava kirin û xwe di bingeha cûdabûna xwe de kirina wek civakek netewî ya Kurdan re hûrmet nîşan bidin. Ji bo vê azadiya fikir û îfadeya pêwîst misoger girtina bin ewlehiya makezagonê pêwîst e. Ji ber rêya netewa hevbeş teşkil kirinê ji azadiya fikir û îfade bi tam girêdanê re derbas dibe.

Çareseriya pirsgirêkê ya makezagonî demokratîk xala herî girîng şerta xweseriya demokratîk e. Xweseriya demokratîk hişmendiya netewa

demokratîk de bedena rehenda siyasî ye. Yek nebe ya din jî nabe. Yek xwe li ser ya di nava dike. Lewma netewa demokratîk, hişmendî yani rih e, xweseriya demokratîk netewa demokratîk îfade dike. Xweseriya demokratîk heman demê de tê wateya xwe bixwe birêvebirin, rêvebiriya xwe ya xweser ava kirin e. Di aliyê Kurdan de şerta bingehîn ya bi netew-dewletan re lihevkirinê pejirandina xweseriya demokratîk e. Birêz Ocalan xweseriya demokratîk wek netew-dewletên bi etnîsîteya serwer re di binê sîwana siyasî ya hevbeş de jiyankirinê wek şertê di asta herî jêr de dihesibîne. Bijartekek jêrî vê wê were wateya kûrkirina neçareserî û zêdebûna pevçûnan.

Di çareseriya pirsgirêka makezagonî demokratîk de mijareke girîng ya din jî rêgeza bihevrebûna mafên ferdî û kolektîf û ya azadiyan e. Hemwelatiyên netewa demokratîk qasî ku azad in divê komûnal be jî. Ferdê netewa demokratîk azadiya xwe di komûnalîteya civakê de yanî di jiyana rewşa civatên hîn biçûktir yên karîger de dibîne. Takekes li hember yekeyên (yekeyên) civakî an jî komûna ku pêve girêdayî ye berpirsiyarbûnê wek rêgeza bingehîn ya exlaqîbûnê dihesibîne. Hemwelatiya netewa demokratîk di bin heman sîwana siyasî ya netew-dewletê de dema ku jiyan bike di çarçeveya hemwelatiya makezagonî qasî netewa xwe ya demokratîk dibe hemwelatê netew-dewletê jî. Ger welatên pirsgirêka Kurd re eleqedar di binê statûya hemwelatiya makezagonî ya demokratîk de serî li çareseriyê bidin rewşa her du hemwelatîbûnê bi hevdû re jiyan kirin wê derkeve holê. Li vê derê mijara ku girîng dibe statûya netewa demokratîk nas kirin yanî xweseriya demokratîk di makezagona netewî de wek statûya hiqûqî diyar kirin e. Statûya netewî ya demokratîk dualî ye. Ya yekemîn di hûndirê xwe de statûya xweseriya demokratîk zagonê wê û makezagona wê pêkanînê îfade dike. Ya duyemîn statûya xweseriyê wek beşek jêrtir ya statûya makezagona netewî lidarxistin e. Îro di cîhanê de di pir cîhan de bi taybet jî li YE mînakê vê hene.

KCK di avakirina netewa demokratîk de di rista movika piştê de ye. Bi îfadeyeke din KCK wekî bersiva tam ya xweseriya demokratîk jî dikare were pênase kirin. KCK di rewşa heyî de di nêz de netew-dewletên eleqedar de pirsgirêka meşru were dîtin heye. Di rewşa pirsgirêkek neyê

çareser kirin de wek xwezayî di heman erdnîgariyê de avabûna wek du otorite wê were jiyan kirin. Dewletên têkildar di vê mijarê de gavên zagonî yên pêwîst neavêjin û pêşiya legalbûna KCK jî venekin mûameleyeke îlegal nîşan bidin KCK jî xwe bi yek alî pêk aninê pêşdetir rêyê wê nemîne. Ev jî wê ji pevçûnên nû re derî veke.

Bi vê beşê ve girêdayî mijareke din ya rojaneyî vekirinê de feyde heye. Mînak wek nîşandana samîmiyeta dewleta Tirk ji pirsgirêka Kurd ji aliyê çareseriya lihevkirina demokratîk bi giştî Kurdên di perçeyên din de taybet jî nêzikatiya xwe Kurdên ji rojava re ye. Wekî ku tê texmîn kirin di aliyekî de dibêje ‘eze çareser bikim’ aliyê din di derbarê Rojava de polîtîkayên ku ji vê re denk nayê pêşxistin an jî komên çete yên cûr bi cûr rêxistin kirin û têşwîkî êrîşê kirin. Ji êrîşên bi vî rengî re asteng nedanîn wek nîşaneya bêsamîmiyetê tê hesibandin; polîtikayên di xala çareseriya pirsgirêka Kurd ya li Bakur de jî gumanên cîdî wê bikşîne ser xwe. Lewma dewletekî eleqedar pirsgirêka xwe ya Kurd çareser bike, ev tê wateya li kîderê dijîn bila bijîn bi giştî ji Kurdan re wekî gel bûyînê tevahî mafê wan re rêz nîşandan û vîna wan pejirandin e. Bi vê encamê ve girêdayî ev ê were wateya hebûna Gelê Kurd yên di perçeyên din de jî pejirandinê.

Sernivîsên bingehîn ku me hejmartin ger em komîserhev bikin; pêşnûmeya çareseriya Kurdan netewa demokratîk, xweseriya demokratîk e. Bi rêyên demokratîk çareseriya xweseriya demokratîk wê hûrmeta dewletên eleqedar ji vê îrade û lihevkirinê re tê ava kirin. Îfadeya vê ya şênber çareseriya makezagona demokratîk e. Şertên sereke yên vê rêgezê netew-dewleta deshilatdar dev ji polîtîkaya her cûre îmha û înkarê berde, netewa ku tê perçiqandin jî dev ji nêrîna netew-dewleta xwe saz kirinê berde û di vê mijarê de lihevkirinê ve dibe. Xala dawî ya giring jî bi dewletan re her hevpeymana ku were çêkirin spartina belgeyên fermî ye. Ev pir girîng e. Jixwe dîplomasî di wateyekî de hevpeymanên ku tên çêkirin spartina belgeyên fermî ye.

Tevahî xisûsên ku li jor me bal kişand ser piranî di maseya mûzakereyê de diyardeyên ku lihevkirin û çareseriyê dixwazin e. Bi vê re her diyarde wekî ku pirsgirêkên zagonî-makezagonî û pir pirsgirêkên rêvebirinê derbixe holê her yek ji wan jî wê bi serê xwe çareserî bîne. Bi vî milê xwe bi yekeyên eleqedar ya dewletan rewşa diyaloga pir tîr ya dîplomatîk wê

bibe zarûrî. Ji van re bi giştî xebata dîplomatîk ya di qada pratîk de jî dikare were gotin. Di vê qadê de serkeftinên ku werin bidest xistin ji çareseriya hevbeş re wê alîkar be. Mînak berpirsên têkildar yên hikûmetê, hewldanên di asta parlamentoyê de, hêzên ewlekariyê, saziyên dewletê, partiyên mûxalefetê, saziyên ragihandinê, SCS, cîhana akademiyan, zanîngehan û hwd bi van hemûyan re di nava têkiliyên dîplomatîk ya tîr de bûyîn girîng e. Rayagîştî ava kirin, ji çareseriyê re alîkariya wan girtin, di pêvajoyê de dînamîk kirin, lihevnekirinan çareser kirin, astengiya ji holê rakirin û xebatên dişibe vê di rojeva dîplomasiya me de divê cihê xwe bigre.

Bakure Kurdistan, ger li ser Tirkiyê mijarê hîn şênber bikin pêwîste em bidin diyar kirin ku zaafiyetên cîdî heta kaosek tê jiyan kirin. Yek caran di ti cihên cîhanê de ji yek zêdetir nûnerên dîplomat hiştin nehatiye dîtin. Sedema vê ya bingehîn daxûyaniyeke ku were dayîn an jî saziya ku pratîkê temsîl dike çiqasî girê dide an girê nade fêm kirine. Şayet ji yek zêdetir berdevk an jî nûner hebe jî saziya ku berpirsiyarî bigre wek temsîla wê û bi şerta ku çarçeveya xwe derbas neke mafê daxûyanî dayînê heye. Ev nêzikbûn wê bihêle ku ew hîn cîdî were girtin û ewle bûyînê çêbike. Ya ku di pratîkê de dixûye, herkes mijarên ku xwe girê nade de jî rewşa daxûyanî dayînê de ye. Mînak hevserokê şaredariyeke daxûyaniyên ku pir jorî berpirsiyartiya wan e didin an jî wekîlek berdevkê saziyeke rûxmê ku agahdarbûnek cîdî tuneye derbarê pêşdeçûna pêvajoyê de daxûyaniyên krîtîk didin. Lewma xebatên dîplomatîk ya di vê qadê de tevgaviyên cîdî ya pergalî û rêbazî tên jiyan kirin. Divê neyê jibîr kirin ku ya ku pergalê karîger û têkûz dike avaniyên ku hatine ava kirin ne heman karê kirin; her yek rista xwe tam û bêkemasî bi cîh anine.

Bi vê re heyeta ku Birêz Ocalan re hevdîtin pêk dianî derbarê pozîsyona wan de jî li ser çend xala sekinandin pêwîste. Birêz Ocalan ji bo wan rûxmê ku got ‘hûn alîkarê min in heta wekîlê min in dûrî giraniya mîsyona ku girtine ser xwe heta niha ji vê mîsyonê re guncaw saziyeke karîger ku fermiyeta xwe heye ava nekirin pirsgirêkek cîdî ye. A rast heyet di wateyekî de di pozîsyona nûnerên dîplomatîk ya Birêz Ocalan de ne. Di vê rewşê de rûxmê ku xwedî qada xebateke pir dewlemendin pergal û sazîbûn ji ber ava nekirine ji derveyî çûyîn û hatinê –hinekan ji vê re gotin

kûryetî- cîdî runişkandî û xebateke ku pêşketina bandor bike nehatiye girtin. Bi derbasbûna zagona herî dawî pêwîstiya heyet xwe bi şêwazeke hîn cîdî xwe bicîh bike û sazîbûna xebatê xwe lidarbixe derketiye holê.

Dîplomasiya ku bi dewletan re were meşandin bi pirsgirêka Kurd ve girêdayî esasê mijarên ku were meşandin me xwest diyar bikin. Bi vê re di serî de YE, DYE û welatên cîhanê yên din bi saziyên jorî netewan xebatên dîplomatîk ku werin kirin girîng in. Welatên YE û DYE di çêbûna pirsgirêkê de çawa ku bûne aliyeke girîng di çareseriya wê de jî di pir rehendan de di pozîsyona alîgir de ne. Di vê rewşê de hêz pêwîste di çareseriyê de berpirsiyarî bigrin. Mînak mijara destpêkê ku ji wan were xwestin, Tevgera Azadiya Kurd û kadroyên wê yên pêşeng demek berê demeke ji lîsteya têrorê derxistin e. Ev wê di serî de wan rehet bike. Polîtîkayên di derbarê Kurdan de di ber çavan re derbas kirin, di xala pêşketina çareseriyê de welatên têkildar di vê çarçeveyê de teşwîq kirin, di mijara bi polîtîkayên înkar û îmhayê re piştevanî nekirinê de gav avêtin divê were xwestin. Dîsa Birêz Ocalan di parêznameya xwe de di derbarê çareseriya pirsgirêka Kurd de perspektîfên ku daye diyar kirin bi şêwazê dosya dem bi dem di derbarê pêvajoyên pêkanînên beramberî hev digre hûndirê xwe agahdar kirin jî di nav de bi nûnerên pir welatan re bi şêwazeke bi pergalî dikarin werin parve kirin. Bi vê re nabzê aliyê din jî dikare were pelandin (yoklamak). Li cem NY bi taybet statûya çavdêr ya Gelê Kurd nas kirin hewldan hîn tîr, rêxistinî û bi pergalî dikare were meşandin. Di Rojhilata Navîn de rewşa pevçûn û nakokiyan di wateya dîplomatîk de em nikarin bêjin ku me jê tam sûd wergirtiye. Helbet di cîhanê de dîplomasî herî zêde bi hêz û derfetên aborî spartî tê kirin. Lê wekî Kurdan gelên bêdewlet di bikaranîna derfetên dîplomatîk de rastiyeke tê zanîne ku pergala dewletên navnetewî pir astengiyan derdixin. Rûxmê tevahî nêzikatiyên sînordar kirinê afirîner nêzikbûn, li pey derfetên heyî bazdan û fersenda girtinê re rast û di cihê wê de bikaranîn di aliyê pergalê de valatiyên heyî ji nakokî û pevçûna wan sûd wergirtin girîng e. Nirxên têkoşîna îro çawa hatibin afirandin deskeftiyên dîplomatîk jî bi şêwazeke dişibe vê bi têkoşîneke tîr û bi azîm tê dest girtin. Di vê rewşê de xwe ji rewşa bendêmayînê derxistin; bi tevger, dînamîk, derfeta lekolîn kirinê re dayîna zorê, heta ku digihîje armancê dişopîne, afrîner, dewlemend, bi îstîqrar û bi tarz û tempoyeke ku tiştê

dixwaze digre dezawantajên heyî berovajî kirin pêkan e. Dîsa asteke çi dike dizane, ne dixirike rojev diyar dike girtin girîng e. Lewma xebatên me yê dîplomasî bi hin plansaziyên ku rojevên taybet digre hûndirê xwe meşandin ji pêşketinên jinişkave (anî) û fersendan re vekirî bûyîn, ji xebatên ketober û teknîkî mayînê zêdetir, bi şêwazê dosya, naveroka wê dewlemend û şênber, rêxistinbûneke ji xwe re xweser çêkirin pêwîst dike. Vekiriye ku pirsgirêkên dîplomasiya me îro dijî ji bandorên derve girêdan wê çûyîna hêsaniya kar be. Xwe hîn zêde dayîna zorê re derfeta herî biçûk jî bikaranînê zanîn, bi zeka û baweriyê sipartî, tempoya têkoşînê bilind girtin wek pêwîstiya berpirsiyariya me ya exlaqî û polîtîk e.

Xisûseke din bûyîna nûnerên dîplomatîk ya mileteke bêdewlet, pêwîste li hember netew-dewletan nebe sedema jiyîna perçiqandinê. Yek car bi dewlet bûyîn ne sedema jor de bûyîne. Jorbûna esas Gelê Kurd di serî de ji bo mafê wekhev, azad û demokratîk ya tevahî gelên din wek militaneke bi bandor ya erkên exlaqî û polîtîk û heman demê de wek nûnerên dîplomatîk nirxên exlaqî û polîtîk re nirx ser zêde kirin e. Li gel vê beriya her tiştî di têkiliyan de li ser mexdûr û mazlûmbûna Gelê Kurd zimanê ku tê bikar anîn pêwîste êdî were terikandin. Pêşdeçûna hevdîtînên dîplomatîk û ya ku encam diyar bike wek bandoreke herî girîng derûniya ku di wê kêliyê de alî di hûndirê wê de ne. Xwe û rikberê xwe çawa dibîne û dest digre ye. Ger xwedî derûniyek yekpare û jixwe bawer nebin esas tê wateya ku encam beriya ku dest pê bikin derketiye holê. Di vê rewşê de ji aliyan yek daxwaza din a diyar dike jî wek xwezayî yê ku pêşwazî dike ye. Hîn di destpêka hevdîtinê de esas bikeve nav pozîsyona binkeftî. Xaleke din ku neyê jibîr kirin yek jê jî di esnaya hevdîtina dîplomatîk û mûzakere de wek pêwîstiya rêgeza dîplomatîk di navbera wekhevan de hevdîtin an jî mûzakere ye. Lewma xebata dîplomatîk misoger ji derûniya mêtinger dûr be, xwe bispêre baweriya cewherî. Polîtîkaya derve ya ku xwe li ser baweriya cewherî înşa nekiribe û xebata wê ya dîplomasî wekî ku me li jor da diyar kirin wê bibe dîplomasiya ku hîn di destpêkê de binkeftinê pejirandiye.

Em ji nêz de dizanin ku PKK bi hêsanî nehatiye heta roja me ya îro. Heta ku Kurda anî asta îro bi astengiya pir dewletên herêmî û navnetewî yên mêtinger têkoşîn kirinê re derbas kiriye. Lewma hêzeke berçav an jî ne

berçav pozîsyoneke ku hatiye pêşkêş kirin ne mijara gotinê ye. Wî demî di dîplomasiyê de jî bi layiq temsîl kirin wê bibe pêwîstiya sekna bi rûmet. Tişteke bi zorê xwestibin ji me bistînin, lê nikarîbûn bigrin di maseya mûzakereyan de an jî bi giştî di xebatên dîplomasiyê de wenda kirina me li aliyekî; ji wê re nirx tevlî nekirina me mijara lêpirsînê ye. Di derbarê dîroka Kurdan de wekî ku em hemû jî dizanin diyardeyeke ku pir tê bikaranîn çîroka 'ne di şer de di masê de wenda kirin' e. Dîroka bêoxir a ku kirine malê Kurdan tekane rêya guhertinê ji van xebatan bi biryardariyeke bilind, bawerî, tempo û bi azîm berê xwe dayîn e. Pêwîste em zanibin ku bi rêxistinî, zane, bi tarzeke ku mafê xebatan bide encam girtin pêkan e. Kurd mileteke qedîm ku ji şaristaniyê re, ji zayîna mirovahiyê re dergûşî kiriye, rista pêşeng leyistiye, bûyîna endamê wê cihê rumetê ye. Nûnerê wê an jî dîplomatê wê bûyîn jî cihê rumetê ye û berpirsiyariya exlaqî ye. Bi vê zanabûnê erka xwe anîna cîh tenê ne ji bo Gelê Kurd wê ji tevahî gelan û mirovahiyê re bide kesibandin (qezenc kirin).

## ERK Û TAYBETMENDIYÊN GIŞTÎ YÊN NÛNERÊN DÎPLOMATÎK

Dîplomatek KCK di kîjan qadê de kar bike bila bike li herêm an jî welatê lê ye kesê ku vîna gelan bi şêwazeke herî baş temsîl bike ye. Di roja me de em dizanin ku di hin dewletan de sefîrê van karan, konsûlxaneya, nûnerê artêşan û wezîre karê derve û bûrokratan ve tê kirin. Dîplomatê nûner welat an jî qada ku lê ye tevahî erkên ku dikeve di çarçeveya nûnertiya xwe bi berpirsiyariyeke mezin anîna cîh divê xwe erkdar bibîne. Bi giştî; bi navê KCK hevdîtin û mûzakere kirin, agahî kom kirin-rapor kirin û têkiliyên dostane pêş xistine.

Nûnerên dîplomasiya KCK, di çarçeveya nûnertî kirinê de herdem du tişta bi hev re û di navhev de temsîl dikin. Ji van ya yekemîn polîtîkaya derve ya KCK, ya duyemîn jî vîn û prestîja wê ye. Nûner van her du hêmana di kesayeta xwe û jiyana xwe de bi şêwazê herî rast temsîl kirinê divê xwe berpirsiyar bibîne. Welat an jî qada ku lê berpirsiyarî dimeşîne agahiyên bi tendûristî kom kirin, ji navenda xwe re kirina rapor, di nava pergalekî de kirin mecbûrî ye. Qada ku lê ye di derbarê pêşketinên her cûre demkurt, demnavîn û demdirêj di raporên xwe de pêwîste cîh bide. Di vê

rewşê de nûnerê dîplomatîk ji yeki zêdetir xwedî qanalên agahiya bûyîn ji bo agahiyên bi têndurist girîng e.

Raporên ku nûnerên dîplomatîk bişînin di du kategoriyan de nirxandin pêkan e. Ya yekemîn di derbarê qad an jî welatê ku lê ye li gel piranî wek ragihandin, weşanên fermî ye dewletan agahiyên normal dayînê pêş de naçe, rayedarên welatan an jî rasterast agahiyên ji gel tên girtin, di milekî de ev agahiyên ku di hûndirê xwe de sirriyeta xwe jî nîne bêyî ku şîrove bikin şandine. Ji raporên wisa re 'raporên vekirî' tê gotin. Ya duyemîn raporên piranî ji çavkaniyên fermî agahiyên di asta veşartî û ji ve jî girîngtir şîrove û dahûrandina dîplomatê nûner jî digre hûndirê xwe ye. Ji van re jî zêdetir raporên 'veşartî' an jî 'raporên siyasî' tê gotin. Di raporan de dahûrandin, nirxandin û pêşniyarên dîplomatê nûner pêwîste girîng were dîtin. Ji ber tevahî rapor di diyarkirina naveroka perspektîfa ku ji navendê were, bi taybet di tespît kirina polîtîkayên ku were meşandin de wê risteke mezin bileyize. Bi qasî raporên agahdar kirinê bi pergalî şandin perspektîfa jî bi nizam veguhestin wek du diyardeyên ku hevdû temam dikin in. Di vê rewşê de di nav erkê nûner de agahî kom kirin û rapor şandin ciheke girîng digre. Piranî ev erk basît tê dîtin û bi derengî tê xistin. Vê rewşê bi derêngî xistin bi şêwazeke nîzamî perspektif girtine jî asteng dike.

Me dabû diyar kirin ku erkek din ya dîplomatê nûner bi navê KCK mûzakereya nîzamî meşandin e. Şêwazê mijara mûzakereyan em hinekî ger li ser bisekinin; tê zanîn ku dîplomatê nûnerê derve karê xwe yê sereke welat û qada ku lê ye bi navê KCK mûzakere kirine. Ev mûzakere carnan ji aliyê nûnerê derve tê meşandin carnan jî nûnerên ku ji navendê tên meşandin. Ev xebat di agahiya dîplomatê nûner de jî dikare were kirin. Derveyî agahiya nûner jî dikare were kirin. Lê mûzakereyên bi heyetên taybet yên erkdar re nûnerên derve yê ku rasterast cihê xwe nagre jî piştevaniya ku ji heyetan re bike girîng e. Piştî ku heyet vegeriyan navendê ji bo berdewamiya têkiliyan jî nûnerê derve an jî dîplomat agahdar kirin girîng e. Hin hevdîtin û mûzakere piştî ku heyetên ji navendê hatin heyetên ku hevdîtin kirine ji ber zirûfên ku herdem hevdû bibînin wê çênebe, temas piranî li ser dîplomatê nûner tê kirin. Danûstandinên peyamên nû jî li ser heman qanalê tê kirin. Di vê rewşê de

dîplomatê nûner qasî di temsîlê de di berdewamiya pêvajoya mûzakereyan de daîmîbûnê dide çêkirin. Mileke din di wateya fireh de nûnerê dîplomatîk welat an jî qada ku lê xebat dimeşîne bi mûxatabên xwe re her tim di nava têkilî an jî mûzakereyan de dibe. Li ser talîmatên ku ji navendê digre an jî di berfirehiya înîsîyatîfa ku hatiye diyar kirin her hewldana ku bike aliyê din yanî mûxatabê xwe ji bo bikşîne avaniya ku temsîl kiriye wesîleya muzakereyan e. Xebatên ku nûnerê dîplomatîk bimeşîne aliyek wê jî welat an jî qada ku bi navê gelê xwe li wir e bi armanca danasînê xebatên propaganda kirin û alîkariyek kirin e. Bi armanca propagandayê saziyên din hebin jî bi wan re di nava koordînasyonê de bûyîn girîng e. Dîsa li ser navendên enformasyonê bi saziyên têkiliyên derve re girêdayî ji derfetê wan yê teknolojîk sûd wergirtinê divê ev xebat were meşandin. Welat û qada ku lê xebat dimeşîne derbarê meseleya Kurd de polîtîkaya hikûmeta bandor kirin, welatên têkildar ku Kurdistan mêtinger dikin faaliyeta wan yê bi armanca şerê taybet û derûnî deşifre kirin û bêbandor kirinê de pêşiya beralîkirinên bi alî girtin, bi armanca rayagiştî ya dijber ava kirin gel çapemenî û komên zextê yê wî welatî re di çarçeveya dîplomasî de xebateke bi rêxistinî û bi plan divê were meşandin. Ev erk ji aliyê navendên enformasyonê ve tên meşandin. Di binyada têkiliyên derve van yekeyan bi hêz kirin û jinûve vesaz kirinê hîn çalak û karîger kirin pêwîst e. Bi taybet teşegirtinê de rolên girîng leyistin û bi endamên çapemeniyê re têkiliyan sererast kirin girîng e. Yekeyên enformasyon li ser têkiliyên çapemeniya biyanî û ya taybet û ya gelemperî rayagiştî rasterast agahdar kirin pêşiya dezenformasyonê girtin, nûçeyên bi armanca taybet û derûnî di dema xwe demildest mûdaxele kirin, pêşketinên ku dixwazin ji rayagiştî veşêrin parve kirin, bi lez veguheztin erkên bingehînin. Nûçeyên carnan bi armanca dêrûnî, bi zanebûn hatine servis kirin di dema wê de dema ku neyê mûdaxele kirin hewldanên piştre ji ber wê derêngî encam bide lez tevgerandin girîng e. Xebatên bi vî awayî di roja me de ‘rêvebirina nûçe’ tê gotin. Lewma ne ji aliyê nûçeyan rêvebirin hatina asta nûçe rêvebirinê elzem e. Li ser tevna înternet îro rayagiştî ya cîhanê ya fermî û ya nefermî, civaka sîvîl, çapemenî, ronakbîr-akademîsyen-zanîngeh û saziyên fikrî bi agahiyên herî nû xwedî kirin ji bo vê jî di nava têkiliyê de

bûyîn asayî bûye. Lewma ji her cûre derfetên serdema me rast û di cîh de sûd wergirtine tişteke xwezayî nîne.

## BÊŞA 4

## MÛZAKERE ÇIYE? DI KÎJAN ZIRÛFAN DE TÊ KIRIN AN JÎ NAYÊ KIRIN Û CURÊYÊN MÛZAKEREYAN ÇIYE?

Di siyaseta navnetewî de mûzakere bi wateya xwe ya teng di navbera aliyan de nûnerên ku fermî hatine tayin kirin di navbera aliyan de berjewendiyên hevbeş an jî lihev nekirinan de ji bo bigihijin lihev kirineke fermî hevdîtinên ku dikin îfade dike. Li gorî pênaseyeke din jî; mûzakere failên (aktor) netewî an jî navnetewî ji bo armancên ku dikarin li ser lihev bikin bi hevdû re ketina nava hevbandoriyê (etkileşimê). Encamên ku ji pênaseyên jor derketin, her du alî jî ji bo çareseriya lihev nekirinên di navbera xwe de wek berjewendiyên hevbeş dîtin û ji bo çareseriya lihev nekirina biryardayînê mecbûr dike. Lewma mûzakere ji bo were kirin di hin rewşa de berjewendiyên aliyeke ne çareseriya lihev nekirina, wekî heyî domandine jî dibe ku bi xwe re bîne. Wê demê pêvajoyê perisîna mûzakereya di vê rewşê de pêkan nabe. Wekî ku pênaseya duyemîn zelaltir îfade kir pirsgirêka ku tê jiyan kirin an jî lihev nekirinê derveyî bi peymaneke beramberî hevdû lihevhatinê re çareser kirinê rêyek nemîne û her du alî piştî ku biryar dan ku çareserî wê li berjewendiya wan be tê wateya ku ji bo çareserkirina pirsgirêkan rêya mûzakere vebûye.

Ji bo mijar baştir were fêm kirin li ser hin mînakan em dikarin berdewam bikin. Em bihesibînin ku faîlek an jî ji hêza xwe faîleke bêhêztir an jî bi hêzêkî pirsgirêka lihev nekirina ku tê jiyan kirin bê faîleke din bawer bike ku pirsgirêk çareser bike li wê derê pêwîstî bi mûzakere namînin. Jiber aliyê bi hêz her cûre daxwazên xwe ji aliyê bêhêz dayîna qebûl kirinê esas girtine ji ber wê ji mûzakere re pêwîstî nebîne daxwaze wan bi rêya sêpandinê pêşwazî kirinê wê hilbijere. Lewma li vê derê zirûfên mûzakere ava nabe an jî tine ye.

Li hember daxwaza mûzakere ya gelên ku têkoşîna azadiyê dimeşînin hêzên deshilatdar yên mêtinger heta tên xala herî dawî her dibêjin em bi we re rûnanin û mûxatap nagrin. Xala ku ber bi mûzakere diçin, derveyî

mûzakere hemû rêya diceribînin û dema ku encam nagrin, pevçûnê di aliyên din de domandinê de jî dema ku îkna dibin ku encam nagrin, di rewşa israr kirinê de wê bi zirarên hîn mezin re rû bi rû bimînin fêm dikin ev dem nezî mûzakere dibin. Di van zirûfan de di rewşa ku aliyê din jî hilbijêre rêya mûzakere vedibe. Lewma ketina pêvajoyên mûzakere, çawaniya temamker ya berjewendiyê aliyan di serî de erê kirin e.

Yanî her du alî piştî ceribandinên ku hatine kirin îkna bibin ku encam nagrin, di xala yên ku nehatine ceribandin biceribînin hevdû bibînin di wê kêliyê de ji bo çareseriya pirsgirêk an jî lihev nekirina pêşiya mûzakere vedibe.

Bi vê ji destpê kirina mûzakere amade bûyîn ji bo herdemê di mijara lihev nekirinan de dibe ku vîn hema bi hevpeymaneke bigihêjin neteyisîne. Mînak aliyek hêza xwe ya netewî û pozîsyona xwe ji bo hîn qewîn bike dem bidest bixe û ji bo bala aliyê din belav bike jî di dîtina mûzakere de dibe ku bisekine. An jî hêza xwe ya sûkê ji bo karibe zêde bike-di welatê xwe de dîsa di qada navnetewî de hewldana piştgiriyê zêde kirinê de rexneyên hûndir û derve ji bo bêdeng bike jî dikare bikeve nava rewşa mûzakere.

Bi vê re mûzakere red kirin jî wek mûzakere tê hesibandin. Bi vî şêwazî welatek an jî hêzek ji diyardeya mûzakere dirêjbûna rewşa konjoktûrel ku hinekî li berjewendiya wan e û di dawiyê de tawîzên ku mecbûrin bidin dereng hiştin, hêzek an jî hêmaneke din dibe ku bi fikrandina ku ji bo çareserkirina pirsgirêka di dewrê de bikeve dewrê an jî tewazûna hêz ber bi aliyê wan de rêya guhertina îhtîmala vebe jî nêzik bibe.

Ji bo ev mijar bêhtir were fêm kirin di dema nêz de ji pratîka AKP mînak dikare were dayîn. AKP, di civakê de hêviya çareseriyê ava dike, piştre jî Tevgera Azadiya Kurd ji bo perçe bike û tesfiye bike nêzîkatî pêş xistiye. Dîsa di destpêka mûzakereyan de kesayetên wek Kemal Bûrkay, Şivan Perwer gotin di cîh de be, bi kirîne re anîn, mûxatabên sexte hilberandin bi armanca parçakirina vîna Kurd lawaz kirin û tefsiye kirin nêzikatiyên bi plan bûn. Di zirûfên berî vê de ya ku ceriband lê nikaribû pêk bîne zirûfên nû ji xwe re zivirandina fersendê ket nava hewldanên pêk anîne. Bi heman şêwazî operasyonên KCK, binçav kirin û girtinên ku hatin jiyan

kirin aliyê Kurd di masê de lawaz kirin ji plansaziya xwe ya çareseriyê nêzikatiyên mecbûr kirinê bûn. Bi tevahiya van tiştê girîng ya din dixwest bike jî; aliyê Kurd yê di masê de bijardeyên di ajandaya xwe de ger pêkan be bêtawîz, ger nabe bi tawîzên herî kêm razî kirin bû. Her bijardeya ku were fikirandin wek korerê (çıkmaz yol) nîşan dayîn –mînak hîn jî kalekol û bi armanca ewlekariyê avakirina bendavan ku di rojevê de ye, di pêvajoya diyalog û agirbestê de bi şêwazeke lez xistina dewrê -giştî zirûfên têkoşînê li gor xwe teng kirin bijardeyên jinûve vegere lawaz kirin û Tevgera Azadiya Kurd ji bijardeyên xwe re razîkirin bû. Cewherê mûxatabê xwe ji bo bikşîne projeya xwe ya çareseriyê pengavên taqtîkî ku ketibûn navde bû. Lewma AKP ji ber dewletbûnê derfetên xwe xistina dewrê re Tevgera Azadiyê ji bo bîne pozîsyoneke hîn lawaz bi hemû hewldanên xwe ve xwe da ser. Bi hewldanên xwe di tevahî pêvajoya mûzakere de jorbûna dêrûnî ku heta dawî bi bandor e ji bo bidest bixe Tevgera Azadiya Kurd li ser pir mekanîzmayan xwest bigre bin zext. Bi giştî di pêvajoyên wisa de hewldanên taqtîkî ku hatine ceribandin ger encam negirt aliyê ku vê ceribandinê kir di pêvajoyên piştre dike rewşeke hîn zehmet. Heta bi temamî berovajî bûyîna taktîkan jî dibe ku were jiyîn. Lewma tewazûna zivirandina aliyê xwe, guhertinên ku li bendê ne wek objektîf û sûbjektîf pêknehatina wê wekî ku encamên ters rê vebike, di aliyê rayagiştî de qada manewra jî tengtir dike.

Mijarê hinek din vekirin eger pêwîst bike, alî di mûzakereyan de piranî milên xwe yên bi hêz bi şêwaza milên lawaz yên aliyê din re denk bikeve tînin rojevê. Bi îfadeyeke din lawaziyên aliyê din texmîn kirinê milê xwe yên hêz li ser wê hewl didin xûya bikin. Tiştê ku AKP xwest li vir bike aliyê xurt ye Tevgera Azadiya Kurd ku dibîne lawaz kirin aliyê ku lawaz dibîne jî li ser zext kirinê encam girtin bû. Dîsa alî di hevdîtinan de di rewşa çareserî an jî neçareserî de li ser xisûsê çiqasî wê wenda bikin -serbixin ser hevdû zext pêk tînin. Tiştê ku AKP dixwaze li vir bike motîvasyona tevgerê ya serketinê bandor kirin, îhtimala wenda kirinê xurtir dîtine ava kirinê ji çareseriya xwe re razî kirine. Xisûseke girîng ya din jî, AKP mafê sûd wergirtina zirûfên newekhev ya aliyan bi şêwazeke herî baş xwest bikar bîne. Lewma prosedûra standardên mûzakereyan ku tê zanîn nêzîk nebû. Di zirûfên pir cûda de, encamê ku bawer nake bigre di zirûfên wisa di pêvajoyek bi vî rengî û bi rêbazên wisa xwest bigre. Ji pêvajoya

mûzakere di vê bingehê de bi hêvî û biryardariya encama misoger bistînî gav avêt. Nêzikatiya AKP li vê derê pirsgirêkê bi rêbazên siyasî çareser kirinê zêdetir konsepta dewletê ya heyî terikandinê re bi konsepta xwe ji encam girtinê bawer kirin bû. Ji ber vê sedemê rêyên herî tevlîhev ya mûzakereyan hilbijart. Lê AKP tevahî rê û rêbazên ku hêviye xwe girê dabû dema ku encam negirt –kî hîn jî devjê bernedaye- li hember Serokatiya Gelê Kurd ku hêza xwe parast û hîn zêde pêş xist di vê pêvajoyê de mafdar derket, ket rewşeke hîn dezavantaj. Sedemê vê tevahî argumanên ku AKP li ser masê bilêv kiribû rûxmê ku pêk anî encam negirt û tiştekî ku karibe bêje êdî nemabû. Di vê rewşê de AKP an wê ji masê rabe an jî bi şêwazeke girantir jî be ketiye rewşa di nav bendewariya fersendên nû, pêvajo bi şêwazeke hîn zêde pêşdebirinê re mecbûr be.

Ji cihê ku em mabûn ger berdewam bikin, hin mûzakere bes ji bo armancê wan hîn vekirî derkeve holê û propaganda helwestê xwe ji rayagiştî re bidin jî dikare were destpekirin. Di milê din de mûzakere vekirî û girtî bi du şêwazan tê kirin. Di navbera herduyan de bijarde dîplomasiya 'klasîk' û 'dîplomasiya ji rayagiştî re vekirî' di navbera aliyan de hertim bûye mijara nîqaşan. Mînak, li Îmraliyê diyalogên ku hatin kirin ji rayagiştî re ji bo şeffaf û vekirî were kirin Birêz Ocalan israr kiriye lê aliyê dewlet û hikûmetê di vî milî de nêzikatiyek berovajiya vê nîşan daye. Rûxmê vê Birêz Ocalan li ser pergala ku pêşxistiye hin hesasiyeta baldar jî be rayagiştî di xala hevdîtinan de ji bo agahdar be hewldanek mezin daye. Wisaye ku di serî de partiyên mûxalefetê, ronakbîr û beşên cûda yên civakê di derbarê hevdîtinan de tenê li ser Birêz Ocalan agahdar bûne, ji hikûmetê jî benda heman nêzikatiyê mane vê yekê pir cara îfade kirine. Sedema israrkirina veşartî meşandina mûzakareyan a hikûmetê hem di aliyê fermî de hem jî di aliyê rayagiştî de ji bo nekevin bin berpirsiyariyekî, di vê çerçeveyê de ji bo rehet tevbigerin e. Lewma dewlet piranî di qadên tarî û veşartî de kar kirinê ji bo xwe zêdetir esas digrin. Bi vî şêwazî difikirin ku tiştê ku bêjin û bikin pir zêde girêdana wê nebe. Lê di vî alî de nêzikatî û israrên AKP di encama tedbîrên ku Birêz Ocalan girt di rêjeyeke mezin de vala derket. Li vê derê xala bingehîn ku di hiş de were girtin derveyî hevpeymanên fermî ku dewlet dikin û belgeyên ku îmze dikin ti nêzikatî û gotin wê xwe girê nede ye. Beriya ku belgeya îmzekirî derkeve holê dewletek bi dijminê xwe re şer bike an jî rûnê û

biaxive ti cûdabûneke xwe ye çawanî tine ye. Guhertina konseptê enceq û enceq bi belgeyên îmzekirî misoger dibe. Ji dewletan heta dewletên din rewş biguhere jî ya rast ev e; gotinê dewletê nabe, soz bi navê dewletê hatibe dayîn jî ti soz dewletê girê nade. Dîsa bi armanc û şêwazên cûr bi cûr mûzakereyên ku tên meşandin di navbera wan de di aliyê taktîk û nêzikatî de ferqên girîng hene bi vê re di her cûre mûzakereyan de hêmanên hevbeş û diyar jî hene. Ev, 'di merhaleya beriya mûzakereyan de hêmanên ku mijara gotinê ne' û 'hêmanên di navbera mûzakereyan de' em dikarin bi nav bikin.

## BERIYA MÛZAKEREYAN

Di sernivîsa berê de wekî ku me xwest em bidin xûya kirin ji bo mûzakere destpê bikin li ser pêwîstiya her du aliyan bigihin nêrînek hevbeş şert e. Gihandina nêrîna hevbeş carnan piştî ku mûzakere destpê kirin gihandina lihev kirinê pir zehmetir e û demeke dirêj jî dibe ku bigre. Sedema vê ya bingehîn pêwîstiya mûzakere qebûl kirin ji çareseriyê re bi şêwazeke din nikarin bigihêjin qebûl kirinê re tê heman wateyê. Bi îfadeyeke din tûndî jî di navde di tevahî pêkanînê xwe de ne serkeftiye û pirsgirêkê nikarîbû çareser bike ji ber bibe îtîrafa vê dewlet heta were vê pêvajoyê zehmetiyên cîdî dijî, xwe di her wateyê de amade kirin pêwîst dike. Mînak dewleta Tirk piştî her danezana saziya ewlekariya netewî têkoşîna azadiyê biçûk nîşan dayîn, dewlet li ser pêvajoyê hakim e û di têkoşîna dijber de wê serkeftî bin, bi gotinê wan 'koka terore wê bikirtikînin' her tim ji raya giştî deklare kirinê re kespa (algı) beramberî hevdû de min girtine pêş xist. Pêvajoyên dişibe vê de bi armanca şerê derûnî bi propagandaya qirêj bi demê êdî ew bixwe jî jê bawer dikin. Bi vî awayî hem xwe hem jî civakê pir zêde dem girtinê re para nermbûnê bi şêwazeke ku nemîne ji vezelînên cîdî re rê vedikin. Vezilandin rewşeke wisa digre ku êdî rewşa nermbûneke herî ji rêzê dibe fikarên ku şikandinên cîdî dibe û dibin esîrê vê fikarê. Vê rewşê dubare derbas kirin hem zehmet e hem jî dem digre.

Ji aliyan yek jî bêyî ku li muzakereyê rûne, pirsgirêkê bi rêbazên berî vê bawer bike ku wê çareser bike rêya mûzakere tû dem venabe. Lewma aliyê dewletê ji rêbazên kevn hêviyê xwe qut bike wê demê wê bikeve

nava lêgerînên cûda, ji ceribandinên cûda ders girtine, di asta derûnî de bi tevahî saziyên xwe ji pêvajoyek bi vî rengî re wê hewl bide xwe amade bike.

Wekî encam mînak welatên wek Rojhilata Navîn bi taybet rewşa berjewendiyê civak dema ku dibe mijara gotinê pirsgirêk dikeve nabosê (nederketinê) vê qebûl kirin biryarek pir zehmet e û demeke dirêj digre. nabosa ku tê jiyan kirin qebûl kirinê gava duyemîn destpê dike. Di vê merhalê de alî bi rêya mûzakere gihandina çareseriyê ji rewşa heyî domandinê hilbijêrin û di vê mijarê de digihin nêrîna hevbeş. Ev mûtabaqat wek destpêkirina rasteqîn ya mûzakere dikare were hejmartin.

Vê gavê avêtin sê wateyên cûda îfade dike. Yekemîn, rûxmê lihev nekirina aliya ji berjewendiyê hevbeş bawer kirin. Duyemîn; fersenda mûzakere baş neyê bikar anîn ji bo her du aliya jî wê encamên neyênî ava bike. Sêyemîn jî; derfeta gihandina çareseriyeke gengaz e.

Li kêleka van hemûyan, di biryara dayîna destpêkirina muzakekereyan de, risteke mezin a bandora siyaseta hûndir û ya derve heye. Serokê aliyan di milê polîtîkaya hûndir de şert e ku xwe di nava ewlehiye de hîs bikin. Lewma pêşeng beriya biryarên wisa bigrin hesabek giştî dikin. Xebata sondaj dikin, rehjena (nabza) gel dipîvin, aliyên lawaz an jî xurt hewl didin ku fêm bikin. Mûxalefet an jî ji pêvajoyek wisa yên ku neyênî nêzîk bibin wê bikevin nava nêzikatiyên çawa hewl didin ku hesap bikin. Zirûfên derve ji vê re çiqas derfet dide an jî nade dipîvin. Bi hevalbendên (mutefîkên) nêzikî xwe re dişêwirin û hewl didin piştevaniya wan bigrin. Ji bo ku saziyên dewletê di pêvajoyên wisa de hevbeş nêzik bibin pêşxebatekî dikin. Bi hêza ku ji tevahiya vana wê bigrin, wê hewl bidin diyardeya mûzakereyê pêk bînin. Ji bo hesabê şaş nekin bi baldarî û bi îtîna nêzikbûnê re her gavê ku bavêjin ji demên berê bêhtir diwezinînin û dipîvin.

Xisûsên ku me li jor anî ser ziman pirsgirêka ku hema yek ji welatekî jiyan dike di bingeha mûzakere de çareser kirin, bi taybet cihên ku hesasiyeta civakî bilinde, tewazûnên hûndir û derve bi bandora rewşa her lihev nekirinê bi rêya mûzakere çareser kirin xisûsên giştî ku siyasetmedar bi

baldarî nêzik dibin e. Mînak, Gorbaçov di polîtîkayên xwe ye Glasnost-Perestroyka, di pirsgirêka Îsraîl-Fîlîstîn'ê de, di pirsgirêka Brîtanya-Îrlanda'yê de, li Başûrê Efrîka, di meseleya Qibris'ê de pêvajoyên dişibe vê hatine jiyan kirin em dizanin.

Wekî ku tê fêm kirin bi giştî di rewşên wisa de mînak, ji bo hilbijartina demeke pir kurt dema ku dimîne hema hema tu siyasetmedar nakeve nava mûzakereyên bi wate. Muqabilî vê hema piştî hilbijartina hikûmeta ku bidestxistina piranî dengan hatiye ser desthilatdariyê rîskên mezin girtinê re ketina mûzakereyên bi lihevkirinê ancam bigre yanî popûler bike îhtîmaleke hîn xurt e. Di ceribandinên cîhanê de mînakên vê bi zêdeyî hene. Di rewşa berovajiya wê de yanî, deshilatdariya ku lawaz dibe ji ber tawanbariya 'fîrotina welat' wê bi zehmetî li pêşiya vê bisekine misoger wê ji hevdîtin û mûzakereyên bi vî rengî bireve.

Di girtina tevahî biryaran de aktorên girîng hene. Taybetmendiya pêşengan yek jî ev e. Pêşengek jixwebawer be, înîsîyatîf, bawerî û biryardarî bilind be bi van taybetmendiyên xwe li beranber pir dezavantaja birehetî dikare raweste, li ser encama dikare bandore bike. An jî berovajiya wê pêşengeke ku ne xwedî van taybetmendiyan be wekî ku li beranber pirsgirêka nikare vîna xwe nîşan bide dibe ku bibe sedema awantaj ji dest biçin. Pêşengên wisa nekarin tiştekî bikin jî pêvajoyên bi vî rengî ber bi mileke cûda perisîna wê de rolên girîng dikarin bileyzin; avaniya ku berê ava bûye û hişk bûye bi derb kirinê re, di rêjeyeke girîng de dikarin nerm bikin. Xaleke din jî rûxmê pir taybetmendiyên neyênî ya pêvajoyê rûbikeniya gel, ger alîgirê çareseriya pirsgirêka ku tê jiyan kirin be hikûmetek bi rehetî li ser vê zemîna erenî hêza destpekirineke cûda kirinê di xwe de dikare bibîne.

Aktorên ku wê gava destpêkirina mûzakereyê bavêjin, di rayagiştî a hûndirîn de di derbarê aliyê beranberî xwe de çiqasî wek *xwedî helwesta neyênî nin* bên naskirin, ewqasî jî di ketina mûzakereyan de xwedî zirûfên rehet û awantaj in. Sedema vê xwedî îmajek wisa bûyîn, hikûmeta eleqedar an jî pêşengê wê ji tawanbariyên wek 'ji aliyê din re xwe nêzik dîtin' an jî 'berjewendiyê welat bes ji bo lihevkirineke feda dike' xwe parastin e. Mînak, li Tirkiye pir cara serokê MHP Dewlet Bexçelî ji bo Erdogan wiha gotiye; '*Erdogan bi Ocalan re lihev kiriye wê diwana bilind*

*de were dadgeh kirin*.' Sûcdarkirinek bi vî rengî kiriye. Lê di mînaka Tirkiyê de hikûmeta AKP zirûfên erenî ku derket holê em nikarin bêjin ku ji bo çareseriyê pir rast û di cîh de bikar anî ye. Em dikarin vê rewşê bi nêzikatiyên AKP yên ne samîmî ve girê bidin. Naxwe ger hikûmet xwestiba zirûfên erenî ku derket holê bi rehetî dikaribû bixe xizmeta çareseriyê. Di vê mijarê de pir rehet em dikarin bidin xûyanî kirin ku, sekna AKP ji samîmiyetê dûr, dudil, (bi teredûd) û newêrek ji polîtîkayên hêzên li dijî çareseriyê hîn zêde hêz û zemîn ava kiriye. Di dîrokê de wekî ku pir caran hatiye dîtin yên ku herî zêde li hember hev şer kirine bi şêwazeke hîn hêsan aşitî jî kirine. Pêşiya pêvajoyên ku hatine jiyan kirin ji bo hîn serkeftî were vekirin gavên ku bawerî dide ji milê her du aliyan were avêtin wekî ku bi hêzbûna her du aliyan rê vebike bikaranîna piştgiriya civakî jî derbas kirina astengiya de wê alîkar be.

Rûxmê her tiştî di pêvajoyan de milê herî diyarker hûnera îkna kirinê, bi bawer, bi biryar, rast û bi ast nêzikbûna pêşenga û bi rêgez û hevdûgir nêzikatî pêşxistine. Dîrok û civak pêşengên ku bûne xwedî seknên wisa û pirsgirêkên xwe bi aştiyê çareserkirinê herdem xelat kiriye.

## DIYARKIRINA ROJEV

Beriya mûzakereyan xisûseke din a ku divê li ser lihev bikin jî rojevê diyarkirin e. Diyarkirina rojevê, di heman demê de tê wateya mijarên ku wê bêne destgirtin, wê di nava kîjan rêzê de were destgirtin biryara vê girtin e. Ev pêvajo bi serê xwe pêvajoyeke ku bi êş derbas dibe ye. Ji bo vê hevdîtinên dirêj dibe ku pêwîst bike. Mînak, di pêşnûmeya rojevê de îfadeyên ku hene ji aliyan yek ji ber hîn destpêkê de wê qebûl bike an jî ji yek aliyan wê bike mijara propaganda ji ber vê îhtîmalê dibe ku bibe mijara nîqaşan. Birêz Ocalan pêşnûmeya nexşeya rê nivîsandibû yek sedema ku demeke dirêj nehate radest kirin em dikarin bêjin ku ji ber vê sedemê ye. Dem bi dem li ser daxûyaniyên ku Tevgera Azadiyê an jî qada siyaseta legal ku derbarê  pêvajoyê de kiribû bilind kirina asta rexneyên mûxalefetê ji hikûmetê re, di rayagiştî de ku bûye mijareke tê nîqaş kirin. Di çûyîna nêzikatiyên wek berdevkên hikûmetê bersivên berovajî bidin û bikevin nav nêzîkatiyên ku samîmiyeta wan bide lêpirsîn kirin bandor kiriye.

Dîsa di derbarê mijarên ku tên nîqaş kirin de îfadeyên ku hatine bikaranîn bi şêwazê nediyar dayîn jî bûye mijara nîqaşê. Aliyek îfadeyên ku tên bikaranîn hîn zelal, şênber û were fêmkirin disepîne, aliyê din jî (wek di helwesta AKP de tê dîtin) dibe ku di nediyarbûna wê de israr bike. Ji ber di rewşeke ku ev were bihîstin yên dijberî wan vê rewşê li hember wan dibe ku bikarbînin fikara wê dijîn. Di rewşên wisa de bi taybet nûnerên hikûmet an jî yên dewletê bi giştî di diyaloga de herî kêm qasî mûxatabên xwe radîkal axaftin, nêzikbûn û bawerî dayînê esas digrin. Lê di fermiyet û platformên ji rayagiştî re vekirî de bi baldarî hewl didin da ku di heman di tonê de ne axivin û bi qasî vê dema ku tê axaftin jî nerehetiyek cîdî jiyan dikin. Hinceta bingehîn ku ji vê re nîşan didin jî fikara ku rikberê wan vê bikarbîne di civakê de wê ji infiale re ango rabûna hêrsa gel re wê rê veke.

Halbûkî nêzikatiya navborî (mewzûbehs) dikare ji encamên berovajî re rê veke. Mînak ji pêvajoyên çareseriyê ji ber sedemên siyasî yên ku dij derdikevin argumanên propagandaya herî dijber ya herî xurt tevlîheviya di serê civakê de ku di xwe de nediyarbûnê diafirîne li ser wê ava dike. Lewma ev nêzikbûn dêrûniya civakê hîn şkestî û bêhêvîtiyê re vekirî dike û bi qasî vê pêvajoyên wisa bê piştgiriya rayagiştî dihêle. Civak herdem perspektîfên çareseriyê ku berjewendiyên hevbeş bigre bin misogeriyê zûtir îkna dibin. Careke îkna bibin piştgirî pêşkêşkirinê re hêz dayînê esas digrin.

Di derbarê rojevê de kîjan xal wê beriya wê were girtin an nayê girtin jî di navbera aliyan de bazariya rasterast dikare bandor bike. Ji bo ev pirsgirêk were derbas kirin piranî di merhaleya plansaziyê de li ser pêşekiyê hewl didin lihev bikin. Nexşeya rê ya Birêz Ocalan ji vê re mînak e. Di navbera aliyan de hedefên nîhaî ku bi lihevkirinê heta kêliya dawî di navbera aliyan de bêyî ku bizivirînin belgeyeke fermî hewl didin ku veşartî bigrin. Pêvajo bihevve girêdayî û ji ber ku jihev bandor dibe pêvajoyeke ku were serxistin ji bo pêvajoya din bi hêsanî were pêkanîn rehetiyeke çêdike.

## DI MÛZAKEREYAN DE MIJARA CÎH

Mûzakere li kîderê, kîjan welatî an jî bajarî were kirin carnan piştî hevdîtinên dirêj tên diyar kirin. Mînak, di navbera du welatan de li ser pirsgirêka lihev nekirinê em mijar bigrin dest, wek xwezayî ji bo

mûzakereyan her du alî jî hildibijêrin ku di mala xwe de pêk bînin. Sedema vê ya sereke di mijara lojîstîkê de hebûna feydeya pratîkî û hêsanbûnê ye, lê sedema wê ya esasî bidestxistina serdestiya derûnî ye. Bi anîna welatê xwe ya aliyê din, tê xwestin ku baweriya '*ji destpêkê ve bihêz e*' biafirîne û ev, ji daxwaza qezenckirina prestijê tê.

Mina ku ji vê jî tê fêm kirin, di mûzakereyên girêdayî lihev nekirinan de, hema hema em qet rastê nayên ku her du alî qabûl dikin ku li welatên hevdû werin cem hev. Ji bo ev pirsgirêk were derbas kirin piranî serî li sê rêbazan tê dayîn. Li welateke bêalî, cihekî dûrî paytextên aliyan, bi dorê li paytext an jî di bajarekî aliyan de hevdîtin û mûzakere tên birêvebirin. A rast sedema bingehîn ya tevahiya van nêzikatiya îmaja welatê serdest parastin û zirar nedîtina wê ye. Di vê de jî lîmîtê (sînorê) herî jor pêwîste hîn zêde were dîtin. Lîmîta vê ya herî jêr jî hewldana xwe wekhev nîşandayîne. Di zirûfên esaretê de jî ji sekna xwe ya bi rûmet tawîz nedayîna Birêz Ocalan, heta cihê ku heta dawî di nava zirûfên ne wekhev de ye jî ji xwe re xas, pozîsyoneke pir cûda afirandin, ji pêvajoyê re pêşengtî kirin sekneke ku vekolîneke taybet dixwaze ye. Di rewşên xwezayî de zirûfên ku ji dewletan re awantajên mezin pêşkêş dikin Birêz Ocalan rûxmê her cûre astengiya ji cihê ku lê ye cîhana derve xwendiye, bêyî ku bikeve bin bandor û pozîsyona ti aliyan bi vîna xwe ya azad alternatîfên çareseriyên herî guncaw û ji yekî zêdetir herkesî ji xwe re heyran hiştiye. Ev enceq sekneke taybet a Birêz Ocalan e, xwe dispêre arasteya zanabûneke mezintirîn, vîn, giyan û dêrûnî ye. Birêz Ocalan ku xwedî van tevahî awantajan e, tevahî dezawantajan zivirandiye awantajê. Lewma di aliyê fîzîkî de li Imraliyê be jî weke vîn, giyan û zanebûn di her kêliya dîrokê de ye û tam di navenda heqîqetê de ye.

## ŞÊWAZÊ MÛZAKEREYAN

Şêwazê mûzakereyên pirsgirêk an jî lihev nekirinan ve girêdayî xisûseke ku pêwîste berî wê bigrin bin biryarê ye. Ya asayî ya rast mûzakereyên rû bi rû ye. Lê di pir rewşan de alî beriya ku rasterast werin gel hevdû bi navbeynkariya wasitayan mûzakere kirinê hildibijerin. Li vê derê navbeynkar wekî ku risteke hêsan kirinê bileyize rayeya hakem jî dikarin bidinê. Di vê rêbazê de mînak alî di heman otelê de bêyî ku hevdû bibînin,

li ser nûnerên taybet dikarin mûzakere birêvê bibin. Nûnerê taybet aliyê fermî ya sêyemîn an jî NY diyar bike, kes an jî kesên ku alî erê dikin dikare were ava kirin. Pêvajoya piştre ya di mûzakereyan de alî di mijara cîh û şêwaz de lihevdû kirinê hewl didin ku pêvajoyê bimeşînin. Navbeynkar piranî di navbera aliyan de li hemberî hevdû bawerî ava bibe û pirsgirêk an jî lihev nekirin ber bi çareseriyê ve biperise mîsyonê xwe temam dikin lê bi rizaya aliya pozîsyona hakemtiyê girtina ser xwe re heta ku lihevkirin çêbibe rista xwe dikarin bidomînin.

Bi vê mijarê ve girêdayî xisûseke din ku were diyar kirin, di derbarê welatên ku em ji wan re dikarin bêjin lawaz e. Welatên lawaz li hember welatê xurt piranî di naverastên piralî de mûzakere kirinê hildibijêrin, bi vê re welatên lawaz yên din ku heman berjewendiyan parve dikin bi sazkirina hevbendiyê re, hewl didin ku tewazûn çêbikin.

**DEM EYAR KIRIN**

Di mûzakereyan de dem eyar kirin mijareke pir girîng e. Mûzakere wê kengê destpê bike? Wê çiqasî bidome? Ji bo qonaxên hatine diyar kirin wê jê re çiqasî dem were veqetandin? Berê pêşî van mijaran nîqaş kirin û li ser konsensûsek ava kirin xaleke girîng e. Di vê mijarê de ji aliyan yek bi lez tevdigere, yê din jî giran digre pir caran hatine jiyan kirin. A rast ya ku pêwîste bibe di mijara pêwîstiya mûzakereyan de di milê her du aliyan de lihevkirina rêgezî hatibe çêkirin, nêzîkatiya herî guncaw bêyî ku dem were derbas kirin li gorî salname (teqwîm) û pêvajoya hatiye diyar kirin destpêkirina muzakereyan e. Di vê mijarê de yê ku lez dike wek aliyê lawaz dibe ku xûya bike. Li gel vê wekî ku hin berpirsiyariyên din yê aliyan bibe mijara gotinê, pêvajo piranî navhevde û bi nêzikbûnên hesas dikare pêş bikeve. Pêwîste were zanîn ku aktorên ji pêvajoyê nerazîne îhtîmala pêşketinên hûndir û derve dibe ku were jiyan kirin berçav girtinê ji bo gav avêtinê zirûfên guncaw ku dîtine û di nava dema hatiye diyar kirin de vê gavê avêtin wê hîn zêde hêz û piştevanî bide. Bi vî şêwazî pêşiya kişkirinê (provokasyonê) û hewldanên dijber jî wê were girtin. Di rewşa berovajiya wê de zirûf û derfetên destwerdana li hêzên dijber, hevkarên cûda yên nû afirandine bihêzbûna re wê fersend ava bike. Lewma di pêvajoyên wisa de bibiryar nêzikbûn li gorî teqwîma hatiye

diyar kirin bi rêgez û hevgir tevgerandin, xwedî derketin, qasî li hember kişkirinan binneketin ji yên kiş dikin re ji nêzikatiyên ku hêvî û cesaret dide xwe dûr xistin, ji taybetmendiyên hesas, şikestî û ji bandorbûnê re vekirî nîşan nedayîn, şûnde gav neavêtin, hedî nebûn di pêvajoyên wisa de xisûsên girîng ku bi baldarî li ser were seknandin in. Di pêvajoya hate jiyan kirin de Birêz Ocalan û Tevgera Azadiya Kurd rûxmê ku gavên wêrek û fedaiyane avêtin lê li hember vê hikûmeta AKP di heman astê de nêzikatiyên samîmî nîşan nedaye.

Di her zirûfî de belgeyên hevbeş û pêşnûmeyan amade kirin, vesaziyên pratîk temam kirin demek dixwaze. Serkeftina encamê di asteke de ji bo bigrin bin misogeriyê ji bo şêwirmenda çêbikin ji demeke diyar re pedivî tê dîtin. Aliyê mûzakereyan çiqasî hejmarek zêde û mijarên ku hevdîtin werin kirin çiqasî hesas bin wê pêvajoya amadekariya ewqas dirêj bike.

Di mûzakereyan de xala herî girîng ku dibe mijar hem şêwaz hem jî xala her du alî di heman statûyê de bin. Her du alî jî bernameya ku hatiye diyar kirin û nexşerêya ku lihevkirinê ji bo bi şêwaza hatiye plan kirin bimeşe di asta wekhev de pêwîste xwedî zirûfê xebatê bin. Heta ku ev zirûf neyên ava kirin pêvajo wekî tê xwestin birêve birin û merhaleyên wê pêk anîn ne gengaz e. Lewma pêwîste bibe mijara ku herî zêde li ser bi cîdiyet were sekinandin. Ji bo pirsgirêkên xwe bicîhkirinê di serî de pêdiviyên cûr bi cûr û zirûfên xebatê ava kirin girîng e.

Rûxmê ku ev tên zanîn dîsa jî ger zirûfên wekhev yê aliyan neyê sererast kirin ji yekî zêdetir Sedemê xwe dibe ku hebin. Ger em li ser van sedema bisekinin; dibe ku di encama daxwaza bi giran dayîna ber xwe be. Di vê rewşê de bi niyet ve girêdayî dibe ku di nava bendewariyên cûda de bin. Ji ber ku bi giran dayîna ber xwe çalakiyek bi zanabûn be. Şayet sedemên tê fêm kirin hebin û ji mûxatabê xwe re daxûyeniyek bi mantiq ger nayê dayîn tê wateya ku li ser ajandayek din pêkanîn hene. Di vê rewşê de berdewam kirina rewşê pir zehmet dibe.

Îhtîmalên din; zirûfên newekhev ji bo girtina tawîzan wek koz dibe ku bikar bînin. Zehmetiyan derxistinê re di mûxatap de bendewariyên takekes dibe ku dixwazin bikin rojev. Hîn zêde zext ava kirinê re mûxatap kişandina rojeva xwe, biryarên şaş girtinê re, di navbera mûxatab û taban-

gelê wê de nakokî ava kirin dibe ku xirakirina îmaja wan armanc dikin. Ev û sedemên wek vê mafên xwezayî jî wek koz dibe ku bixwazin bikar bînin. Sedem çi dibe bila bibe rewşên bi vî rengî ku bibin sedema bêbaweriyê heta ku neyên dahûrandin bi şêwazeke bi îstîqrar pêvajo domandin ne pêkan e.

Zirûfên Birêz Ocalan dema ku em digrin baldariyê zirûfên pir newekhev ku pêvajoyê bandor bike heye. Mînak Birêz Ocalan qet nikare not bigre, tu belge li ba xwe nikare bigre, civînên xwe bi pergalî nikare çêbike, nikare tomar (qeyd) bike, îmza nayê bikaranîn, danûstandina belgeyan nayê kirin, çapemenî û saziyên civaka sîvîl re derfetên ragihandinê nayên dayîn em van tevahî dizanin. Ji vê rewşa tevahî encamên ne diyar ku derdikeve her çiqas hevdîtin û diyalogên demdirêj hatibin kirin jî hikûmet hîn jî helwesteke zelal diyar nekiriye.

## ASTA MÛZAKEREYAN, PÊKHATE Û MEZINBÛNA ŞANDEYAN

Xisûseke girîng ku beriya mûzakereyan biryara wê were girtin mijara hevdîtin wê di kîjan astê de were kirin zelal kirine.

A rast, ast girîngiya mûzakereyê, derinceya wê tayîn dike. Ast çiqasî bilind be mijar jî ewqas girîng e. Di vê wateyê de wisa tê hesibandin ku mûzakereyên asta bilind zûtir encam tê girtin. Îro li gorî kevneşopiya ku xwe dispêre serdestiya netew-dewlet her welat bi taybet civîn û mûzakereyên piralî berê di kîjan astê de hatibe diyar kirin jî xwedî mafê nûnerê xwe hilbijartinê ye. Mûzakereyên dualî û di pir rewşan de dîsa hevdîtinên ji diduyan zêdetir aliyan agahdar dike dema ku dibe mijara gotinê, alî nûnerê aliyê din ji asta xwe kêm bibîne ji ber wê bifikirin ku wekheviya navbera wan wê xira bibe dibe ku qebûl nekin.

Wek rêgez her welat pêkhate û mezinbûna şandeya xwe diyar kirinê de serbest in. Lê bi taybet di mûzakereyên dualî de hejmara endamên şande berê ger misoger neyê diyar kirin jî piranî bi sondajên pêş tewazûneke diyar berçav tê girtin. Yek an jî du endam zêde be an kêm be wekî ku pir ne girîng e, aliyek bi şandeyek ku mezinbûna wê maqul were temsîl kirin, aliyê din bi şandeyek du qetê wê were ser masê guncaw nabe. Di vê rewşê de girîngiya xebata sondaja pêş bi tendûristî kirin derdikeve holê. Bi

şêwazekî şandeya ku hatiye ava kirin ji aliyê din re ragihandin an jî bi heman şêwazî şandeya ku hatiye ava kirin asta wê ya nûneriyê fêr bûyîn (ji kê/kî ava dibe, çend kesin hwd) wê pêşiya encamên nexweş bigre.

## BI ŞÊWAZEKE FERMÎ DESTPÊKIRINA MÛZAKEREYAN

Vegotinên me yê heta niha xebata amadekariyek pêş yê pêwîst bû. Ev xebat herî kêm bi qasî pêvajoya mûzakereyan xebatên girîng in. Ji van xebatan re em dikarin hinek jî bêjin xebatên bingehîn. Merhaleya mûzakereyên fermî ji ber wê li ser vê avaniyê ava bibe çiqasî qewî were ava kirin avahî jî wê ewqasî bi çawanî û qewî be. Piştî tevahî amadekariyên beriya mûzakereyên fermî êdî tên qonaxa destpêkirina mûzakereyan.

Me li sernivîsên jor dabû diyar kirin ku mûzakere ‘dualî’ an jî ‘piralî’ dabeş dibin. Heman şêwazî mûzakereyan wek ‘çareseriya lihev nekirina’ û ‘hevkarî pêşxistin’ dabeş kirin pêkan e.

Di aliyê naverok de jî alî xala ku di mûzakereyan de dixwazin bigihêjin ji serî heta dawî diyar kirin û di dema mûzakereyan de helwesta ku bişopînin beriya wê pêwîste diyar bikin. Jixwe misoger pêşnûmeyek mûzakere an jî talîmatek aliyan divê hebe. Beriya wê nêrîn û pêşniyarên saziyan ve eleqedar ya jor an jî tevahî saziyên pêwîst girtinê re bi encamê tê girêdan.

Di çarçeveya pêşnûme an jî talîmatê de li gorî pêşdeçûnên mûzakere rayeya tevgerandinê di şandeyê de dibe.

Di maseya mûzakereyan de taktîkên ku pêwîste werin pêk anîn hema hema standart bûye. Encama ku di serî de jê razî bin hertim zêdetir tê xwestin. Tawîz qasî ku pêkan e dereng û hedî hedî tê dayîn. Zîra tawîzên ku di destpêkê de werin dayîn daxwazên din dibe ku biafirîne. Di mûzakereyan de alî hertim di xala daxwazên xwe de ji lihev kirinê re çiqas û bi pahaya çi amadene hewl didin ku biceribînin. Di mûzakereyên fermî de bi helwestên ku alî deynin destpê dike. Alî piştî ku di derbarê nêzikatiyên bingehîn yê beramberî xwe fêr dibin çend bijarde derdikeve holê. Ji van ya yekemîn; li ser helwesta ku aliyek daniye lihev kirinê bê nîqaş qebûl kirin, lê li vir pêwîste em bêjin ku, ev helwesteke pir nadîr e.

Alî beriya mûzakereyên fermî destpêkê hevdîtinên dualî an jî piralî an jî di mûzakereyên pêş de ger gihabin lihevkirinekî, rewşeke wisa dibe ku werin jiyîn. Em dizanin ku di roja me de pir zêde serî li vê rêbazê tê dayîn. Di têlevizyonan de wezîr, serokwezîr an jî serokomar pişt xwe û li kêleka xwe şandeyên ku rêzbûne protokola îmze dikin. Ev hevpeyman piştî komîsyonên di asta jêr de, bûrokratan û şandeyên bi mijarê re eleqedar mûzakereyên ku dimeşînin tê îmze kirin. Jixwe ev şêwaz dema ku tê şopandin heta ku lihevkirin çênebe civînên fermî nayên çêkirin.

Îhtîmala duyemîn alî beramberî hevdû zirûfên bazariya ku datînin holê di lehê xwe de xebatên başkirinê ye.  Ev bazarî wekî ku di civînên fermî de tên kirin di kurtûpistên (kulîsên) civînan de û paytexta xistina dewrê re di naverastên dualî de jî dikare were domandin.

Sêyemîn û ihtîmala dawî jî bi rêya bazarî jî be piştî ku nikarin lihev bikin derdikeve holê ku qutbûna mûzakereyan e.

Di mûzakereyan de mijara hêza bazariya aliya heta dawî mijareke tevlîhev e. Ev pêvajo stratejî û taktîkên ku tên şopandin rasterast dikare bandor bike. Di pêvajoyê de carnan mijarê pir ji rêzê kirinê re, ji mûzakere re di pozîsyona xurt de destpê kirin pêwîst e. Lê di destpêkê de bi mantiq were jî pir zêde wateya wê nîne. Beriya her tiştî yek ji aliyan li gorî yê din di pozîsyonek hîn xurt de be ji mûzakere zêdetir hebe aliyê ku mijara gotinê ye ji aliyê din re encamê dayîna qebûl kirinê zêdetir tiştek wê dernekeve. Wekhev an jî di aliyê hêz de nêzikî hev bûyînan nebûyin awantaj û dezawantajên xwe hene.

Di mûzakereyan de tawîzên ku dibin mijara bazariyê dibe ku herdem di heman astê de nebin. Xisûseke ku aliyek pir girîngî nediyê lê ji bo aliyê din dibe ku xwedî nirxeke cûda be. Ji ber vê sedemê gûhertina tawîz di bingeh de gihandina tewazûnê armanc dike. Em dikarin ji vê re bêjin di xalên hevbeş de gihandina herî mezintirîn. Di têkiliyan de her gav wek çawanî û çendanî ti dem nikare di heman rêjeye de be. Ger alî ji masayê nerabûbin mûzakere piranî bi lihevkirinê encam dibe. Lihevkirin tê wateya ji helwesta aliyan yê destpêkê hîç nebe gavek paşde avêtin e. Paşketina mijara gotinê herdem ji bo her du aliyan jî dibe ku di heman weznê de

nebe. Carnan ji aliyeke tawîza ku daye bêyî ku tam bersiva wê bigre dibe ku pêşniyara qebûl bike.

A rast di bingehê lihevkirinê de ger lihevnekirina aliyan berdewam be bendewariya aliyan tam pêşwazîkirinê hîn zêdetir parve kirin dirazê. Lihevkirin di rastiyê de ji milê aliyan ve ji bo zirûf werin guhertin vîna beşek ji daxwaziyê xwe paşve dayînê danîna holê, piştre jî zirûfên rewşa nû ku ava bûye di encama bazariya ku gihane bi şêwazê du merhale ev pêvajo dikare were jiyan kirin.

## DÎPLOMATEK BAŞ PÊWÎSTE ÇAWA BE?

Taybetmendiyên dîplomat an jî yê mûzakere dike pir girîng e. Beriya her tiştî nêrîne aliyê xwe bi şêwazeke herî bi bandor diparêze, vê jî berjewendî û nêrîna aliyê din bi lihevanînê re zemînê wê dîtin jî girîng e. Jixwe mîsyona xwe ya yekemîn jî ev e. Ji bo vê dîplomat e. Ev heta dawî mijareke zehmet jî be, kesayeta ku vê xebatê birêve bibe asta zanabûna herî bilind ku gengaze û bandora wê divê hebe.

Dîplomasiya her welatê ku dîplomat xebat lê bimeşîne bi qasî taybetmendiyên xwe yên dişibin hev, taybetmendiyên xwe yên cûda jî wê hebin. Mînak, di giştîbendên dîplomasiyê de heman tişt pir heye, lê adet û teqalîta her welatî yanî çand, hişmendî, netewa wê çi dibe bila bibe milên xweser yên avaniya madî û manewî hildigre. Lewma ev xweserî bixwaze nexwaze ji dîplomasiyê re di astekî de diteyise. Di vê rewşê de her welatê ku xebat lê were meşandin bi hemû aliyê wê ve pir baş nas kirin pêwîst e. Mînak, çanda Ewrupa cûda ye, çanda Rojhilata Navîn cûda ye. Li gel van cûdabûnan taybetmendiyên her welatî yê mexsûs hene. Îcar ger pêkan be heta berfirehiya herî biçûk fêrbûn û hakîmiyetek çêkirin mijareke pir pêwîst e.

Sedema bingehîn ku Birêz Ocalan li ser siyasetê ewqas hakîm e ji ber ku pergala cîhanê dahûrandiye. Sedema ku PKK tekane tevgera ku Tirkiye pê nikare ye, Birêz Ocalan dîroka Tirkiye, kevneşopiya dewletê, dêrûniya civakê, feraseta siyasetê, rastiya rojane bi her milî ve baş dahurandinê re rasterast girêdayî ye. Lewma welat-civaka ku xebat lê were meşandin bi tevahî aliyê wê ve fêrbûn ji bo dîplomatekî mijareke pir girîng e. Di

futbolê de maçên navnetewî hene. Taximên ku tevlî van maçan dibin hevdû an nas nakin an jî li ser şopandineke pir giştî nas dikin. Heta taximên ku hevdû bêyî ku nas bikin mecbûr mane maç bikin hene. Tevahî zirûfên ku me hejmartin ji bo taximeke dezawantaj in. Jixwe kê/kî vê rewşa dezawantaj bizivirîne rewşa bi awantaj şensê serekeftinê zêde dibe. Ji bo vê pozîsyonê bigrin yên ku wan fêr dikin piranî rêbazeke wisa dişopînin: taximê ku rikberî wan e ji nêz de digrin şopandinê. Di derbarê rikberê xwe de agahî kom dikin, xwe gihandina dîmenên beriya vê maçên ku derve û hûndir leyistine dinêre û dinirxîne. Taximê rikber bi tevahî aliyê wê ve vekolîn kirinê re hewl dide nas bike. Bi vê re jî xwe bes nabîne maçên rikberê xwe yê hûndir û derve ku dileyize ji bo bişopînin vekirî an jî veşartî diçin. Di maçê de di derbarê her taybetmendiyê rikberê xwe de notan digrin. Yê di kelhê de çawaye, saha navîn, defans, her sisêyên pêş çawa hatine ava kirin, tempo kengî bilind dibe, di kîjan daqîqê de dikeve. Xûlase tevahî taybetmendiyên qels û xurt hewl didin fêr bibin. Ev pêvajo demeke dirêj digre. Bi roja bi hefteya heta carnan mehan jî digre. Di milekî de li ser encamê ku taximê xwe derxistiye holê perwerde dike û hewl dide motive bike. Heta demjimêra maçê ev pêvajo dirêj dike. Beriya maça bi waneyên motîvasyonê taximê xwe di her alî de ji maçê re amade dike. Li vê derê belki jî xala herî girîng ku divê li ser were sekinandin yê ku lîstikvanê futbolê amade dikine li gor lîstikvanê taximê din an jî hemberî wan, li gorî maçan û hewaya maçan dayîna xebitandin e. Lîstikvanên ku vê motivasyonê girtine di çavên wan de maç tenê dibe ‘derkevin û bileyizin’. Tevahî hêmanên din wek hûrgûlî dimînin û bêbandor dibin. Tiştê ku bikin motivasyona ku girtine ji sahayê re teyisandin e.

Di vê rewşê de lîstikvanê taxima rikber lîstikvanên herî baş yê cîhanê jî bin a rast beriya maça ku were leystin ji ber di hişmendî de hatiye serxistin bûye wek maçeke formalîte. Wek xwezayî hêmana dezawantaj tê bêbandor kirin. Tevahiya van qonaxên amadekariya bi rojan, bi hefteyan û bi mehan dajo, tenê ji bo lîstika ku dema wê 90 xûlek e, derketina sahayê û serketinê ye. Taxima ku li beranber rikberê xwe erkên xwe baş bi cîh anine, xwe baş amade kirine, li ser vê stratejî û taktîkên xwe rast danîne, li gorî rikberê xwe ev taxima ku pir lawaz e taxima ku di cîhanê de xwedî lîstikvanên herî baş e bi hêsanî têk biriye. Di futbolê de berê ji encamên wisa re digotin ‘*encamên nişkegavî yên rasthatinî (netîceyên*

*sûprîz yên tesadûfî)'*. Niha jî encamên ti maçan wek nişkegavî nayê pêşwazî kirin. Ev jî dide diyar kirin ku rikberê xwe naskirin çiqasî girîng e.

Welatek polîtîkaya xwe ya derve û têkiliyên xwe li ser tewazûnên diyar dimeşîne. Lewma di qadekî de pirsgirêka ku dijî an jî pêşdeçûna tewazûna têkiliyên giştî bandor dike. Di vê wateyê de her tim guhertinekî jiyan dike. Şopandina wan ya giştî heta dawî girîng e. Di hevdîtinên dîplomatîk de nêzikatiyên taktîkî di vê şopandinê de li ser daneyên ku tên bidest xistin tê saz kirin. Lewma her cûre pêşketinên erênî an neyênî ku rikber dijî, sedemên wê, hedefên wê, encamên wê baş zanîn û li gorî wê pengav pêşxistin heta dawî girîng e.

Bi vê re, aliyê ku hem temam dike hem jî diyar dike xwe pir baş naskirina dîplomat e. Di destpêka her tiştî de paradîgmaya şaristaniya demokratîk, rehendên wê yên bîrdozî, felsefî, polîtîk û çandî hûndirîn kiriye, di milê arastekirina hişmendî de xwe pêkanînê de mesafeyek diyar pêwîste girti be. Dîsa dîroka xwe zanîn, rastiya herêm û cîhanê baş nas kirin, nakokiyên nav pergalî û nakokiyan, tewazûnên hêz, pêşekiya pêwîste fêmkirî be. Berovajiya wê nakokiyên cîdî û bi pirsgirêk wê werin jiyîn.

Xûlase pirsgirêkan çareser kirin, derbaskirina lihevnekirinan de ji bo têkiliyên bi sûd û mayînde biafirînin dîplomat pêwîste di paradîgmaya xwe de kûr bibe, asteke hûndirînkirinê pêwîste girtibe, dîsa ezmûnên cûda yên welatan, hişmendiya wan, pergala wan yê siyasî û aborî, adet û teqalitê wan nas kirin pir pir girîng e. Dîsa mirov bibe xwediyê têgihîştin û hîskirineke kûr a girêdanên ku di navbera wan de wê bibîne û wê ava bike jî, têra xwe girîng e.

Xaleke girîng ya din jî pêwîste dîplomat xwedî çanda demokratîk be. dîplomat nikare reş û spî bifikire. Mentiqê wî/wê pêwîste ji çanda demokratîk xwe xwedîkirî be. Di rêgezên xwe de mentiqê xwe yê dîplomatîk pêwîste fireh û nerm be. Rêyên nabos (bê-derketin) pêşbibîne heman kêliyê de ji yek zêdetir bijardeya bikaribe bifikire, ezmûnek xwe yê afrîner, herikbar, bi hûner hebe û di vê mijarê de xwedî pisporiyeke serwer û bawerî girtin jî mijarên pêwîst in.

Xebatkarên dîplomasî bi qasî aliyê din bi saziyên xwe yê eleqedar re jî mûzakere dikin. Di serî de talimat-perspektîfa ku tê girtin çiqasî rasteqîn

û nerm be xebatkarên dîplomasî jî ewqasî wê rehet bin. Lê piranî ti talimat hîn di destpêkê de tevahî pêşketinên mûhtemel ku di mûzakereyan de pêşbikeve dibe ku pêşnebîne. Lewma di xaleke diyar de pêwîstiya ji talîmatê derketine dibe ku ava bibe. Di vê rewşê de ji erêkirineke nû ya navendê re pêdivî wê derbikeve holê. dîplomat derfetên xwe ji bo vê guhertinê qasî ku ikna bike nebînin tê wateya ku pirsgirêk heye. Di navbera aliyan de lihev kirin zehmet dibe. Di pêşiya dîplomat de dû rê dimîne. Ya yekemîn, ger derfet hebe ji cihê ku lê ye bi saziyên xwe yê jor yên eleqedar re ketina nav têkiliyê û perspektîfên xwe nû bike an jî wek duyemîn di rewşên ku derfeta yekemîn tinebe talimata kevin bi her tiştê wê ve pêkanînê re binketina xwe fiîlî qebûl kirin e. Her du rewş pir caran werin jiyan kirin ya yekemîn baweriya dîplomat wenda dibe, ya duyemîn jî di şexsê dîplomat de welatê ku tê temsîl kirin prestîja wê derb dixwe. Di vê xalê de bersivên amade, xwedî zekayeke herikbar ku bersivên ku aliyê din îkna bike an jî berovajiya wê jî bifikire mecbûrî qebûl kirinê bimîne pêşxistin girîng e. Xala hesas, bêyî ketina nava panîke xwînsar bûyîn û bersivên bi mentiq afirandin e. Dîplomateke ku li ser waneyên xwe baş kar kiriye, tê wateya ku ji hevdîtinê re amade ye.

Bi taybet di kêliya hevdîtinan de, 'di vê mijarê de ez nikarim tiştekî bêjim, ev min derbas dike, pêwîste ez bi navenda xwe re bişêwirim, piştî axaftinê ez ê agahî bidim we, careke din wê pêwîst bike em hevdû bibînin' têgehên wisa pir bikaranîn hem di şexsê dîplomat de hêza ku temsîl dike îmaj û prestîja wan deq dike hem jî ji aliyê din re kesê ku bi wan re mûxatap bûye bawerî nade, cîdî nayên girtin, ji hevdîtinan encamek dernakeve hwd nêrînên negatîf ava dike.

Di hevdîtinên dîplomatîk ku dikevin rewşên wisa de aliyê din *'van xala bi navenda xwe re biaxivin biçin biryareke. Ger hûn biryarê bigrin wê wisa be hûn negrin wê wisa be. Em benda bersiva we nin'* dibe gotinên wisa bikaranînê re biçe. Dîplomasiyeke bi vî rengî were kirin wê ji feyde zêdetir zirar bide. Ger bêjin çima; ya yekemîn, dîplomatê nûner di wan zirûfan de heta dawî wê bikeve rewşeke ji rêzê. Ya duyemîn, bi vê ketinê gel an jî welatê ku temsîl dike îmaja wê derbeke giran digre. Ya sêyemîn jî, aliyê din bi derketina derveyî fermiyeta hevdîtinê, li ser nûner di xisûsa ji

gelekî re heta ji welatekî re qasî ku pêwîste çawa nêzik bibin perspektif dayînê re wê cûret bike.

Mijareke din ya girîng jî dîplomat pêwîste ji uslubê negatîf dûr bisekine. Mînak, uslubê '*ev nabe, ev ne pêkan e, em nikarin vê bikin, hûn nikarin vê bixwazin, ev şaş e, ev ne rast e*' hwd qasî ku pêkan e pêwîste neyê bikar anîn. Beriya her tiştî ev uslup ne uslubek dîplomatîk e. Di vê rewşê de aliyê din di kêliya wê de wê ferq bike ku dîplomatek profesyonel li beramberî wê nîne. Hîn ne têkuz e an jî ji mijarê re xwe baş amade nekiriye. Waneya (dersa) xwe baş ne xebitiye, xûlase di wê kêliyê de wê fêm bike ku li ser karê xwe ne serwer e. Lewma dîplomatek bi berfirehî fikrandin, bijardeyên bi pir alternatîf pêşkêş kirinê re aliyê din li ser bijardeyên xwe ponijandin nîşaneya dîplomateke serkeftî ye. Bi vê nêzikatiyê hem pêşiya xetimandinên îhtîmal digre, hem jî li ser aliyê din jorbûna derûnî digre.

Pêkanîneke ewlekarî û bandorê zêde bike di pêvajoya avakirina hevdîtinê de talimatên dîplomatan dema ku tên amade kirin di serî de lazime vê mijarê tevlî bikin. Bi vê şêwazê dîplomat aliyeke de aliyên têknik û siyasî ji destê yekî agahiyên berfireh digrin, aliyê din de hêza ku temsîl dike nêzikatiya siyaseta hûndirîn û tewazûnê bi fêrbûnê re di kîjan mijaran de paşketin ne pêkan e wê fêm bike. Di dawiyê de dîplomat di nava mûxatabên xwe de di xûleka (deqîqeya) dawî de li gorî kesê ku kirine serokê heyetê wek keseke hîn bi prestîj û giraniya xwe heye were dîtin. Di vî alî de tedbir neyên girtin dîplomatê di hevdîtinê de bi mantiq, agahî û nirxandinê xwe re dibe ku mecbûr bimîne rewşê îdare bike. Nûner wekî xwezayî di vê rewşê de baweriya xwe wenda dike. Di vê mijarê de tim û tim guhertina talîmatan an jî di rewşeke ku ji navendê herikîna perspektîfan raweste de, dibe ku aliyê din li hember dîplomat bikeve nava nêzikatiyên bi guman. Dibe dest bi fikrandinên wekî '*gelo çi dibe, ma ev ne keseke rayedar e?*' bikin. Pir dubarebûna rewşên wisa dibe ku bigihîje radeya ku aliyê din şandeya nûner diyar bike. Mînak, 'bi hevdîtinê re wê kî were. Ev neyê nabe, em dixwazin hevdîtinê bi wê/wî re bikin' bi vî şêwazî sînorê bazariyê hîn di merhaleya destpêkê de dikarin daxin asta herî jêr. Lewma di dîplomasiyê de benda herî girîng ji aliyê din re baweriya xwe dayîna qebûl kirin, baweriya aliyê xwe girtin û nehejandina vê ye.

Dîplomat bi armanca awantaj bidest bixe ji bo bala aliyê din belav bike nêzikatiyê wek fort (blöf) carnan dibin mijara gotinê. Carnan pîvan pir derbas kirin dibe sedema bawerî wenda bibe. Taybet jî nîşandayîna fortê, dibe ku bibe sedema encamên bê-tam (ne xweş). Neketina nava nêzikatiyên wisa ya herî rast e, lê ger mecbûr bimînin jî heta dawî bi pîvan û îstîsnaî kirin ya herî rast e. Dîplomatek baş helwest û fikarên aliyê din yê ku baş dixwîne ye. Dîplomateke ku niyetên rast yê aliyê din an jî sînorê tawîzên ku bide şaş binirxîne nikare bibe dîplomatek serkeftî.

Bi heman şêwazî dîplomatek ku tenê bi şêwazeke hişk talîmatên xwe dubare dike, bi vê re xwe bes dibîne jî ji sifatê dîplomat re layiq nayê ditin. dîplomat qasî ku pêkan e ji nêzikatiyên subjektîf û atifî divê dûr bisekine. Nûnerên aliyê din sempatîk an jî antîpatîk dîtin divê helwestê wê/wî bandor neke. Heman şêwazî, ji serokê heyetê re hin taybetmendiyên neyênî bide, bifikire ku dijminê welat û gelê xwe ye, di bin îfadeyan de her tim hin tiştên neyênî gerandin ji bo dîplomatekî lawaziyek cîdî ye (ku ev ne karê wî/wê ye).

Wekî ku di jor de me xwest em îfade bikin her dîplomat di çarçeveya talimata ku hatiye dayîn mecbûre ku tevbigere. Heman şêwazî her dîplomat erka ku jê re hatiye dayîn bi şêwazeke herî baş ji bo bîne cîh çi ji destê xwe tê hewl dide pêk bine. Dîplomat derveyî talimata tevbigere an jî ji encamên cûda re bibe sedem bi zanabûna jê hesap were xwestin erk pêk tîne. Rûxmê vê kesekî/ê van zirûfan re lihev nake ne dîplomate û ji vî karî re kapasite xwe têrê nake pêwîste ev yek were dîtin.

Derveyî dîplomatan siyasetmedarên ku diçin muzakera û hevdîtinên cûr bi cûr şêwirmendên ku ji dîplomasiyê fem dikin didin kêleka wan. Ev hin encamên îhtîmal ku tê pêşdîtin, ji bo pêşiya wê girtin e. Jixwe wekî ku tê fêm kirin mantiq û nêrandina siyasetmedar û dîplomat ti dem wek hevdû nabe. Dîplomasî xebateke profesyoneltî dixwaze ye. Aliyê din de ji bo dîplomat qasî objektîvîzma pir zêde sûbjektîvîzm jî pêwîste jibîr neke ku wê bibe handîkap. Lê pêwîste jibîr neke ku beriya her tiştî parêzvanê berjewendiyê gelê xwe ye û nûnerê wan yê wê derê ye.

Ji bo ku dîplomatek bi heman baldariyê bikare hevdîtinên ku carnan bi rojan, bi hefteyan dewam dike bişopîne, girîng e ku xwedî fîzîkek qewî be.

Divê bikare zelal bifikire, bêyî ku di nava hûrguliyan de wenda bibe, bingehê mijarê bi şêwazeke lez û herikbar divê bikare fêm bike. Li gorî cihê wê divê wêrekbûnê û xweragirtinê (sebrê) jî bizane. Carnan wek pêwistiya taktîk dibe ku bikeve nav nêzikatiyên bêsebir. An jî xwe aciz nîşan bide. Ev cîh, zeman, zirûf û mîqtarê wê qasî ku baş eyar bikin dikarin encam bigrin. Lê, pêwîste neyê ji bîr kirin ku pir zêde, bêpîvan û ne di cihê wê de were bikar anîn ev nêzikatî wê bandora xwe wenda bike û ji encamên ne xweş re wê rê veke.

Dîsa dîplomatek '*destê xwe li mase bide*' keyfa gel jê re were jî (wek mînaka erdogan ya one minute'ê) ev di dîplomasî de rêbazeke ku derbasbûna xwe zêde nîne ye. Hebe hebe di hevdîtinên ku dixetimin û qut dibin de wê bikevin rewşa aktore sereke. Jixwe hemû refleksên anî di wê kêliyê de qasî îmaja ku diafirîne ye. Piştre dema ku bi rastiya jiyanê re rû bi rû dimînin encamên ku derdikevin holê ji hestên poşmaniyên mezin re rê vedike. Lewma dîplomatek tenê ew bixwe nîne. Bi zanabûna berpirsiyariyê xwe tevgerandinê pêwîste jibîr neke. Li gel vê dîplomat ji prestîja xwe ya takekes re ji pêwîstiyê zêdetir pêwîste girîngî nediyê. Ji vê zêdetir ya ku pêwîstî were dayîn, ji serkeftina xwe zêdetir serkeftina karê ku dike ye. Yani bi serkeftî derbasbûna mûzakereyan e. Bi qasî ku vê serbixe wê xwe jî xelat bike. Berovajiya wê ji bo serkeftinên takekes ji pêwîstiyê zêdetir dibe ku mecbûr bimîne tawîzan bide. Ev ne nêzikatiya dîplomatek şoreşger e, nêzikatiyên siyasetmedarên ku di nava pergalê de çand girtinê ne. Bi rastî jî di nava pergalê de dîplomatên ku ji erkê xwe zêdetir xwe digrin cîdiyetê ne kêm in. Ev rewşeke ku dîplomasiya netewa demokratîk pax (tenezûl) nake ye.

Dîsa di hevdîtinên dîplomasiya netewa demokratîk de qet tawîz nedayînê esas girtin jî nêzikatiyek rast nayê hesibandin. Helbet bi tawîz dayîna herî kêm pirsgirêk çareser kirin giring e, lê qet tawîz nedayînê re xwe kilît kirin û xwe bi şert kirin jî li dijî xwezaya xebatên dîplomasiyê ye. Dîplomatek qasî ku bizane liberxwe bide pêwîste nerm û îqna kirinê jî bizane. Pêwîste vana baş eyar bike, dema ku pêwîst bû çareseriyên nû û bi dîtina nêrînê re afrînerî karibe bide nîşandan.

Xûlase dîplomatek an jî mûzakerevanê herî baş ew e, çareseriya ku ji aliyê din re pêşniyar dike, teqez dikare mûxatabê xwe bide îqna kirin ku ew

çareserî bi qasî li gor berjewendiyê xwe ye, ewqasî jî li gor berjewendiyê wan e. Dîplomatê ku di vê mijarê de serkeftî be, dîplomat û mûzakerevanê herî baş e.

## ZIMANÊ DÎPLOMATÎK Û GIRÎNGIYA ZIMANÊ KU DI DÎPLOMASIYÊ DE WERE BIKARANÎN

Bi kesên cûda û saziyan re têkilî pêşxistin perçeyeke girîng ya jiyanê ye, di rêjeyeke girîng de li ser ziman pêş dikeve. Mirov di dorhêlên ragihandinên cûr bi cûr de bi bikaranîna ziman re berwarîhev (paralel), di têkiliyên derve de zimanê ku tê bikaranîn jî taybetmendiyên cûda yê li gor xwe hildigre. Dîplomasiya ku tê wateya bi rêya têkiliyan meşandina mûzakereyan, girîngiya ziman û uslûb a di meşandina mûzakereyan de derdikeve holê. Yek car zimanê dîplomatîk qasî tiştên tên gotin yên ku nayên gotin jî di hûndirê xwe de pêwîste hilgire. Bi îfadeyeke din xwendina navrêzan (satır arası) an jî tiştên ku hatine gotin û ev gotinên ku tiştên veşartî hiştiye û nehatiye gotin jî digre hûndirê xwe. Di vê qadê de zimanê ku were bikaranîn di mijara ji aliyê din tiştên tên xwestin gav bi gav pêşdeçûyîn pêwîste. Tenê qasî tiştên ku em dixwazin gotin bi uslûbeke guncaw (em ji vê re dibêjin uslêbê dîplomatîk) bilêv kirin, aliyê din fêm kirin, heta ku tiştê tê xwestin bidin qebûl kirin bi sebir mûzakere kirin di dîplomasiyê de xala bingehîn e.

Zimanê dîplomatîk di aliyê xebatên dîplomatîk de heta dawî mijareke girîng e. Nûnerê mûxatap an jî dîplomat bi devkî an jî bi nivîskî di pêvajoyên mûzakere de di milê ziman de li ser xisûsên ku pêwîste baldar bin divê bi girîngî li ser were sekinandin. Wekî ku were texmîn kirin zimanê ku were bikaranîn mecbûre qalibên hevbeş ku her du alî li ser lihev kiribin be. Zimanê dîplomatîk nasnameyek *jixwere taybet* wergirtiye. Wekî tê zanîn hêmanê herî girîng ya ku wateya mesaj diyar dike, zimanê ku tê bikaranîn û şêwazê gotinê ye. Ji vê re bi giştî uslûp tê gotin û pêwîste jirêzê neyê dest girtin. Gotin an jî ziman li gorî şêwazê ku tê bikaranîn kêrî qeyranekî bidawî kirin û çareserkirina pirsgirêkan tê, tam berovajiya vê jî dibe ku ji pêşketin û kûrbûna krîzan re jî rê veke. Lewma ziman û uslup di têkiliyên dîplomatîk de wek enstrûmanên herî bi bandor tê pejirandin. Ya rast dîplomasî hêza aqil, zeka û ziman kirina yek ve di encama cîh û dema

rast bikaranînê de li ser hêza rasteqîn ya aliyan hûnera bidestxistina emcaman pir caran tê bilêv kirin.

Di navbera mirovan da armanca esas ya ziman beramberî hevdû veguhestina agahiyan û têkilî saz kirin e. Lê di dîplomasiyê de zimanê ku di pir wateyan de tê bikaranîn, armanca rasteqîn ya ziman veguhestina agahiya zêdetir îma kirin e. Lewma di dîplomasiyê de zimanê ku tê bikaranîn- ji xebitîna agahî dayînê zêdetir xebitîna îfade kirinê jî digre nava xwe.

Xebitîna ziman a îfade kirinê, têkildarî, hesta, fikran û di encam de bijardeya dihewîne, xebitîna dîplomasî jî ji pêdiviya hest û fikir bandor kirinê de ava dibe. Ji ber vê sedemê ziman bi armanca nîda (qîr kirin/bang kirin/deng kirin) bikaranîn ji agahdarkirinê zêdetir bandorkirina yê li hemberî xwe armanc dike. Tam di vê xalê de ziman bi armanca piralî bikaranîn derdikeve holê.

Ji danasîna dîplomasî jî wekî ku were fêm kirin mûzakere li gorî ku bi netew, gel, civak an jî komên cûda were kirin destpêkê pêwîstiya di milê ziman de di zemîneke hevbeş de hevdû dîtin derdikeve holê.  Çêkirina zemîna hevbeş bi şêwazê herkes bi zimanê xwe, xwe îfade kirin û zimanê aliyê din re (an jî aliya) wergerandin dibe. Dîsa wergerandina zimaneke hevbeş ku di qada navnetewî de hatiye qebûl kirin jî wekî ku dibe, bi şêwazê rasterast bi zimanê navnetewî xwe îfade kirin jî dikare pêk were. Lê mijar ji ber berpirsiyarî û berjewendiyên hevbeş eleqedar dike îfadeyên nivîskî an jî bidevkî bi şêwazê ku ji şaş fêm kirinê re rê nede pêwîste net û zelal be. Dema ku em dibêjin zimanê dîplomatîk di wateya giştî de zimanê ku dîplomat dema ku bi hevdû re diaxivin an jî dinivîsin zimanê ku bi kar tînin, terîm (têgeh, jargon) uslûb û xîtabeta ji dîplomat re xweser tê qest kirin.

Nivîskarê Fransî *Delaroche Foucauld* yê ku di sedsala 17. de jiyaye, peyvekî wî xûlaseya zimanê dîplomatîk dide. '*Xîtabeta rastîn, her tiştê pêwîste û tenê ya pêwîstî pê heye gotin e*'. Ramangerek/Fikirnasek din jî dibêje '*Dîplomasî peyvên ku kişandina şura asteng dike ye*'. Tam wisa nebe jî ev diyarde girîngiya ziman û uslûbê dîplomatîk pir baş diyar dikin.

Baş e, bi mûxataban re dema ku diaxivin pêwîste kîjan ziman were bikaranîn an jî fêrî kîjan zimana bibin? Zimanê dîplomatîk kîjan in? Bersiva van pirsan ne hêsan e. Pêwîste destpêkê bê gotin ku ya rast, ti zimanek nîne ku bi tena serê xwe bikare hemû mijaran di wateyekî tam de bide xûyanî kirin (îfade kirin). Ji dema borî heta roja me ya îro zimanên dîplomatîk ku hatine bikaranîn dema ku em lê dinêrin wê bê dîtin ku ev ziman li gorî dema xwe cûdabûn nîşan dane. Mînak, di roja me ya îro de giranî zimanên dîplomatîk ku tên bikaranîn Fransî ango Îngîlîzî ye. Di roja me de zimanên fermî ye NY Erebî, Çînî, Îngîlîzî, Fransî, Rusî û Îspanî ye. Zimanê kar jî wek Îngîlîzî û Frensî tê zanîn. Zimanê YE (Yekitiya Ewrupa) û KE (Konseya Ewrupa) jî dîsa Frensî û Îngîlîzî ye. Lewma di her demê de zimanekî derxistina pêş ji adetê ye. Ji van hemûyan re wekî hincet '*hîn vekirî, hîn nerm, xwedî îfadeyeke hîn baştir, hîn nazik, hîn sade an jî ji bo hevdîtinên navnetewî zimanê herî guncaw*' îfadeyên bi vî rengî tê nîşandan. Lê sedema esasî, xurtbûna siyasî, aborî, bîrdozî û çandî ye. Lewma nêzikatiyek hegemonîk mjara gotinê ye.

Di nava pêvajoya dîrokî de rêbazê dîplomasî jî guheriye. Mînak, êdî, înternet û ragihandin bi şêwazeke berbelav tê bikaranîn. Lewma ji yek zêdetir ziman zanîn ji bo dîplomatek herdem awantaj jî be zimanê ku dikare xwe baş îfade bike bikaranîn divê bijardeya pêşek be. Bi vê re bi taybet kadroyên ku dîplomasiya netewa demokratîk bimeşînin di serî de zimanê xwe yê zikmakî divê pir baş zanibin, li gel vê herî kêm pêwîstiya du zimanan zanînê heye. Zimanê ku dîplomat bi şêwazê herî baş xwe îfade bike bikaranîn ya herî rast e. Di vê mijarê de carnan mecbûriyeta taktîkên cûda bikaranînê jî dibe ku derkeve holê. Mînak, di kêliya hevdîtinek dualî de ji ber kîjan sedemê jî be dema ku ket nederketinê dîplomat zimanê ku herî kêm dizane bikaranînê re tiştê ku aliyê din dixwaze bêje dikare bêje ku min tam fêm nekir. Dikare angaşt (îdîa) bike ku tiştê ew bixwe jî dibêje aliyê din nikare tam fêm bike.

Bi vê rezimanên herêma di serî de hin zimanên bingehîn li ser peyvên giştî fêrbûn di hin rewşan de dibe ku bi sûd be. Mînak, di destpêka hevdîtinan de an jî di pêvajoyan de di zimanê welatek, gel an jî civateke ku tê ziyaret kirin çend peyv an jî hevok gotin ji çêbûna hewayeke hîn erênî re dibe sedem.

Lê rûxmê her tiştî dîplomatên netewa demokratîk li kîderê xebat dimeşînin li ser ziman, çand û adetên civaka wê derê lêhurbûnek taybet divê hebe.

Di dîplomasiyê de zimanê nivîskî, li gorî zimanê devkî hîn diyar e. Ev rewş piranî di têkiliyên dualî de bi lihev kirineke beriya wê û piranî bi sê şêwaza bi encam dibe. Her du alî bi zimanê xwe dikare ji hevdû re binivisîne. Wekî dawî jî her du alî li ser zimaneke ku beriya wê lihevkirinê jî dikarin bikar bînin. Helbet her rewş li gorî xwe awantaj û dezavantaja xwe heye. Bi hesasiyeta wê nêzikbûn hin encamên neyênî yên îhtîmal heta pêşketinên di çawaniya skandal de wê bikare bigre. Mînak, awantajê bi zimanê xwe nivîsandinê heye. Ji ber bi zimanê xwe dinivîse hakîmiyetek tam dikare çêbike. Lê mûxatap dema ku werger dike, îhtîmala hin pirsgirêkan bijî, derdikeve holê. bi zimanê aliyê din jî dema ku tê nivîsandin bi taybet kesê ku dinivisîne pêwîste haqê wê tam bidiyê. Carnan ziman di wezneke de were zanîn jî dibe ku li ser wêjeya wê zimanê pirsgirêkan hakim nebûne jî derkeve holê. Pirsgirêkên wisa û yên wekî vê dema ku tên jiyîn, encamên ku bigihîje skandala dibe ku were jiyan kirin. Lewma di vê mijarê de heta dawî baldar bûyîn, hişyar û bi îtîna tevgerandin girîng e. Xûlase dema nivîsandina ji hevdû re tiştê ku dixwazin vebêjin baş îfade kirin, ji wateyên cûda û îfadeyan re derî vekirî nehiştin bi şêwazeke kurt, cewherî, net û zelal nivîsandin pêwîste. Heta îhtîmala wergervanê aliyê din tam serwer nabe bi berçavgirtinê re nivîsandin girîng e. Bi vê re hem li ser elektronîk şandin hem jî di wateya klasik ji hevdû re nivîsandinê de li gorî amûrê tê şandin heta kêliya dawî berpirsiyarî ji dest nedan mijarek bi cîdîyet nêzikbûn pêwîst dike ye. Mînak, di heman kêliyê de ji pir aliyan re nivîsên ku tên şandin dibe ku navnîşanê şaş bikin, ji vê re bêhûnerî an jî xetaya teknîkî tê gotin.

Dîsa di nivîsandina ji hevdû re têgeh û peyvên ku werin bikaranîn gotin di cîh de be ji wejeya dîplomasî re guncaw dest girtin û di vê çarçeveyê de pêwîste dîplomat xwe xweser perwerde bike. Di roja me de dîplomasiya pir alî ku tê meşandin ragihandina derdikeve pêş bêguman pir tevlîhev heta mijareke ku maliyetek wê ya diyar heye. Di dezgehên nevnetewî yên cûr bi cûr de û pir konferansên dîplomatîk (li parlamentoya Ewrupa konferansa Kurd ya ku tê pêk anîn hwd) pirsgirêka ziman di bin zimanê

fermî an jî yê kar de hewl didin ku çareser bikin. Lê têkiliyên navnetewî ji ber hîn demokratîk dibe di têkiliyên piralî de hejmara zimanên ku tê bikaranîn jî zêde bûye. Bi taybet ji bo pêşiya lêçûnên (mesrefên) giran were girtin di tevahî konferans û civînan de wek rêgezî zimanê ku dikare xwe herî baş îfade bike pêwîste were esas girtin. Lê zirûfên aborî girtina dîqatê ve qasî ku derfet heye hevbeş axaftinê re li ser zimanê ku dikarin lihev bikin hîn rast tê qebûl kirin. Hin çavkanî li gorî hesabên beriya çend sala maliyeta tenê rûpelekî wergerandina tevahî zimanên fermî yên NY qasî malbatekî ku li Kurdistanê dijî, pêwîstiya salekî re di heman rêjeyê de ye hatiye tespît kirin.

Hûrguliyek din a girîng jî, konferans an jî civînên piralî de nûner ger zimanê xebatê (usûl) nizanibin di civînê de di mijara mafê axaftinê girtinê de dudilî dibe ku jiyan bikin an jî xalên herî girîng yê civînê dibe ku birevînin. Ev jî bandora şandeya nûner wekî ku kêm bike encamên bi berhem girtinê jî wê asteng bike. Lewma di mijara usûl de bi ezmûn bûyîn an jî herî kêm kesekî bi ezmûn di şandeyê de cîhdayînê re divê îtîna were nîşandan.

Di têkiliyên dîplomatîk de mijareke girîng jî danûstandina takekes e. Wekî ku were texmîn kirin piranî di kongre û civînan de navberên çay û qehwê ku tên dayîn de sohbetên ku tên kirin ji hevdîtinên fermî û nivîsandinan derfeta encamên hîn girîng bidest xistinê diafirîne. Di sohbetên bi vî rengî de danûstandin bi qasî milê devkî, tona deng (asta nizimbûn û bilindbûna deng), tevgera dest û rû, ken û sekin jî girîng e. Peyveke ku herî jirêzê tê dîtin an jî nêzikatiyek wê were wateyekî cûda. Ev jî dema ku tê fikirandin peyv û nêzikatiyên rast hilbijartin heta dawî girîng dibe. Di dîplomasiyê de ji ber ji peyveke herî jirêze jî wateyên cûda lê tên bar kirin her dîplomat an jî nûner ji ber xetaya wergervan peyvê ku ji şaş fêmkirinê re bibe sedem, ji hewaya neyênî an jî ji ber kêm agahîbûyînê dibe ku bifikire ku aliyê din bi baldarî baş formûle kiriye. Di jor de jî me da xûya kirin, ji hilbijartina peyvan re bi taybet di danûstandina nivîskî de baldar nêzikbûn pêwîst dike. Ji ber di zimanê nivîskî de îfadeyên wek '*pardon destûr bidin da ku bidim fêmkirin*' bikaranîn misoger nîne. Lê heman hişyariyê di uslûbê devkî de jî nîşandayîn pêwîst e. Di kulîsên navber de danûstandinên takekes û têkilî bi qasî bandor kirinê ji bandorbûyînê re jî

musaîd e. Di hevdîtinên bi pêkhateyên netewa demokratîk re were kirin ev dibe ku nebe pirsgirêkek mezin lê bi dewletan re hevdîtinên ku werin kirin ev mijar hin hesasiyetan di hûndirê xwe de hildigre. Helbet ya ku bûyera bandor bike û bertek diyar bike qasî ezmûn û asta zanabûna kesan, arasteya paradîgmayî, polîtîk û bîrdozî ye jî. Tabî ev wê kîjan alî de meyl nîşan bide, vê zanîn zehmet be jî dîplomatên netewa demokratîk xwedî araste, di vê mijarê de bi qasî ji xwe bawer bawerî dide derdora xwe jî derxistina holê berpirsyariya me ya sereke ye. Bi şêwazê din bê bawerî, ji ber wê baweriya xwe bixwe jî wê bihincirîne (zirarê bidiyê) li ser xebateke jirêzê jî wê ji bondoreke cîdî re rê veke. Di taliyê de dîplomasî jî xebateke ku ezmûn jê re pêwîst e. Ger ji bo nebe tarz bi baldarî nêzikatî jê re çêbibe nêzikatiyeke ku encamên wê erênî dikare pêş bikeve. Dîrokê de mînakên wê pir hene. Di navbera Misir û Hîtîtan de pêşketina têkiliyê wan û xurtbûne wê de bandora têkiliya takekes bêguman heye. Di nameyên ku ji hevdû re hatine şandin de milê însanî ku derdikeve pêş vê yekê pir baş piştrast dike. Lewma li gorî cîh û dema wê usûlekî ku pêwîste neyê piştçav kirin e.

Bi vê mijarê ve girêdayî tespîteke din kirin di aliyê temam kirina mijarê de pêwîst e. Ew jî bi nêzikatiyên dem bi dem bi îstîqrar an jî berdewam alî ji bo hevdû bandor bikin her tim bi rêbazên cûda hewl didin jibîr nekirin e. Lewma hin nêzikatiyên wek însanî xûya dikin ji xwezayî zêdetir berhema xîretên bi plan û zane ne. Jixwe di wateya rast de diplomat kesê ku van nêzikatiyan ji hevdû dikare cûda bike ye. Qasî li hember taktîka bin nekeve bi potansiyela xwe ya bi hêz û perwerdekirî kesê ku ji têkiliyan re çawanî dide qezenç kirin û dînamîk dike ye.

Di zimanê dîplomatîk de ji bo şaş fêm kirinê asteng bikin hevokên kurt û jirêze divê were bikaranîn û divê nekevin hûrguliya peyamê. Bi taybet di hevdîtinên dualî de dema axaftinên kurt tê kirin, lewma di hevdîtinê de mijarên ku werin dest girtin beriya hevdîtinê bi dorfirehî divê were vekolîn kirin û tabîrên teknîkî ku werin bikaranîn werin diyar kirin. Ger dîplomatek dixwaze nêrîna xwe veşêre an jî tiştek diyar nexwaze bêje piranî hevokên dirêj û tevlîhev bikar tîne. Heta di danûstandina devkî de yê diaxive hewl dide gotinê wan qut bike. Hewldanên mijarê derbas kirin, dîsa dema ku nebû xwe wekî ku şaş bûye dide nîşandan. Yani wekî ku serê

wê/wî tevlîhev bûye dide xûya kirin. Di dîplomasî de gotineke ku pir tê bikaranîn heye. *'Dîplomat aciz nabe, çi dike? Not digre'*.

Di beşa beriya vê de hinek li ser hatibe sekinandin jî wek berdewamiya wê van jî li ser zêde kirin pêwîst e. Rapor mijareke pir girîng e. Ji destpêka hevdîtinê heta dawî ti hûrgilî û nûve (encam) bêyî ku derve were hiştin pêwîste bibe rapor. Ti hûrgulî beredayî (nepêwîst) nîne. Ji tarî kirin, avêtin, girîng nedîtinê re ne layiq e. Teqez her hevdîtin bi hemû aliyê xwe ve ji bo vekolînê girîng e ku bigihînin cihê taqîgeha (laboratuara) navendî. Piştî ku giha cihê xwe nîqaşên li ser werin kirin, nêzikatiyên giştî, agahiyên îstîxbaratî, pozîsyona pêvajoyî, polîtîka hûndir û derve, têkiliyên gerdûnî û takekes, helwestên berê yê aliyê din bi baldarî nêzikbûnê re, nirxandina raporê pêwîste çi cîdî were girtin çi neyê girtin? Çi bandor dike û çi girê nade? Tê fêm kirin. Heta wê demê bi zimanê hiqûqî sucê xwe ne hatiye piştrast kirin ti tiştên hûrgilî an jî bermahiya agahiya tinebe bi sucdar îlan kirinê re pêwîste takekes (şexsî) neyê dadgeh kirin.

Taybetmendiyeke herî diyar ya zimanê dîplomatîk yek jê jî peyvên rojane ku tên bikaranîn zêdetir wateyekî pîşeyî îfade kirin e. Mînak, alîkarê serokê wezîrê têkiliyên derve yê welatekî dîplomateke din yê di welatê xwe de piştî nîvro (mînaka kursiye nizm ya ku İsrail ji dîplomatê Tirk re kiribû) gazî makama xwe bike û metirsiya xwe ya di çapemeniya welatê wê/wî de hin nûçeyên ku cîh digrin di navbera her du welatan de têkiliya dostane û lihevkirî wê zirarê bide bilêv bike di zimanê dîplomatîk de tê vê wateyê; *'Em bawer dikin ku hikûmeta wê di çapemeniyê de nûçeyên dijminahî ku li hember welatê me cîh digre teşwîq dike. Bi vî şêwazî berdewam kirinê re hûn hedê xwe derbas dikin. Em ji vê zêdetir nikarin li hemberî vê bê helwest bimînin di vê mijarê de wê hişyar dikim'.* Heta dîplomatê welatê din derveyî seatê kar gazî maqama xwe kirin dide nîşandan ku rewş hîn cîdî ye. Ger alîkarê Serok axaftina xwe berdewam bike û bêje '*ez ditirsim ku berdewamiya bûyerên wisa wê ji têkiliya di navbera her du welatan re neyênî biteyise*' bi vî şêwazî tê şîrove kirin; di navbera her du welatan de têkilî jixwe xirab bûne. Di lihevkirinên beriya vê de serdan û hevpeymanên ku hatine çêkirin wê werin iptal kirin. alîkarê wezîr wê wisa berdewam bike; 'Dibe ku h*ikûmeta me, di çapemeniya me de nûçeyên ku li dijberî welatê we derkeve nikaribe kontrol*

*bike. Û heta dibe ku di parlamentoya me de di vê mijarê de nîqaş derkevin*'. Ev gotin ji aliyê dîplomatê mêvan ve bi şêwazê li hember welatê xwe di çapemenî û parlamentoyê de îlana kampanya were destpekirinê divê bi vî rengî were şîrove kirin.

Xaleke din, dîplomat carnan nêrîna xwe pir zelal danaynin holê. Bi alternatîf û îhtîmalên cûda hewl didin ku her tim dîmeneke objektif û bê alî bidin. Di van rewşan de hedefa esas û stratejî di nava gotinê de pêwîste were gerandin.

Dîsa hevdîtinên takekes an pêwîste qet neynin rojevê an jî heta dawî îfadeyên bi semt (bi îhtîyat) divê werin bikaranîn. Di misogeriya reş û spî de nêrîn dayîn nabe uslûbê dîplomatek bi ezmûn (bi tecrûbe). Çand, hûner, wêjeya welatê ku dîplomat dibe mûxatabê wê baş şopandin carnan referans nîşandayîn pêkenokên bi naveroka zeka zanîn carnan vana bikaranîn wê piştevaniyê bike. Derveyî herikîna ragihandina mesaj carnan rewşên îstîsnaî jî tên jiyan kirin. Mînak, hêza ku pêre danûstandin tê kirin di herêmekî de ku em jê re dikarin bêjin pirsgirêkek lokal (xwecihî) dibe ku derkeve. Pê hêsandina pirsgirêkê re teqîna hêrs dibe ku were jiyan kirin. Bi vê teqîna hêrsê ji aliyê din re mesaja ku dixwestin ragihînin tonê (pileya) wê di hin rewşan de bilind dibe. Ev rewş û encama ku jê re rê vekir ji bo ji aliyê din were ragihandin talîmata mesajeke di dozajên bilind de gihandine diafirîne. Di vê rewşê de di qonaxa amadekariya talîmatê de zirûfên nîqaşê ger guncaw be hebe nêrînê dîplomat misoger parve kirin wek pêwîstiya berpirsyariyê ye.

Berovajiya vê wekî ku dixwazin bidin diyar kirin talimat wekî ku heye pêwîste ragihînin. Nûner piştî ku ji navenda xwe derket û pêvajo ji ber wê fermî bibe naveroka peyamê çi dibe bila bibe, ji çi re dibe mal bibe mal her tiştê di hevdîtinê de û ragihandina wê çawa hatine pêşdîtin bi ti qeydê wê neleystinê re ji aliyê din pêwîste bide. Ragihandin heman şêwazî ji aliyê din peyamek dişibe vê çawa û bi kîjan şêwazê hatibe ji xala wê heta bêhnokê wekî xwe veguhestin dîsa bê dudilî rewşeke ku nûner tam îcra bike ye. Dibe nabe, raste an şaş e? Rewşeke ku nûner mûhasebe bike nîne. Berovajiya wê ev wê were wateya bê dîsîplîniya nûner an jî dîplomat, divê vê bizane.

Zimanê dîplomatîk bi naveroka peyamê bikaranîn wek şiyaneke (qabiliyeteke) jirêzê ya hûnerî divê neyê nirxandin. Ev mijar ji bo dîplomatek pispor wekî di erka xwe de zarûriyeta serkeftîbûyînê divê were fêm kirin.

Wek encam dîplomasî wek amûrê ku di stratejiyên polîtîkaya derve ya pêkanînê de tê bikaranîn. Peyamên lihevkirinê heta şêwazê îfadeyên bûne qalib nivîskî an jî bi devkî di navbera aliyan de ji ber bêpirsgirêk birina pêvajoyê û di gihandina serkeftinê de zimanê ku tê bikaranînê heta dawî girîng e. Pêwîste were zanîn ku, têkiliyê di navbera dewletan de meşandin demkî tê guhertin lê bi wê re lîsana hevbeş û di hûndirê vê lîsanê de jî gotinên ku ji aliyê herkesî ve tên fêm kirin bikar anîn wek regezî hatiye qebûl kirin.

Lewma di dîplomasiyê de bikaranîna ziman taybetmendiyên xweser xwe nîşan dide. Lewre wek mijareke ku bi baldarî li ser were sekinandin û di wateya akademîk de hîn zêde kar kirin û bi perwerde û bi vîn were dest girtine. Di akademiyên ku werin vekirin, piranî dîplomasî di serî de zimanê dîplomasî an jî mijara ziman di dîplomasî de bikaranîn xebatên di asta akademîk de werin kirin di wateya dîplomatîk de serkeftinên ku werin bidest xistin û mayîndebûna van serkeftinan re payeyeke girîng wê bide çêkirin.

## DI DÎPLOMASIYÊ DE GIRÎNGIYA ŞÊWE AN JÎ RÊZIKÊN (RÊZÎKÊN) PROTOKOLÊ

Di dîplomasiyan de yek ji tiştên ku nebe nabe rêzikên protokolê nin. Dîplomasî cewher be protokol jî şêweyê wê ye. Peyva protokol peyveke bingeha wê ji zimanê Yunanî ya kevn tê û di wateya 'pêşde diçe' de ye. Civaka Çîn'ê protokolê, wek hilma (bûxara) terbiye, nezaket û zerafeta ku di jiyana mirovan de rûdinê û bi vî awayî pêkanîna wê tarîf dikin. Protokol di dîplomasiyê de wekî goşt û neynike. Yek nebe yê din nabe. Yek ji van di navbera dîplomatan de belgeyên hevpeymanên ku tên îmze kirin ji wê re jî dibêjin protokol, ya duyemîn ji tevahî rêzikên usûl û nêzikatiyên êdî rûniştine rêzikên protokol tê gotin. Di wateya hîn berfireh de rêzîkên merasîman, meseleyên usûlên dîplomatîk, tevahî aliyên teşeyî yên pêvajoyên mûzakere dikeve wergiriya rêzîkên protokolê. Dîsa nezaket û

ziraviyên kevneşop jî em dikarin tevlî van bikin. Xûlase tevahî qeyd û usûlên teşeyî ya dîplomasî dikeve bergeha rêzîkên protokol.

Di dîplomasiyê de rêzîkên protokol û usûlên wê jî di bin du beşan de pênasekirin pêkan e. Ya yekemîn mafên giştî ku dîplomat xwediyê wê ye (wek mafê cûda ya destnewerdanê) yê din jî usûlên di pêvajoya hevdîtin û mûzakereyan de pirsgirêka dora pêşekiyê ye. A rast ji van re em dikarin bêjin ku qeyd û usûlên ku kevneşop bûne. Di serdemên berê de ji cihekî dema ku şandeyek dihat şandin di pêşwazî kirinê de merasîmên mezin û pîrozbahiyên şatafat dihatin kirin. Beşek ji van pîrozbahiya di cihên pîroz de carnan jî merasîmên pîroz bi rojan didomiya. Beriya şandina şandeyan ev merasîm û çalakiyên ku dihatin kirin hin armancên xwe yên bingehîn hebû. Ya yekemîn hatina şandeya ku biçe berî wê ji welatê mûxatab re bi vî awayî agahdarkirin, ya duyemîn jî; girîngî û nirxê ku ji hevdîtina ku were kirin re tê dayîn lewma ji aliyê din hûrmeta ku tê dayîn îfade kirin e. Wek sêyemîn jî ji aliyê sêyemîn re bi vê wesîleyê peyam dayîn e. Sedema ji beşek pîrozbahiya li cihên pîroz çêkirin hevdîtina ku were kirin ji bo aşitî û îstîqrar bîne ji hêzên pîroz alîkarî xwestin e. Şande dema ku derdikevin rê, li gel xwe ji bo radestî mûxatabê xwe bikin hin diyarî dibirin. Pêşwazîkirina şandeyan jî bi heman şêwazî bi çalakî û merasîman pêk dihat. Piştre ji bo îstîrahat bikin mekanên taybet dihat tehsîs kirin, dîsa şandeyên mêvan bi rojan mekanên dîrokî didan gerandin. Ji bo xwe biyanî hîs nekin bi şêwazeke herî baş pêşwazîkirinê îtînayek dihat nîşandan. Şandeyên biyanî ku tên, şexsî nayên dest girtin, wek nûnerê welatê ku hatine tevahî çalakiyên ku kirine di şexsê şandeya ku hatiye rêzdarî û piştevaniya ji wî welatî re didin nîşandayîn tê armanc girtin. Li ser şandeyan çiqas bandor çêkin dema ku vedigerin li ser vegotinên xwe welatê ku mijare gotinê ye bandor kirinê difikirîn. Di vê çarçeveyê de a rast her du welat payemên xwe yê destpêkê beriya hevdîtinan li ser çalakiyan hewl didin ku bidin hevdû.

Ev kevneşopiya ku ji demên pir kevnar tê di roja me ya îro de jî şêwazê xwe hinek din guhertine hîn jî di pêşwaziya şandeyên dîplomatîk de wek pêwîstiya protokol wek perçeyek ji mevzûatê tê bikaranîn. Bi vê rêyê carnan peyamên cûda jî hatine dayîn. Şande welatê ku çûye bi şêwazên ku rûmet dişkîne hatiye pêşwazî kirin û bi roja ji bo hevdîtinê hatiye

rawestandin. Di hevdîtinê de dema ku encamên ku tê xwestin negirtine şandeya nûner ku hatiye di hin rewşan de hatine girtin heta carnan serê wan jî hatiye jêkirin. Di dîroka pir welatan de mînakên bi vî awayî hene. Mînak di Osmaniya de taybet zîndana *Yedîkûle* ji bo rewşên wisa hatiye bikaranîn, ev di belgeyan de tê îfade kirin. Di hin rewşan de her du nêzikatî di navhev de hatiye pêkanîn. Peyamên ku van nêzikatiyan teva dihewîne xwedî naverokên cûda ye û li ser protokol an jî şêwaz peyamên bi naveroka wateya wê bilind dixwazin bidin aliyê din e. Di pêvajoya mûzakere de an jî di hevdîtinan de nêzikatiyên ku bingehên protokolê têkildar (eleqeder) dike û di navbera aliyan de bûye pirsgirêk mînak, dora pêşekî, rêzîkên merasîmê, di xwarinê de û di mûzakereyan de rêza pergala rûniştinê, dora ketina salonê, dora belgeyên peymanê îmze kirin – ku ev di civînên pir alî de pirsgirêkên ku derdikevin holê nin- bûne mijara îxtîlafê û ji şeran re jî bûne sedem.

Ji van hemûyan ya ku pêwîste were fêm kirin ku di dîplomasiyê de teşe herî kêm bi qasî cewher girîng e. Li Ewrupa tengasiyên di vî alî de hatin jiyîn bi kongreya Viyana ya 1815'an, bi konvansiyona Viyanayê ya 1961'an bixwazin derbas bikin jî, ji ber hişmendiya netew-dewlet pirsgirêkên ku mijara gotinê nin, di roja me ya îro de jî berdewam dikin. A rast rêzîkên protokolê rêzîkên sabit yên hatine diyar kirin in. Lê dema di navbera hêzan de pirsgirêk û îxtîlaf derketine dem bi dem qeydan li gorî xwe çêkirin derxistiye holê. Ev jî di têkiliyan de dem bi dem ji krîzan re dibe wesîle. Hevdîtinên bi dewletan re werin kirin a rast piştî temasa destpêkê ya şandeyan bi pêvajoya pêşwaziyê re li ser nêzîkatiyên teşeyî naverok û rojeva hevdîtina ku piştre were kirin gengaz e ku dîplomatek hakim fêm bike. Lewma li ser teşe peyamên ku tên dayîn fêm kirin û dahûrandin heta dawî girîng e. Pêwîste ti dem ev ji mejî neyê derxistin; di dîplomasiyê de her tiştê ku gotin û nêzikatiyê digre hûndirê xwe li gorî stratejiya ku berê hatiye plan kirin dibe. Tevahî pêkanîn li gorî vê stratejiyê hewl didin ku pratîze bikin. nêzikatiya germ, nêzikatiya sar, ken, di gotûbêjan de her tiştê wek mirovî dixûyê bi vê armancê berê tê plan kirin û di arasteya armancên ku hatine diyar kirin de tê pêk anîn. Yanî ev hemû wek hewldanên ji bo bandor kirinê divê were dîtin. Kesê ku pêre hevdîtin tê kirin dîplomatek profosyonel be ya normal ev e. Di navbera tiştên ku werin axaftin û nîşandana teşeyî de hevgirtineke diyar heye.

Wek nakokî dibe ku were dîtin, berovajiya vê dema ku navrêz (navbera xetên nivîsê) werin xwendin wê bê fêm kirin ku ber bi armanca hatiye diyar kirin ve diçe. Li gel van ger kesê ku pêre hevdîtin hatiye çêkirin ne dîplomatek profesyonel be nakokî û hevnegirtinên mijara gotinê rewşeke xweser ku çavkaniya xwe ji şexs digre ye lewma nêzikatî jî li gorî vê kirin wê di cîh de be.

Wek encam dîplomasî, dilbêjî (önsezi), baldarî, xatir û qiymetdan be protokol jî pergala qeydan ku tevahiya van digre hûndirê xwe ye.

**ENCAM**

Îro li Rojhilata Navîn pirsgirêkên ku tên jiyîn wek çavkaniya wê pergala dewletî û versiyona wê ya dawî netew-dewlet bi derbasbûnê re rû bi rû maye, bi vê di herêmê de tewazûnên nû tên saz kirin de em derbas dibin.

Tevgera Azadiya Kurd, bi têkoşîna xwe ya serkeftî re berwarîhev (paralel), di çapê (gelemperiya) cîhanê û herêmê de ji rihê demê re guncaw xwe li gorî zirûfên nû lihevanînê bi serkeftinek mezin veguherîne re di herêmê de cihê herî bi bandor û dînamîk girtiye. Ev îro ji aliyê herkesî ve rastiyeke ku tê qebûl kirin e. Di vê astê de xwe gihandina hêza bandorek wisa di aliyê Kurdan û gelên herêmê de heta dawî pêşketinek girîng e. Ji vê jî girîngtir Kurd û gelên herêmê ji bo siberojên azad û demokratîk ev pozîsyon û hêza ku hatiye bidest girtin bi erka zivirandina çalakiya dîplomatîk re rû bi rû hatine. Ev erk di heman demê de di avakirina netewa demokratîk de rehendeke girîng ya xebatê ye.

PKK êdî ne partiya netew-dewletparêz ya ku ji sosyalîzma pêkhatî bandor bûye ye. Bi guhertina paradîgmayî ya ku pêk aniye re di pirsgirêka Kurd de çareseriya netewa demokratîk esas digre.

Hişmendiya netewa demokratîk û çareseriya wê xwe bi şêwazê konfederalîzma demokratîk dike beden. Konfederalîzma demokratîk ji ber pergala netew-dewlet neyêniyên ku çêdibin derbas kirinê wekî ku xwedî potansiyel e di polîtîk kirina civakê de jî amûrê herî guncaw e. Her civat, etnîsîte, çand, cemaatên olî, tevgerên rewşenbîrî, xelayên aborî, rêxistinbûna jin û ciwanan û hwd wek xelayên polîtîk dikarin xwe bi şêwazeke azad ava bikin û îfade bikin. Tevahî avaniyên heyî di bingeha

konfederal demokratîk de hatina cem hevdû pergala demokratîk ava dikin.

Bi paradîgma modernîteya demokratîk pêkanîna civaka demokratîk ya nû ku tê hedef kirin rista ku rêgeza exlaqî-polîtîk dileyze, çînayetî pir zêde derfetê pêşketinê nabîne, lewma amûra dewlet û deshilatî zorên xwe nikarin bisepînin an jî bi lihevkirineke beramberî hevdû nas kirin pêk tê. Di nava cûdabûnan de yekîtî, wekhevî û azadî wek taybetmendiya hem ferdiyet hem jî civakbûnê jiyanî dibe civaka nûjên ya demokratîk e.

Lewma ji bo pêkanîna azadiya Serok APO û gelê me û pêkanîna yekitiya konfederal a hemû gelên herêmê û ya hemû hêzên şaristaniya demokratîk, em di serdemeke wisa de ne ku li ser bingehê ezmûn (tecrûbe) û destkeftiyên têkoşîna me ya 40 salan, dîplomasiya me jî divê bi vê re guncaw û lihevkirî be û ji ya îro hîn bêhtir pêşde ye pêwîste rista xwe bileyize. Di vê çarçeveyê de hem di hûndirê xwe de hem jî bi cîranên xwe re di gelemperiya kûrewî de (cîhanî de) ji dîplomasiyek bi watê re pir pêdiviya Kurdan pê heye. Hebûna xwe parastin û azadiyên xwe bi gelên din yê herêmê re çêkirinê helbet ji xebatên erênî yê dîplomatîk re risteke girîng dikeve.

Di serdema modernîteya sermayedar de li cîhanê ji lîstokên dîplomatîk re herî zêde Kurd hatine qurban kirin. Hem di aliyê konjonktûrel de hem ji aliyê çînayetî ve şensê netew-dewletek yekpare ya Kurdan kêm e, dema ku ev berçav tê girtin ji dîplomasiya netewa demokratîk re pêdiviya ku tê dîtin hîn zêde wê bê ferq kirin.

Peyama Serok APO ya newroza 2013’an di aliyê feraset, girîngî, ziman û mîsyona dîplomasiyê de pêşîlêvekirineke mezintirîn de bûye. Di vê bingehê de asta ku têkoşîna me hatiye, guhertina paradîgma û pêvajoya ku tê jiyîn dema ku berçav tê girtin di qada dîplomasiyê de nebesiyên me yên ku tê jiyîn derbas kirin û di vê berfirehiyê de jinûve bi avakirinek nû ji pêvajo û paradîgmayê re denk (hevseng), ketina nava pêngavekî jêneger bûye.

Tevgera azadiya Kurd asta ku îro li herêmê girtiye xebatên me yên dîplomatîk ji hişmendiya netewa demokratîk re guncaw hîn rêxistinî, berfireh û bi bandor bûyîna wê zarurî kiriye. Tevahî rastiyên heyî wek

pêwîstiya berpirsiyariyên me yên dîrokî, şoreşger û demokratîk xebatên xwe yên dîplomatîk di milê hişmendiya nû, tarz, uslûp, aso, hedef, rêxistinbûn, plansazî û araste de pediviya jinûve avakirinê wekî ku derdixe holê, zemîna wê ya tekane akademiyên ku wê kadroyên dîplomasiya netewa demokratîk têde bên gihandin (perwerde kirin).